قد أفلح من تزكى

# TESEWWUF

## Tesewwuf Di Îmtîhana Mislimanî Ya Digel Xwe De

Osman Nûri TOPBAŞ



WEŞANÊN ERQEM

بسم الله الرحمن الرحيم

Istanbul: 2016 M / 1437 H

© Weşanên Erqem 1437 H / 2016 M

# TESEWWUF

Tesewwuf Di Îmtîhana Mislimanî
Ya Digel Xwe De

Osman Nûrî TOPBAŞ

| | |
|---|---|
| **Navê Resen:** | Müslümanın Kendisiyle İmtihanında Tasavvuf |
| **Nivîser:** | Osman Nûrî Topbaş |
| **Wergêr:** | Mehmet Seyhan [Mela Mûhemmedê Bêrkevanî] |
| **Rastker** | Abdusselam Kartal [Mela Ebdusselamê Bêcirmanî] |
| **Qordînator:** | Muhammed Davuthan Kılıç |
| **Grafiker:** | Ahmet Taha Bilgin |
| **ISBN:** | 978-9944-83-839-9 |
| **Navnîşan:** | Ikitelli Organize Sanayi Bölgesi Mah. Atatürk Bulvarı, Haseyad 1. Kısım No: 60/3-C Başakşehir, Istanbul, Turkey |
| **Tel:** | (+90-212) 671-0700 pbx |
| **Fax:** | (+90-212) 671-0748 |
| **E-mail:** | info@islamicpublishing.org |
| **Malpera We bê:** | www.islamicpublishing.org |
| **Sertifika çapê:** | Erkam Printhouse |
| **Language:** | Kurdish |

WEŞANÊN ERQEM

# TESEWWUF

## Tesewwuf Di Îmtîhana Mislimanî Ya Digel Xwe De

Osman Nûrî TOPBAŞ

WEŞANÊN ERQEM

## Pêşgotin

*Hemd û senayên bêdawî ji Ellah Teala re bin; ewê ku em evdên xwe yên nekar û aciz ji tineyî anîne wicûdê, ewê ku însan li ser sûretê* **"ehsenê teqwîm"** *aferandiye ku ew di nav hemû mexlûqatan de zirwê teşkîl dike, ji rûhê xwe têde pif kiriye, îstîdad û amadehîya hilgerîna ulwîtîyan jê re bexş kiriye, bi kitêb û pêğemberên ku wek rêberên hîdayetê şandine jî îstîqameta me li ser heq û xêrê sabit û dabîn kiriye!.*

*Dirûd, selat û silavên bêdawî li ser pêğemberê hezkirîyê me Hezretê Mûhemmed Mûstefa, malbata paka wî û eshabê guzîdeyên wî bin!; Ewê ku Mezinê Fexra kaînatê ye, serwerê pêğembera ye, rehma ji bo alema ye, şexsîyeta nimûneyî ya bêhemta ji bo beşerîyetê ye, li vê cîhanê mezintirîn rêzanê me yê îstîqametê ye û di roja qîyametê de jî melce û penahgeha şefaeta me ye.*

Dînê pîrozê me Îslam, bi qasî ku ew sîstema bawerîyê ye, ew di eynî zemanî de jî nîzama heyatê

ye. Çawa ku wî dinyaya derveyî ya me û zahirê me gihandiye nîzamekê, ew eynî wisan dinyaya navxweyî ya me û heyata qelbî ya me jî tenzîm dike.

Ji bo mirov karibe bibe "**mûmînekî kamil**" ku îslamê pêkanîna wî li ber xwe hedef û emanc danîye, pirr zerûrî ye ku em hewl bidin ji bo dînê mûhteşemê xwe; bi tevahî, bi şekl û rûh, madde û mane û zahir û batinê wî ve tam îdrak û fehm bikin û bijîn..

**Tesewwuf** jî rêwîtîya terbîyeke Rebbanî ye, hewl dide û li ber xwe hedef datîne ku di mûmînî de kemal û gihana vê fehmkirina tevahîya dînî pevre bide qezenckirin.

Ew perwerdeyeke wisan e ku dema bi îrşad û teblîğa Qur'an û Sunnetê dinyaya dereveyî ya me tenzîm dike, dirêse, qelbên me jî distre, ji xavîtî û nezantîyê xilas dike û digihîne kemalê.

Yanî tesewwuf mûesseseyeke manewî ye ku şexsîyeta "**mislimanekî kamil**" û "**mûmînekî ehlê teqwayê**" diçespîne.

**Tesewwuf** ew ğeyret û hewldan e ku cenabê Heq Teala bi "**nefseke mûtmein**" û "**qelbekî selîm**" were îdrak-kirin û naskirin. Ew, bi vî awayî; îlmê bi îrfanê, teqlîdê bi tehqîqê wergerîne û îmanê jî hildigerîne asoya îhsanê.

**Tesewwuf**, ew hessasîyet e ku însanî bi kumzirxa teqwayê ji masîwa, ji her tiştên ku wî ji Xuda dûr

dikin û ji her tişt û xapxapokên ku nefsê cezb dikin, diparêze û tim û daîm dike ku qelb her “**bi Xuda re**” be.

Lewra Xuda di ayeta pîroz de dibêje:

“...**Hûn li kuderê dibin bibin, her Ew [Ellah], bi we re ye**....”[1]

**Tesewwuf** ew têkoşîn û mûcadele ye ku mirov karibe hemû nefesan, yanî hest û fikran û emelên mirovan li gorî rizamendîya Heq Teala tenzîm bike birêse, ji bo mirov karibe nefesa dawîn bi selametî li ser îmanê bide.

**Tesewwuf** mekteba îrfanê ye. Mûellimên vê mektebê jî dostên Heq Teala, arif û mûrşidên kamil in ku ew bûne malpêma û warisên Mezinê me Resûlûllah. Ew, ji bo bedewî û sipehîtahîyên exlaq, îrşad, reftar û bizavên nebewî nûnêr û temsîlçîyên zirweyî ne, ku li ser çağ û zemanan hatine belavkirin.

Mûhîmtirîn wezîfa van rêzanên manewîyatê jî ev e; bi însanî nefsa wî bidin naskirin û hessasîyeta mûhaseba wijdanî pê bidin qezenckirin. Her wiha ew, wî exlaqî bi wî însanê ku ji bo îmtîhanbûnê bi sifetekî wilo hatiye aferandin ku dikare meyla xwe bide ser xêrê û bide ser şerrê jî, bide dabînkirin ku temayulên nefsanî yên xwe ji bo asta esğerîtirîn nizm bike û bi

1. Hedîd, 57/4

awayê ezamîtirîn jî berê xwe bide ser heqî û xêrê.. Ew, di encama vê de jî hîçbûn, tinebûn, eczîyet û nekarîna nefsa wî li hemberî qudret û ezameta îlahî, pê bidin îdrak û fehmkirin.

Çawa ku ev cumlê ha, di vê mahîyetê de hatiye îfadekirin û vegotin. Lewra ji bo însan cih û mewqîê xwe li hemberî Xaliqê zulcelal fehm bike û heddê xwe zanibe, pêşî divê ew nefsa xwe nas bike. Ji ber ku ev yek bi naskirina nefsa xwe destpê dike, ev cumlê ha hatiye gotin:

"***Kî nefsa xwe nas bike, bêşiwar ew Rebbê xwe jî nas dike!***"

Ha ji bo gihiştina vê îdrak û têgihiştinê jî; ew di rêya berteref-kirina nefsanîyetê û înkîşafa rûhanîyetê de **cîhadeke derûnî** ya wisan pêwîst û lazim dike ku têde **hîç silh û sistahî nebe** û heta bi nefsa dawî jî bênavber her berdewam bike.

Divê evd, vê qeweta tije sirr a ku jê re "**nefs**" tê gotin, di rêbertîya zatên ehl û pispor de bi hinek dîsîplînan terbîye bike. Bila ew bi vî awayî nefsa xwe di rêwîtîya Heq Teala de bike xurttirîn û bihêztirîn wasîta tereqqî û pêşveçûnê. Bila ew xwe di tefekkura nexşên şîyan û qudreta îlahî û tecellîyatên ezameta wî de kûr berde û dinyaya dilî ya xwe bi hikmetên îlahî mûzeyyen bike, bixemilîne.

**Hezretê Ebû'l-Hesenê Xereqanî** dibêje: "*Bi xelkê tevî re silhê bike û bi nefsê re cengê bike*." Wî, bi vê gotina xwe rêya rind bûrandina bi xelkê re û nêzîkbûna ji Heq Teala çi xweş îfade kiriye.

Tesewwuf bi vê hêla xwe jî, ferdîyetçîtî, xudğemî û jîyîna di plana nefsa xwe tenê de red dike, ew ji bo bûna mûmînekî dîgerğem, fedakar, xwedî ğeyret û hewldana dînî û ehlê xizmetê telqîn û talîm dike.

Yanî **tesewwuf**; ew ğeyret û hewldan e ku "**misliman di îmtîhana digel xwe de**" negatîfî û menfîtîyên di nefsa xwe de berteref bike û ji xwe bibûre. Tesewwuf ew cehd û hewldan e ku dilan bixe dergehê wê rehmê ku hemû mexlûqat têde aramî û hizûrê bibînin; însanî bixe însanekî bi xêr, bixe "**mûmînekî kamil**"ê ku ji destên wî, zimanên wî, halê wî û qalên wî îstîfade tê kirin.

Ya ji hemûyan jî mûhîmtir tesewwuf ev ezm e; mirov karibe ji vî serî heta bi wî serî heyatê wekî ku Mezinê me Pêğember jîyaye, wilo li ser îtîdal, mûwazene û îstîqametê bijî. Lewra ew wek rêzanekî îdeal û wek şexsîyetekî bêhempa ji bo temamê beşerîyetê mûstesnatirîn xelata cenabê Heq Teala ye. Eshabê kîram, hemû hal û hereketên mezinê me Resûlûllah mûşahede û îfade kirine û heta ji me re jî guhastine û întîqal kirine. Ji bo însanî du jêder hene ku ew mûstesnatirîn û cihêwaztirîn xezîne ne, divê ew di heyata xwe de wan endaz û pîvan esas bigre da ku

bibe însanekî kamil. Yek ji wan herdu jêderan Qur'ana Pîroz e ku Rebbê bilindê me bi wê lutfeke mezin li însanî kiriye û nehiştiye tehrîfat di herfeke tenê ya wê de jî çêbibe û ew wisan parastî daye dewamkirin. Jêdera duduyan jî sunneta Mezinê me Pêğember e ku hemû reftar, bizav û exlaqên wî jî di navê de ne. Lewra Rebbê me di ayeta pîroz de ferman dike, dibêje:

"**Kî, bi xebera Pêğember bike, wî bi xebera Xuda kiriye**."[2]

Ha **tesewwuf** jî bi mûcibê vê hedîsa şerîfa ha:

"*Şexs ji kê hez bike bi wî re ye*."[3]

Ev ğeyret û hewldan e ku mirov karibe di her sefhe û qunağên jîyanê de bi Resûlê Xuda re di nav fikrîyat û hissîyatê, hal û fiêlê de bibe û bi qasî amadekarî û îstîdada xwe bi zahir û batinê xwe, xwe bi mezinê me Pêğember bişibihîne..

Milletê me yê ku di dirêjahîya sedsalên dûvdirêj de heyata xwe bi van pîvan û endazan ajotiye, wek encameke vê têgihiştinê navê her ferdekî xwe bi "**Mehmetçik**" yanî "Mûhemmedekî biçûk" binav kiriye.

Lewra tesewwufa ku cewhera îslamê ye, ew perwerde ye ku mirov karibe heyata qelbî ya Resûlê Xuda

2. Nîsa, 4/80
3. Buxarî, Edeb, 96

li ser qelbê xwe nexş bike, ji tevna dilê wî para xwe wergire, exlaqê wî ji xwe re bike exlaq û şexsîyeta xwe bi xeslet û wesfên wî tezyîn bike, bixemilîne.

**Welhasil** Tesewwuf ji vê hewldan û ğeyretê pêktê ku mirov; di kûrahîya qelbê xwe de Qur'an û Sunnetê îdrak bike û di nav evîn û wecdê de wan bijî.

Lêbelê di roja me de wekî ku di her qadê de wilo ye, di mijara tesewwufê de jî çendîn mesele li pêşîya me dertên ku ew eqlan tevlîhev dikin û dilan jî diğelînin:

Li terefekî ew zêdegavîyên ku bi temamî tesewwufa îslamê red dikin hene; li terefekî jî di bin navê tesewwufê de hinek çewtî û şaşî û ew cahil hene ku bi mûteessibane terefgirîya van dikin... Yanî li alîyekî îfrat heye, li alîyê din jî tefrît heye... Hinek reftar û bizavên bid'et û wergirtinên batil hene ku tê xwestin ew di çarçoveya tesewwifê de bêne xistin, halhale ku ew şerîetê piştguh dikin…

Li alîyekî din jî hinek mirov û kes hene ji bo xilasîya ebedî hinek xeyal bendewarîyên wiha dikin ku bêyî kirina emelên salih, bêyî şanîdana ğeyretekê di rêya Xuda de, bêyî çîle kişandin, bêyî xwe parastina ji heramîyan di bin kiswe û kirasê tesewwufê de dibêjin; emê axretê qezenc bikin!!.

Ew kesên ku halê zatên salih û sadiq ji xwe re nakin hal û bi îddîaya hezkirin û mehebbeteke ziwa

û rijî wekî vê; "*filan zat wê bi destên min bigre, ewê min xilas bike*" dibêjin û bi vî awayî ji bo xefk û kemînên nefsanî dibin êm.. Yan jî ew kesên ku di mehebbet û hezkirina wî zatê ku bûne peywendê wî de zêdegavîyê dikin û radibin wî ji xwe re dikin pût... Digel ku di pêğemberan de ğeyrê îradî ew xetayên bi navê "zelle" hene jî, peyv û gotinên mirovên wiha bêyî ku ayet û hedîsan ji xwe re bikin mêzîn û pîvan, wan peyvên wan zatan bînin ber wan pîvanan û li gorî wan bikişînin, bi kor korane wan qebûl dikin.. Bi vî awayî ew ji bo dijminên tesewwufê dibin sermaye û ew li vê îqaza îlahî:

"**...Zinhar bila şeytanê xapînok jî we bi efûya Xuda nede bawerkirin û bi vî awayî nexapîne ha!**"[4] Guhdarî nakin, uslûba fereha tesewwufê ya keş û hewaya mûsameha/xweşbînîyê çewt şîrove dikin û bi vî awayî hêsankarî û rehetîxwazîyeke nefsanî dipejirînin...

Ewên ku kirasê tesewwufê li xwe dikin û hewl didin bi resm û fotoğrafan bikevin pey lêgerînin manewî, çendîn ji bo esasên şerîetê mûğayir be jî bi xewn û îlhaman emel dikin... Ew ğayeya eslî jibîr dikin û bi pey keşf, keramet, zihûrat û sinûhatan dikin û hwd...

4. Luqman, 31/33

Li alîyê din jî gurûhekî tekfîrêî heye ku tesewwufê bi temamî red dikin; rabitayê, tewessulê û zîyareta qebran bi wergirtinên şaş şirk dijmêrin...

Di bingeha îtîrazên ku berê wan bi alîyê tesewwufê ve têne dayîn de bi giştî ev herdu sebeb balê dikişînin ser xwe:

**Ya yekê**: Dûrbûn û bêxeberbûna ji heqîqeta tesewwufê ye...

**Ya duduyan**: Tetbîqkirina çewta hinek cahilan û hinek neehlê ji bo tesewwufê ji bo plana pêşîyê derdixin û wan şaşîyan ji bo hemû ehlê tesewwufê dikin mal û dixin stûyê wan..

**Welhasil**; îro gellek fikr û telaqqîyên batil mixabin zêhn û dilan ji xwe diğelînin.

Ha ji vê nuqtê ve, zerûreta ji nû ve bi mûhtewa û naverokeke nû tarîfkirina rast ji bo hinek têgiha û îstîlahên tesewwufî û dubare veqetandin û cudakarina rastîyan ji çewtîyan hasil dibe. Dema em dîmen û menzara umûmî ya îro ya xwe li ber çavên xwe digrin, li meydanê danîna wan pîvanên îtîdal, hevkêşî û îstîqametê yên ku di hestên dînî de meqbûl in, êdî bûne mesela mesûlîyeteke mûhîm.

**Xwendevanên hêja!**

Em vê kitêboka li ber destê we, ya ku ev mideteke dirêj bû ew rêzenivîsa di bin navê "***Tesewwuf,***

***bi Qur'an û Sunnetê gihiştina kemalê ye***" de ku di kovara me ya Altinolukê de hatiye weşandin bi tesnîf û dîzayneke nû ji bo îstîfada we pêşkêş dikin.

Me di vê berhema mûtewazî de di bara îfadekirina lizûmîya heyata tesewwufî de hewl daye ku balê bikişînin ser qistas û pîvanên şer'î yên bi vê mijarê re elaqedar.

Me wek evd, hewl daye teberruz bikin û ragihînin ka divê mûnasebetên me bi Rebbê me re di kîjan qiwama qelbî de bin.

Me hewl daye sehîhtirîn pîvan û endazan di mûnasebet û peywendîya mirovên ku derdikevin ser rêwîtîya terbîya manewî digel mûrşid û rêberên wan de îzah bikin. Dîsa me hewl daye di bara hinek nuqteyên xeternak û tehlîkedar de îqaz û şîyarîya bidin û beyan bikin ka di van mûnasebetan de ew mehebbet û peywendîya ku ji heddê xwe dibûre çawa însanan diajoyê ser teessub û harbûnîyan, yanî ew lingê mirovan dişemitîne.

**Welhasil**; Me hewl daye dubare dubare vê heqîqetê îfade bikin; mûwazene di hestên dînî de bi qezenckirina hessasîyeta rîayetkirin û li ber çavgirtina pîvanên şer'î mûmkin e.

**Cenabê Heq Teala ji me re bi nesîb û hêsan bike ku em dînê mûhteşemê xwe rast û durust fehm bikin û bi şeklê ku ew pê razî dibe jî bijîn. Hestên me, fikrên me, nîyet û emelên me bi rizaya xwe pêşwazî bike. Me bi lutf û kerema xwe, bi ef û meğfîreta xwe û bi riza û rehma xwe bigihîne!**

**Amîn!**..[5]

**Osman Nûrî Topbaş**
**Çıreya Peşi 2014**
**Ûskûdar**

5. Ez ji bo M. Akif Gunayê ku di hazirkirina vê kitêbokê de keda wî çêbûye spas dikim û ji Rebbê xwe nîyaz dikim ku hewldanên wî jê re bike sedeqa carîye.

# TESEWWUF;
# BI QUR'AN û SUNNETÊ
# GIHIŞTINA KEMALÊ YE...

**Tesewwuf**; Navê dîtir e, ji bo mirov "**îman**"ê biguhêze ufûq û asoyeke mûhteşem û mûezzama wekî "**îhsan**"ê. Yanî ev e, em di qelbê xwe de werin vê hest û îdrakê; em tim û daîm di bin mûşaheda îlahî de ne -bi vegotineke din- em di bin çavdêrîya kamerayên îlahî de ne..

Lewra cenabê Heq ferman dike, dibêje:

وَهُوَ مَعَكُمْ أَيْنَ مَا كُنْتُمْ

"...**Hûn li kuderê dibin bibin, her Ew [Ellah], bi we re ye**...." [Hedîd, 57/4]

وَنَحْنُ أَقْرَبُ إِلَيْهِ مِنْ حَبْلِ الْوَرِيدِ

"...**Em ji şahreha wî jî ji wî nêzîktir in.** " [Qaf, 50/16]



# TESEWWUF;
# BI QUR’AN û SUNNETÊ GIHIŞTINA KEMALÊ YE...

Ji bo mirov karibe bigihîje sewîya “**însanê kamil**”ê ku îslamê pêkanîna wî li ber xwe hedef û emanc danîye, divê mirov heyata dînî; di nav tevahîya madde û maneyê de, bi kûrahîya zahirî û batinî, bi ahenga eql û qelbî û bi pevrebûna şekl û rûhî fehm bike û bijî..

Tesewwufa rasteqîne, ji vê ğeyret û hewdanê pêktê; bi îlawe li ser zahirê îslamê, mirov di plana batinî de jî wê fehm bike û bijî. Ev jî îdrak-kirina îslamê di nav tevahîya vê îfadeya meşhûr; “**şerîet, terîqet, heqîqet û marîfet**” de lazim dike.

Bi rastî mûmînek, di rêwîtîya Heq de ku ji “**îman**”ê diçe “**îhsan**”ê çi qeder mesafê qut dike diçe, ew qeder tefekkura wî kûr dibe, pîvanên wî di nêrîna

wî li heyat û kaînatê de jî di eynî mînwalê de sewîyê qezenc dike:

Mesela di **şerîet**ê de ku di sewîya esğerî de ferman û qedeğeyên îlahî li ser hemû însanîyetê -ewam û xewasan- teklîf û tetbîq dike têgihiştina “**malê te ji te re ye, malê min jî ji min re ye**” derbasdar û rewa ye.

Di **terîqetê** de ku ew rêya kemal û gihana manewî ye, ji bo mirovên ku bi qelbê xwe amade ne, bikevin silûkê jî ev awayê nêrînê; “**malê te ji te re ye, malê min jî ji bo rizaya Heq ji te re ye**” mahîyeta fedakarîyê qezenc dike. Comerdî û dîgerkamî [îsar] jî dibin lezzeteke manewî.

Ji vê jî bi wêdetir di keş û hewaya **heqîqet**ê de ku evdên bijardeyên Heq Teala dişên bigihinê, digihîjin vê telaqqî û wergirtinê; “**ne malê te malê te ye, ne jî malê min malê min e; tev jî yê Xuda ye!**”

Bi saya vê jî;

Wekî ku Xuda di vê ayetê de ferman kiriye: “**Hûnê negihîjin birrê** [xêra kamil], **heta hûn ji malê xwe yê ku jê hez dikin** [di rêya Xuda de] **înfaq nekin**.”[6] ji bo mirov karibe ji Xuda nêzîk bibe, divê mirov bigihîje qiwameke dilî ya wisan ku karibe heyberên biqîmettirînê xwe jî di ber Wî de feda bike.

6. Alî Îmran, 3/92

Lêbelê ew evdên arif ên bi fezîlet, dostên Heq Teala yên ku gihane asoya **marîfet**ê jî destûra; “***dostanîya Heq, bi malikîyetê re îmtîzac nabe***” derbasdar û rewa ye. Lewra di ayeta pîroz de hatiye gotin:

“**Bêguman Xuda, ji bawermendan malên wan û canên wan kirriye beranberî wê jî hemin bihişt ji wan re heye**.”[7]

Qentara dostanîyê fedakarî ye. Ji bo wan kesên ku di asoya dostanîya Heq de merhele û qunağ qut kirine, hebûna evdî “**hîç**” heta di hukmê “**nîne**” de ye. Hemû heyber ji bo karibin hebûna xwe bidin dewamkirin bi awayekî mûtleq îhtiyaca wan bi cenabê Heq Teala heye. Hîç tiştek bêyî ku mûrad û qudreta cenabê Heq hebe, bi tena serê xwe ne kare bibe, ne jî kare hebûna xwe bide dewamkirin. Tekane heyberê ku îhtiyaca hebûna wî bi yekî din nîn e, ewê “**Wacîbû’l-Wucûd**” cenabê Heq e.

Ev hadîse û bûyer ji bo van heqîqetan çi mîsaleke ciwan e:

Ji **Hezretê Şêx Şiblî** hate pirskirin:

“-Di pênc hêştiran de çi qeder zekat tê dayîn?” Şêx Şiblî got:

“-Ya wacib mêşînek e; lêbelê li gorî me hemû yê Xuda ye.”

7. Tewbe, 9/111

Dema jê hate pirskirin:

“-Di vê xusûsê de delîla te çi ye?” Hezretê Şiblî ev cewab dayê:

“-Mezinê me Ebûbekr e. Wî malê xwe tev di rêya Xuda de înfaq kiriye. Kî hemû malê xwe di rêya Xuda de bezl bike/bi comerdî xerc bike, ew ji meşreb û xusûsîyetên mezinê me Ebûbekr -Xuda jê razî be- e. Kî jî beşeke mezin ji malê xwe înfaq bike, ew jî ji meşreb û xusûsîyetên Hezretê Osman -Xuda jê razî be- e..

Ew îlmê ku xwediyê xwe [bi qelbî] nebe terka dinyayê, [di rastîya xwe de] ne îlm e.[8]

Em nimûneyeke din di bara îdrak-kirina îslamê di nav tevahîya “**şerîet, terîqet, heqîqet û marîfet**”ê de wiha îfade bikin;

- Di **şerîet**ê de xwarin di piştî têrxwarinê de îsraf e.
- Di **terîqet**ê de xwarin heta bi têrxwarinê îsraf e.
- Di **heqîqet**ê de bi qasî kîfayetê û di hizûra Xuda de wek ğafil xwarin, îsraf e.
- Di **marîfet**ê de bi îlawe li ser van tevan, bêyî tefekkur-kirina qudreta îlahî û tecellîyatên esmayên wî di nîmetan de xwarin, îsraf e. Lewra her yek ji

8. Ehmed Zerrûq, Qewaîdu’t-Tesewwuf, rûp, 49, qaîde, 33.

heyberên ku hatine aferandin ji mîkroyê heta bi makroyê ji bo ezamet û qudreta bêdawîya Aferînerê xwe delîlek e.

**Hezretê Şahê Neqşîbendî** ku yek ji welîyên mezin e, wî bi xwe di pirranîya zemanan de di pijandina xwarinê û hazirkirina sifrê de xizmet dikir. Wî di dema xwarin hazirkirin û xwarinê de şîret li telebe û şagirtên xwe dikir ji bo ew bi qelbê xwe şîyar bin û an û bîstekê jî ğafil nebin. Dema wî bi mirîdên xwe re xwarin dixwar, ku yekî ji wan bi ğeflet pariyek dibir ber devê xwe, derhal ew bi zimanekî nerm şîyar dikir û dilê wî pê xweş nedibû ku ew di halê Xuda jibîr kiribin de luqmekekî tenê jî bixwin.

Xwarin; di zahirê xwe de ne îbadetek e. Lêbelê luqmeyeke ku pê re Xuda hatibe zikrkirin ew ji bo halê feyz û xuşû’ya di îbadetan de dibe wesîle. Ew luqmeyên ku wek ji Xuda ğafil hatibin xwarin, qeswet, ğeflet û laşgiranîyê [tenbelî] dide qelb.

Ev peyva **Ebdûllah bin Mes‘ûd** -Xuda jê razî be- di bara sewîya qelbîya ku eshabê kîram di bin terbîya manewîya Resûlê Xude de gihabûnê de çi xweş xulase dike, dibêje:

“*Em hatibûn rewşeke wisan ku me tesbîhê luqmeyên ku dihatin xwarin jî dibihîstin!*”[9]

9. Buxarî, Menaqib, 25

**Welhasil;** Ew şablon û qalibê ku heta bi vir me di xusûsa mertebeyên hessasîyeta îslamî de hewl daye li ser çend mîsalan îzah bikin, li ser hemû danûstanên mirovan; ji îbadetan heta bi heyata aîlewî, ji mûnasebetên cîrantîyê heta bi failîyetên ticarî û îqtîsadî û hemû hal û bizavên beşerî yên ku dibe werin eqlê mirovî neyên tetbîqkirin, mirov bi maneya rastîn nagihîje "kûrahîya tesewwufî"..

## NAXWE TESEWWUF ÇI YE?

**Tesewwuf**; Ew sen'et û huner e ku mirov karibe bi qelbê xwe cenabê Heq nas bike.

**Tesewwuf**; Navê dîtir e, ji bo mirov "**îman**"ê biguhêze ufûq û asoyeke mûhteşem û mûezzama wekî "**îhsan**"ê. Yanî ev e, em di qelbê xwe de werin vê hest û îdrakê; em tim û daîm di bin mûşaheda îlahî de ne -bi vegotineke din- em di bin çavdêrîya kamerayên îlahî de ne, bijîn..

**Tesewwuf**; Dîsîplîna paqijbûnê ye. Rêya xwe parastina ji her tiştê ku mirovî ji Xuda dûr dikin û gihiştina "**teqwayê**" ye. Ew terbîya manewî ye ku liğabê li îhtîrasên nefsanî dide û amadekarî û îstîdadên rûhanî jî dide înkîşaf-kirin.

**Tesewwuf**; Mektebeke manewî ye ku di destê mûrebbîyên [perwerdekar û seydayên] rastîn ê ku ji bo Mezinê me Pêğember bûne malpêma û waris de; nefs tê tezkîye-kirin û qelb jî tê tesfîye-kirin.

**Tesewwuf**; Li dijî nefsê cengeke ku silha wê wîn e.

**Tesewwuf**; Ew marîfet e ku mirov karibe di her hal û karî de ji teqdîra îlahî re rizayê şanî bide û bi Xuda re tim û daîm her dost bimîne. Li hemberî med-cezîrên heyatê û surprîzên şîrîn-tehlên wê parastina beraberî û hevkêşîya dil e. Di destferehîyê de serxweve-neçûn û di desttengîyê de jî dilneman e.. Ew kemal û gihan e ku mirov karibe êş û cefayên tên serê mirovî îmtîhan zanibe û karibe van ji bo tezkîyê [paqijbûna manewî] bike wesîle. Ew meharet e ku mirov karibe bibe "**koleyekî sipehî**"yê ku gileh û gazindan jibîr bike û tim û daîm bi hemdê şukr bike.

**Tesewwuf**; Ew mesûlîyet e ku mûmînên xwe ji hêla maddî-manewî ve îkmal kirine, bi dilekî dîgerkam berê xwe didin mexlûqatan û mehrûmîyet û îhtiyacên wan telafî dikin. Ji bo Aferînerî, şefqet, merhemet, mehebbet û xizmeta ji mexlûqatan re dibe tebîetê eslî.

**Tesewwuf**; Ew hewldan e ku mirov karibe bi Kîtab û Sunnetê re hevhal bibe, talîmatên îlahî û nebewî bi kûrahîya dil îdrak bike û wan di her sefhe û qunağên heyatê de bijî.

**Welhasil: Tesewwuf**; Ew ğeyret e ku mirov karibe bi eşq û evîndarî ji nêzîk ve Resûlê Xuda nas bike, nesîb û para xwe ji karaktêr, şexsîyet û exlaqê bilindê wî wergire û karibe bi terzekî ji bo cewher û rûhê dîn guncaw, di nav wecdê de bijî.

Naxwe her çi tiştê ku bi van destûran re tezad û nakokîyê teşkîl dike û endaz û pîvana xwe ji Qur'an û Sunnetê nagire, çi hebe -heke çi qeder ew ji bo tesewwufê were îzafekirin û were gotin ev ji tesewwufê ye jî- batil e.

## NAXWE TESEWWUF NE ÇI YE?

Dema "**marîfet** û **teqwa**"ya ku cîhetê derûnî û rûhanî yê dîn û alîyê kûrahî yê wî yê tesewwufî ye, were îhmalkirin, hingê ji bilî wê bes menzûmeyeke ziwa û rijî ya qaîdeyên fiqhî dimîne. Digel vê jî, nexasim di roja me ya îro de wek nimûne hinek derdor hene ku bi navê tesewwufgirîyê dibêjin xebero em ji bo neşweya tesewwufî bûne xwedî û malik, wilo erzê endam dikin û her tiştî ji hukmê batinî pêkhatî dibînin û şerîeta ku em dikarin jê re hukmên zahirî yên dînî bibêjin jî sivik û besît dibînin.. Ha ev jî, bi eşkerehî şanî dide ku çi qeder ew ji heqîqeta tesewwufê dûr in.

Ev têgihiştina van cure kesan ya ku dibêje; "*bila qelbê te temîz be, wekî dî ku emelê te hindik be jî çêdibe* (!).."û derî li ber tawîzên nefsanî vedike, ne ji dûr ve, ne ji nêzîk ve, ti elaqeyeke wan bi tesewwufê re nîn e, ew tesewwufa ku wek xizmetkara rastîna şerîetê ye.

Mesela di roja me de hinek mirovên ku ji rûhê *Mesnewîya Şerîf* dûr in, terefê **wecd** û **teqwa**yê yê Mewlewîtîyê îhmal dikin û **sema**'ya ku **zikr**ê eslî

ye, dixin rewşa mecliseke mûsîqî ya wisan ku têde bi meqseda şovê pêşaneyeke folklorî bi orkestrayê re tê îcrakirin.

Haleveku **Hezretê Mewlana** di 18 malikên pêşî yên ku di Mesnewîya wî de cih digrin de bi van îfadeyên xwe, gazindan ji wan ğafilan dike ku digel ew li wî guhdarî dikin jî lê di meqsed û ğayeya wî nagihin, wiha dibêje:

"*Ez di her cemîyetê de, di her meclisê de nalîyam û rawestîyam.*

*Ez bi yên xuy xirab re jî, bi yên xuy baş re jî ketim û rabûm.*

*Her kes li gorî têgihiştina xwe bi min re bû dost.*

*Lêbelê esrarê di nava min de fehm nekir.*

*Sirra min ji feryada min ne dûr e.*

*Lêbelê di her çavî de ew nûra ku wî bibîne, nîn e, di her guhî de ew şîyana ku wî bibihîze, nîn e.*

*Rûhên xav, ji halê zatên kamil û gihayî fehm nakin. Naxwe divê mirov peyvê kurt bibirre, wesselam.*"

Ji bilî vê, wekî hemû dostên Heq Teala serkehnîya feyza **Hezretê Mewlana** jî bêşiwar **Qur'an** û **Sunnet** e. Ew, vê heqîqetê di çarîneyeke xwe de ji cîhanê tevî re wiha bang hildidêre:

"*Heta canê min hebe ez her koleyê Qur'anê me. Ez axa rêya Hezretê Mûhemmed im. Heke kesek ji peyva min ji bilî vê [li derveyî vê îstîqametê] tiştekî biçûçiktirîn jî biguhêze, ez ji peyva wî diêşim û hîletê min jê diçe.*"

Hezretê Mewlana bi vê beyanata xwe bi eşkerehî xwe wek; "**bende û koleyê Qur'anê; axa rêya binûra Hezretê Pêğember**" teqdîm û pêşkêş dike. Yanî ew bi eşkerehî dide xuyakirin ku pêyê sabitê pergarê tim û daîm bi şerîetê ve bend e, û ew hewl dide ku heyata xwe li gorî talîmatên Qur'an û Sunnetê tenzîm bike.

Naxwe ewên ku bêyî bi hukmên şer'î emel bikin, dibêjin qaşo em endam û mensûbê rêya **Hezretê Mewlana** ne, berî her tiştî ew rûhê ezîzê Hezret bi xwe rencîde dikin, diêşînin.

Li alîyê din, di hinek terîqetan de di destpêkê de bi hinek nîyetên ku ji sûretê heq têne dîtin dest bi hinek failîyetên ticarî dikin. Lêbelê di dawîya kar de bi dezgehsazîyeke wisan werdigerin ku bi pirranî ji hessasîyeta teqwayê dûr dikevin û ji manfîetên maddî re ram dibin. Ev jî, bi awayekî bariz bi alet-kirina dîn ji bo dinyayê ye. Terîqeta ku derîyê **Hîçbûn** û **tinebûn**ê ye, bi çerxa menfîeteke wisan werdigere ku êdî bi fikara têrmal-bûn û pirrbûnîyê hereket dikin.

Di hinek terîqetan de tê xuyakirin ku hessasîy-eta helal-heramîyê di plana paş de tê hiştin, dîsa bi

îfadeyên wiha; "dilê min paqij e (!)" ku naveroka wan nehatiye tijekirin pêşî li ber îxtîlata mêr-jinan tê vekirin, di tesetturê de zeîftî tê şanîdan û ji çendîn pîvanên şer'î tawîz tê dayîn.. Ew bi temamî meyla xwe didin dîtin-nêrîneke batila ku prîmê dide nefsanîyetê. Her wekî ku bi fikra wan wiha be; dema qelb temîz be êdî li ber çavgirtina sînorên helal-heramîyê ne lazim e.

Bi vî awayî di xusûsê de mezintirîn rêberê me, mezinê me Pêğember e. Digel ku ew mirovê ji hemû mirovan bêhtir xwedî qelbê paqij e jî, divê mirov baş bibîne ku ku wî di îbadet, mûamelat û exlaq de nexasim di "**rîayetkirina helal û heramî**"yê de ku ew mezintirîn problema roja me ya îroyîn e, ji ummeta xwe re nimûneyeke bêemsal pêkanîye..

Haleveku **tesewwuf**a rastîna ku di nav mûhtewa û naveroka Ehlê Sunnet wel-Cemaet de ye, ew ğeyret e ku mirov karibe bi zahir û batinê xwe bi destûrên heyata mezinê me Pêğember re bi yek bibe. Digel ku mezinê me Resûlûllah di zirweya kemalata manewî de bûye jî lê wî heta bi nefesa dawîya xwe jî wezîfên evdînîya zahirî ya xwe bi titîzî îfa kirine û bi wan rabûye, her mûmînê ku divê wî ji xwe re bike nimûne jî di kîjan meqamê manewî, mewqî, meşreb û terîqetê de dibe bila bibe, dîsa ew mûkellef e ku wezîfên şer'î yên xwe bîne cih..

Ev bûyera ku ji **Hezretê Ebdûlqadirê Geylanî** hatiye guhastin vê xusûsê çi xweş îzah dike:

“Rojekê li pêş çavên min nûrek peyda bû û hemû aso dabû ber xwe. Dema min destpê dikir: Ev çi ye?, ji nûrê dengek hat”

-Ey Ebdûlqadir, ez Rebbê te me! Ez ji emelên salih ên ku te heta îro kirine ew qeder memnûn im ku êdî min heram jî ji te re helal kirin.

Lêbelê dema xîtab xilas bû-nebû min fehm kir ku xwediyê vî dengî şeytan-eleyhillane- ye, min got:

“Biqeşite, here ey melûn! Nûra ku te şanî dayî ji bo min zulmeteke/tarîtiyeke ebedî ye.”

Şeytan got:

“Bi hikmet û feraseta ku Rebbê te ji te re îhsan kirî dîsa tu ji destê min xilas bûyî! Haleveku min bi vê usûlê bi sedan kes ji rê deranîbûn û ew ji min dûr bû, çû.

Min destên xwe li ber dergehê bilind vekirin; min di hest û îdraka ku ev ji lutfa Rebbê min e, şukr ji cenabê Heq re kir.”

Dema yekî ji nav cemaetê jî jê pirs kir, jê re got:

“-We ji kuderê fehm kir ku ew şeytan e?” Wî ev cewab dayê:

“- ji gotina wî ya min heram ji te re helal kirin!”

Bi rastî heke evdek, bi sebeb halê sipehîyê xwe, emelên salih ên xwe û dereca manewî ya xwe ji

tixûbên helal-heramîyê mûaf hatibûya girtin, wê di pêşîya her kesî de mûafîyeteke wiha ji mezinê me Pêğember re hebûya ku ew di evdînîya ji bo Heq Teala de di zirweya însanîyetê de ye. Li gorî ku îmtîyazeke wiha ji wî bi xwe re nehatiye naskirin, naxwe ewê ji ti kesî din re hîç nayê naskirin.

**Hezretê Îmamê Rebbanî** di vê xusûsê de wiha dibêje:

"*Ehemmîyet dana bi batinî ehemmîyet dana bi zahirî jî îcab dike. [Yanî zerûrî ye ku batin û zahir bi hev re di nav ahengê de bin]. Ew kesê ku dema bi batin re mijûl dibe zahirî îhmal dike, zendîq e. Ew halên batinî yên ku wî bidest xistine tev îstidrac e.*[10] *Baştirîn pîvana ku sihheta halên batinî yên me şanî dide, tenzîmkirina zahirê me li gorî pîvanên şer'î ye. Ha ev e, rêya îstîqametê.*"[11]

Li ser vî esasî, ew kesê ku heyata xwe li gorî pîvanên Qur'an û Sunnetê tenzîm nake û mûkellefîyetên zahirî yên dînî îhmal dike, çi qeder îfadeyên tesewwufî ji zimanê wî birijin bila birijin, ew kes bi maneya rastî ji ehlê tesewwufê nabe.

Mesela ew mûmînê ku mijara mîrasê ji ber ku li menfîetên dinyewî yên wî nayê, xwe ji tenzîm-

10. **Îstidrac**: Wek zidda kerametê ew halên xarîqûlade ne ku ji hinek kesên kafir, fasiq û mûteşeyyixan xuya dibe. Mûteşeyyix ew kes e ku digel ne welî ye jî xwe wek welî şanî dide.
11. Îmam Rebbanî, Mektûbat, III, 87-88, jimar: 87.

kirina wê ya li gorî fermanên îlahî dide paş, mirov nikare hizr pê bike ku ewê di rêya seyr û silûkê de mesafeyekê qut bike.

Bi eynî awayî, kesekî ku di heyata malbatî ya xwe de pîvanên îslamî li ber çavan nagire, mirov neşê ji heyata tesewwufî ya wî behs bike. Di dê-bavekî ku sirf îstiqbal û paşwexta fanîya zarokên xwe dihizre û wan ji perwerda Qur'anê mehrûm dike, bi vî awayî paşwexta ebedîya zarokên xwe dixe tehlûkê de înkîşafa manewî nabe. Heke dê-bavekî wiha xwe ji ehlê tesewwufê zen bike, ev bes ğefleta wî şanî dide.

Dîsa xwarina heqê îbadan di heyata ticarî de û ji bo menfîeta dinyewî ya xwe bi awayekî ku Xuda men kiriye hereket kirin û bi îfadeyên wiha; "canê min, bila vê carê bibe û ez piştre nakim" meyl-dana ji bo tawîzan; mezintirîn zulm e ku însan li xwe dike, ew manewîyata xwe şil û şeht dike..

Ev îfadeyên birayên **Hezretê Yûsuf** ku ji ber çavnebarî û hesûdîya xwe hewl dabûn wî bikujin yên ku di Qur'ana Kerîm de hatine beyankirin jî ji bo xefk û kemînên ku nefs wan diçespîne ji bo evdî bixe nav heramîyan nimûneyeke tîpîk e:

"[Birayên Yûsuf di navbera xwe de ji hev re gotibûn:] **Yûsuf bikujin, yan jî wî bavêjin erdeke dûr da ku bavê me bi hezkirinê berê xwe bide me**

**tenê! Piştî wî jî hûnê** [tobe bikin] **bibin civateke salihan!**”[12]

Naxwe bi hizra ‘ezê di sibeh-rojên ku tên de tobe bikin û rewşa xwe îslah bikin’ ew sibe-rojên ku gelo ew tên yan nayên jî mechûl e, îro ketina heramîyan, hem sivik wergitina tobê ye, hem jî xwe, ji bo arzûyên nefsanî xistina kole ye. Ha te ev hal ji xwe re qebûl kir, ha te jehr avêt nav heyata manewîya xwe, ti ferqa wan ji hev nîn e.

Di vê xusûsê de divê mirov ti caran van endaz û pîvanên ku **Hezretê Ûmer** dane ji eql û bîra xwe dernexe:

“*Li nimêja kesê ku wê eda dike û li rojîya ku ew digre nemeyzînin; li van xusûsan meyzînin;*

- *Dema ew diaxive, gelo rast dibêje?*

- *Dema bi emanetî tiştek jê re tê sipartin, gelo ew rîayeta emanetî dike, yan nake?*

- *Dema ew bi dinyayê ve mijûl dibe, gelo hessasîyeta helal-heramîyê li ber çavan digre, yan jî nagire?*” [13]

**Welhasil**; dema hessasîyeta li ber çavan girtina pîvan û endazên şer‘î di îbadet, mûamelat, exlaq û

12. Yûsuf, 12/9
13. Beyheqî, es-Sunenu’l-Kubra, VI, 288; Şûeb, IV, 230, 326.

nîzama heyata kesekî de nebe, bê mane ye ku mirov tereqqîkirina [pêşveçûna] tesewwufî ji wî hêvî bike.

Bila em jibîr nekin ku hukmên zahirî yên îslamê ku em dikarin ji wan re şerîet bibêjin her wekî îskelêtekî ne ku ew wicûd û bedenê li ser pêyan digrin. Bedeneke bê pirûska [mazmazk-marîpişt] ku îskelêta wî nebe, li ser pêyan namîne. Lêbelê heyateke dînî ya ku ji îskelêtê tenê pêktê jî -çawa ku hinek dixwazin bi qestîka wê nîşan bidin- têgihiştineke tirsnak, sar, tehfdêr û bêrûh derdixe holê.

Ji vê hêlê ve tesewwufa rastîn; ji wê hewldan û ğeyretê pêktê ku mirov îslamê bi mûhtewa û naverokeke ji feyz û rûhanîyeta di pêğemberê Xuda, eshabê kîram, selefê salihîn û mûmînên ehlê teqwayê de mişt û tije, îdrak bike û eynî wekî wan wê bi eşqeke mezin, wecd û şewq bijî..

## MEZINTIRÎN KERAMET; ÎSTÎQAMET

**Tesewwuf**; berî her tiştî ji vê hewldan û ğeyretê pêktê ku mirov karibe heyatê di îstîqameta Qur’an û Sunnetê de tenzîm bike, birêse.

Di ayetên pîroz de wiha tê gotin:

“**Bi xebera Xuda û bi xebera Pêğemberê wî bikin da ku rehm li we were kirin**.”[14]

14. Alî Îmran, 3/132

“**Gelî yên ku îman anîne! Bi xebera Xuda bikin, bi xebera Pêğember bikin û** [bi gunehan] **karên xwe jî pûç nekin!**”[15]

Mezinê me Pêğember jî di Xutba Xatirxwestinê de wiha gotiye:

“*Bila xebera we jê hebe ku ezê pêşî herim cennetê li ser Hewzê Kewserê çavnêrîya we bikim! Ezê li hemberî ummetên dîtir bi pirrbûna we keyfxweş bibim.* ***Zinhar****, [bi kirina gunehan]* ***rûyê min reş nekin ha!***

*...Gelî mûmînan! Ez du emanetan ji we re dihêlim. Heta hûn xwe bi wan asê bigrin, hûn hîç rêya xwe şaş nakin. Ev emanet jî kitêba Xuda Qur’an û Sunneta Pêğemberê wî ye...*”[16]

Ha tesewwufa rastîn jî, ji rîayetkirina van herdu emanetên mûqeddes ya bi awayekî layiq pêktê. Tesewwuf rêyeke perwerdê ye, dide hînkirin ka ev emelên qelbî yên wekî **îxlas, teqwa, zuhd, xuşû, tobe û riza**’yê ku behsa wan di Qur’ana Pîroz û Sunnetê de derbas dibe, wê çawa bêne tehqîqkirin; di hemberî van de jî, dîsa dide hînkirin ka nexweşîyên nefsanî wekî **rîya, ucb, kibr, ğeybet û hesed**, wê çawa bêne berterefkirin.. Heke na, ew ne ew perwerde ye ku sade bi riyazet û mûcahede û hinek temrînên wekî wan **keşf** û **keramet** werin bidestxistin.

15. Mûhemmed, 47/33
16. Li Muslim, Hec, 147; Ebûdawid, Menasîk, 56 binêrin

Ji xwe gihiştina keşf û kerametan, ne pîvana pêşveçûna manewî ye. Çawa ku di gellek rîwayetan de[17] hatiye gotin; di piştî pêğemberan de çêtirîn însan Hezretê Ebûbekr e. Lêbelê di bara kerametê fizîkî û zahirî yên wî de ti malûmatê zêde nîn in. Naxwe mezintirîn keremeta wî; bi mehebbeta bêhemta û sedaqet îtaet û teslîmîyeta mûstesna'ya wî ji Resûlê Xuda re ye..

Bi vê sedemê dostên Xuda ehemmîyet nedane kerametên fizîkî, heta wan bi titîzî, xwe ji îfşakirina van cure kerametên ku dibin sersebebê ğurûr, serxweveçûn û şohretê, daye paş. Wan hemû hewldan û ğeyretên xwe li ser kerametên rastîn tîr û himbiz kiriye ku ew karibin di **îstîqameta Qur'an û Sunnetê** de bijîn.

**Cuneydê Beğdadî** -quddîse sirrûh- gotiye:

"*Heke hûn yekî bibînin ku li hewayê, difire; lêbelê halê wî bi Kîtab û Sunnetê re ne ahengsaz be, ev [ne keramet e, lê] îstidrac e.*"

Hatiye guhastin ku **Hezretê Bayezîdê Bistamî** jî wiha gotiye:

"Ezê rojekê derbas bûbama çûbama rexê dîtir ê çemê Diclê. Herdu rexên çêm ji bo rê bidin bi awayekî

17. Li Elî el-Mûtteqî, Kenzu'l-Ummal, XI, 549/32578; Îbnûmace, Mûqeddîme, 11/106; Ehmed, I, 127, II, 26'an binêrin.

kerametî hatine hev, bi yek bûn. Derhal min xwe da hev û min ji Diclê re got:

«*-Qesem bi Xuda ye, ez bi vê naxapim! Lewra kelekvan min bi nîv dirhemê derbas dikin, dibin alîyê din [tu jî emelê salihê min dixwazî ku ev bûye sih sal min ew ji bo mehşerê hazir kiriye]. Naxwe ez nikarim bi nîv dirhemê sih sal emrê xwe [bi kerameteke ku ewê bibe sersebeb ku ez di xwe hest bi heyber û ezperestiyekê bikim] ziyan bikim. Ji bo min kerîm lazim e, ne keramet!*»” [18]

Lewra Rebbê bilindê me di ayeta pîroz de wiha dibêje:

**“Bêşiwar li cem Xuda bi keremtirînê we** [hêjatirînê we] **zehftir mûtteqîtirînê we ye** [ewê ku xwe ji hatina hemberê wî zehftir diparêze]...”[19]

## TESEWWUF; BI ZIKR XWE PARASTINA JI ĞEFLETÊ YE

Cenabê Heq gotiye:

“**Gelî yên ku îman anîne! Xuda zehf di bîra xwe bînin**.”[20]

18. Li Ettar, Tezkîretu’l-Ewlîya, rûp. 217, weşanên Îlm û kulturê Bûrsa 1984’an binêrin.
19. Hucûrat, 49/13
20. Ehzab, 33/41

Bi vî awayî wî, bi her wesîle û navgînê arzû kiriye ku em zikrê wî bikin û wî di bîra xwe bînin.

Xuda bi vê gotina xwe: “**Ew** [mûmînên xwedî eqlê selîm] **şipya, rûniştî û li ser teniştên xwe Xuda zikr dikin...**”[21] ji me xwestiye ku em bi qelbê xwe tim û daîm bi wî re bibin.

Naxwe em wek mûmîn wezîfa me ya zikrkirina Rebbê me, ne nimêjkirin tenê ye. Divê em wê hesta bi Xuda re bûnê ya di nav nimêjê de di piştî nimêjê de jî bidin dewamkirin. Lewra Xuda Teala evdên xwe sanîyekekê jî jibîr nake, ew dixwaze evdên wî jî tim û daîm wî di bîra xwe bînin.

Mezinê me Pêğember jî bi her wesîle û navgînê eshabê xwe ji bo zehf zikrkirinê teşwîq kirine. Çawa hatiye zanîn ku mezinê me Pêğember wirdên cuda cuda dane sehabîyên xwe yên cuda cuda[22] û hinek caran jî wî heleqeyên zikr dane çespandin û zikr daye îcrakirin.[23]

Ji ber xetera mezina ğafilbûna mideh û aneke tenê ji Zikrûllahê, mezinê me Pêğember wiha nîyaz kiriye, gotiye:

---

21. Alî Îmran, 3/191
22. Li Îbnûmace, Edeb, 56; Buxarî, Fedaîlû Eshabu’n-Nebî 9, Deawat 11; Muslim, Zikr 79, 80’êyan binêrin.
23. Li Ehmed, IV, 124’an binêrin.

"*Ya Rebbî! Min bi qasî midetê çav belkirin û çav miçkirinekê jî ji nefsa min re nesipêre!..*"[24]

Lewra dilek, çi qeder Xudayê xwe jibîr bike, ew qeder bi ğefletê mûbtela dibe. Dîsa ji ber vê ye ku mezinê me Pêğember gotiye:

"*Hinek caran çêdibe ku dilê min tê perdekirin. Lêbelê ez di rojê de sed caran îstiğfarê ji Xuda dikim.*" [25]

Ev jî şanî dide ku sade ne ji bo gunehên hatibine kirin; lêbelê ji bo midet û anên ku mirov Xuda jibîr kiribe jî îstiğfar lazim e. Lewra ji ber ku heta tu bibêjî bes, endaz û pîvan di dilê ku gihabe aso û ufûqa marîfetûllahê de zirav dibin, her nefeseke ku wek ji Heq Teala ğafil hatibe dayîn û standin jî wek gunehek tê wergirtin. Çawa ku di hedîseke şerîf de wiha hatiye gotin:

"*Heke însan li dîwanekê rûnin û li wir navê Xuda neyênin bîra xwe, ew dibin ku karekî kêm û guneh kirine. Kî di rêyekê de here û Xuda -ezzewecelle- zikr neke, ew dibe ku karekî kêm û guneh kiriye. Kî here nav nivîna xwe û li wir Xuda zikr neke, dîsa ew dibe ku karekî kêm û guneh kiriye.*"[26] Ew halê ku di sûretê Alî Îmran, ayeta 191'ê de hatiye gotin; "**ew şipya,**

24. Camîus-Seğîr, I, 58.
25. Muslim, Zikr, 41; Ebûdawid, Witr, 26
26. Ehmed, II, 432

**rûniştî û li ser teniştên xwe zikrê Xuda dikin**" jî vê destnîşan dike. Ji xwe însan bi pirranî li ser yekî ji van hersê halan dibe. Naxwe Rebbê me tim û daîm ji me halê zikrê dixwaze. Feqet şertê meqbûlîyeta vî zikrê daîmî jî beyan dike û di berdewamîya heman ayetê de jî wiha dibêje:

"**...Ew li ser aferandina erd û asîmanan** [kûr kûr] **tefekkur dikin û dibêjin**..."[27]

Yanî ew ji xwe dixwaze ku em di tefekkurkirina tecellîyatên qudret û ezameta îlahî de kûr bibin, em eczîyet, nekarîn û hîçbûna xwe îdrak bikin, em bigihin qiwama dilekî ku bi heyret û heyranî bilerize û em wilo zikrê Rebbê xwe bikin.

Çawa ku Rebbê bilindê me di ayeteke dîtir de wiha dibêje:

"**Mûmîn bes ew kes in ku dema Ellah tê bibîranîn dilên wan dilerîze. Dema ayetên wî ji wan re têne xwendin îmana wan pê zêde dibe û ew xwe her dispêrin Xudayê xwe**.."[28]

Naxwe ew zikrê ku bes bi lefz û peyvan tê dubarekirin, ji devan xwe bernade dilan, ji lewma ew ji bo his û lerzîna qelbî nabe wesîle, ew bi maneya heqîqî û sewîya meqbûl ne zikr e. Ji zikr meqsed, ev

27. Alî Îmran,, 191
28. Enfal, 8/2

e ku ew qelb ji zikrê haydar bike û bike ku zikrkar bi Xuda re bibe..

Ji ber vê tereqqîya di tesewwufê de, ne bi xwendina dersên manewî û bilindkirina wirdan di navbera hinek zemanên diyarkirî de bend e. Bi îlawe li ser vê, bi bilindbûna hessasîyetên qelbî û exlaqî ve û bi zêdebûna tecellîyatên esmayên [navên] cemalî yên di wî qelbî de bend e.

Ew kesê ku dersên manewî bilind dike, îcab dike ku nezaket, zerafet, riqqeta qelbî, merhemet, şefqet, xizmet, ğeyret û fedakarîya wî jî zêde bibe; divê ew efûkartir, têgihiştîtir, tehemmulkartir bibe; divê halê sebr û riza’ya wî jî xurt bibe. Ew kesê ku çi ji xwe re dixwaze, wê ji biradînê xwe re jî bixwaze, divê ew dîgerğem û xwedî rûhekî tenik be. Tereqqîya manewî, bes bi van re qaîm e, ava ye.

Tesewwuf ev e; mirov karibe di heyata xwe de bi feyz û rûhanîyeta zikr tim û daîm di halê ‘digel Xuda bûnê’ de bijî. Çawa ku **Hezretê Samî Efendî** jî tesewwufê wiha dide tarîfkirin; “*daîmî di zikrê de bûn û dil, ji bilî Xuda ji her tiştî temîzkirin.*”[29]

Qezenckirina mûmînî ji bo vê hest û îdrakê, ew di heman demê de jê re zanîna çareserkirina sirra îmtîhana îlahî ya ku jê re rûbirû dimîne jî temîn dike.

29. M. Samî Efendî, Mûsahebe, VI, 13.

Mesela **Ûmer bin Ebdûlezîz** dibêje:

“*Heram agirek e. Bes ewên ku dilên wan miribe, dişên destên xwe jê re dirêj bikin. Heke ewên ku destên xwe jê re dirêj dikin zindî bûna, bêşiwar wan yê êşa wî agirî his kiribûna*.”

Ha mûmînekî ku dilê wî bi zikrûllah sipûsağ be, ji ber ku ew ji ğefletê hatiye parastin;

- Ew nikare destê xwe ji bo tiştên heram, heta ji bo tiştên bişubhe jî dirêj bike.
- Ew rûhê xwe ji şer û deverên ku qîmetê wî xirab dikin, diparêze.
- Ew bi dûv macerayên nelazim nakeve; ew xwe di tiştên ebes, batil û harbûnîyan de noq nake; ew xwe bi sewda û hezkirinên demî û hat-çû naxapîne.
- Ew emr û temenê xwe di xirpotîya nefsanîyetê de zîyan nake; ew deftera emelê xwe bi sefahet û rezaletan nalewitîne.
- Berevajî vê, ew emr û temenê xwe bi emelên salih û xêr û hesenatan dixemilîne.
- Ew Qur’an û Sunnetê ji bo xwe dixe rêzana jîyanê.
- Ew îbadetên xwe di nav xuşû û tirsê de eda dike, ew reğbeta xwe di xizmet û ğeyretên di rêya Xuda de û di dîwanên sohbeta salihan de zêde dike.

• Di dawîyê de ew li ser erdê wek şahidekî Rebbê xwe li kumbeta asîmanî bi dengekî xweş û di piştî wî de jî çendîn bîranên tije fezîlet dihêle û emr û temenê xwe wiha îhya dike.

Li hemberî vê, qelbekî nezan û laşgiranê ku bi sedem dûrbûna ji zikrê ji bo ğefletê dûçar dibe, ew di rewşeke wilo de ye ku her dem amade ye bikeve teqana gunehan. Lewra ğeflet mûsaidtirîn jêrxan û şûva guneha ye. Dema ew jêrxan û şûv pêktê hingê bêyî hest bi giranîya manewî ya gunehan kirin, dest bi kirina wan tê kirin.

Ji vê hêlê ve bi zikrê berterefkirina ğefletê; ew li hemberî gunehan sağlemtirîn zirx teqwa ye, yanî ew wesîleya parastina manewî ye. Lewra hîç ti însanek bi bilêvkirina "**besmelê**" paşlingê li birayê xwe naxe. Qelbekî ku "**Ellah**" dibêje, bi hiş û gumana xwe strîyekî di ti dilekî re nake.

Ji bo vê **tesewwuf** ev e; mirov karibe bi qelbekî zindî, bi feyza dilîya zikrê, di qiwama îhsanê de û jê haydar be ku ew di bin çavdêrîya kamerayên îlahî de ye, wilo bijî.

Tesewwif ev e; mirov karibe rastîya ku Xuda di her an û deverê de digel me ye, ji bo xwe bixe destûra heyatê û em di ti wext û zemanî de hîç jibîr nekin ku ew ji şerhaya me jî ji me nêzîktir e. His û fikrên ku di qelbê me re dibûrin jî jê re eyan û eşkere ne, ew her wext û anê me dibîne, me dibihîze û ew fikrên me

bi awayekî wisan li dilê me nexş dike ku hîç neyên xîçkirin û jêbirin..

**Cenabê Heq ji bo me tevan bike nesîb ku em îmanê di ufûqa îhsanê de bijîn. Qelbê me bi nûra zikrûllah, marîfetûllah û mehebbetûllah rohnî bike. Me tevan ji bo jîyîna heyateke evdînîya li cem wî meqbûl, serfiraz bike.**

**Amîn!..**

# TESEWWUF;BERTEREFKIRINA NEFSANÎYETÊ, ÎNKÎŞAFA RÛHANÎYETÊ YE..

**Hezretê Ebû'l-Hesen Xereqanî** dibêje:

"Çawa nimêj û rojî ferz e, edakirina wan mecbûrî ye, eynî wisan berterefkirina kibr, hesed û hirsê ji dil jî zerûrî ye."

Nexasim dûçarbûna ji bo "kibr" û "ezperestî"yê jehr avêtina nav rûh e. Lewra eqîdeya tewhîdê jî û sifetê cenabê Heq; "mûtekebbir" jî tehemmula wî ji şirîkatîyê re nîn e.

# TESEWWUF; BERTEREFKIRINA NEFSANÎYETÊ, ÎNKÎŞAFA RÛHANÎYETÊ YE..

Cenabê Heq ji bo ehemmîyeta wê di Qur'ana pîroz de piştî heft caran li pey hev sûnd dixwe, eşkere dike, dibêje:

"**Ewê ku nefsa xwe ji xirabîyan** [yanî ji gemarên maddî û manewî] **paqij kiribe, hemin bi xilasîyê gihaye; ewê ku ew di xirabîyan de jî noq kiribe, helbet li xisarê ketiye.**"[30]

Îro îstîla'ya kulturîya global, reklamên ku nefsanîyetê tehrîk dikin, modayên ku luks û îsrafê qamçî dikin, telqîn û propagandayên menfî yên televîzyon û înternetê bi xwe re erozyoneke manewîya kambax û qirêjbûn anîne. Eql û dinyaya dilî ya mirovan herc û merc bûye. Ğaye û wasîte tevlîhev bûne. Di şûna ku

30. Şems, 91/9-10

mirov bixwe û vexwe ji bo hêz û qewetê bidestxîne da ku evdînîyê ji Heq Teala re îfa û eda bike, bûye ku mirov ji bo bixwe, vexwe û xerc bike dijî. Êdî qelb ji dinyayê re bûye êsîr û nefs jî ji bo arzûyên şehewî bûye kole. Tetmîn nebûna di rûhan de însanîyet ber bi buhran û qeyranên ferdî û îctîmaî ve ajotiye. Di dawîya dawîn de jî ew ji hemû fikar û endîşeyên uxrewî dûr, her wekî têgihiştina dinyayeke bê axret, jehr avêtiye zêhn û dilên mirovan.

Bi vê sebebê îro, terbîya tesewwufî ya ku tezkîya nefsê û tesfîya dilî ye, ehemmîyeteke hê mezintir erz dike. Lewra **tesewwuf**; perwerda hemd, şukr, riza, zuhd, îstiğna û qenaetê ye. Ew e ku mirov di vê heqîqetê bigihe û îdrak bike ku heyata esasî, heyata axretê ye û mirov dilê xwe ji esareta arzûyên nefsanî yên berwext û hat-çû yên dinyayê xilas û azad bike.

## DI TESEWWUFÊ DE HER TIŞT, DI PIŞTÎ ÎDRAK-KIRINA “HÎÇ”BÛNA XWE DE DESTPÊ DIKE

Mûcadela tesewwufê ev e; mirov hebûn, ezperestî, ğurûr û kibrê ji alema navxweyî ya xwe bikole û bavêje û halê “**hîçbûn**” û “**tinebûn**”ê bide îdrak-kirin.

Siltanê arifan, **Hezretê Şahê Nexşebend** ji xwacegan, yanî ji seydayên xwacayên erbabê îlmê bûye. Digel vê jî di salên pêşîn yên întîsaba manewî de, wî ew rêyên ku însan di wan de hatine û çûne,

temîz kirine û xizmet ji nexweşan, nekareyan, heta ji heywanên birîndar re jî kiriye. Bi vî awayî, wî kiras û ebayê tewazûyeke mezin û hîçbûnê li xwe kiriye. Çawa ku ev peyva Hezretê Xwace bi xwe jî ji bo vê halê rûhî yê wî dibe tercuman:

*Alem genim, ka me ez,*
*Herkes çak, yeman ez!*
[Yanî her kes baş e, ez tenê xirab im.]

**Hezretê Xalidê Beğdadî** jî [w. 1827] di zemanekî ku jê re "Şemsu'ş-Şumûs" yanî "Tava Tavan" hatî gotin de çûye dergehê **Hezretê Ebdûllahê Dehlewî** [w.1824]. Feqet Hezretê Dehlewî heta nederket, neçû pêşwazîya wî jî. Di ser vê de jî wî ew alimê mezin di mihraba dergehê xwe, yan jî kursîyê xwe de wezîfedar nekir. Wî pêşî ew di temîzkirina qedengeh/tiwaletê de wezîfedar kir, ji bo enanîyeta wî berteref bibe û ew hîçbûnê hasil bike.

**Hezretê Ezîz Mehmûd Hudayî** [w. 1628] jî dema qazîyê Bûrsa'yê bû, ji bo di dergehê **Hezretê Uftade** de bigihîje hîçbûn û tinebûnê, ew jî di qunağ û merheleyên wekî wan re derbas bûye. Wî bi xeftanê bixeml ê xwe di kolanên Bûrsayê de kezeb û ceger firotiye. Di netîca van cure qunağ û merheleyên ku ğurûr, kibr û enanîyetê berteref dikin de ew bû mûrşidekî kamil ê ku îstîqamet dida padîşahên cîhanê. Heta niha bêjimar qazî hatine û çûne; lêbelê ji navbera wan bes Hezretê

Hudayî bi sebeb vê xusûsîyeta xwe ji çar sed salan û bi vir ve ew jîyîna xwe di dilan de berdewam dike.

Bêşiwar wekî ku di hemû usûl û metodên tesewwufî de wisa ye, di xusûsa terbîya nefsê de jî ev usûl pala xwe dispêrin terbîya nebewî, yan jî eks û xuyahîya wê ya di eshabê kîram de. Ev hadîse û bûyer, ji bo vê çi mîsaleke sipehî ye:

Eshabê kîram **Zeyd bin Sabit** wiha vedibêje:

Min cilek li ser Xelîfe Hezretê Ûmer dît; hivdeh pîne têde hebûn. Ez ji xwe re girîm û wilo vegerîyam mala xwe. Piştî midetekî ez dîsa derketim rê. Dîsa ez li Hezretê Ûmer rast hatim. Wî meşkeke avê danîbû ser milê xwe û di navbera mirovan de wilo dimeşî û diçû. Min bi heyret jê re got:

"-Hey Emîrê mûmînan!" Wî ji min re got:

"Huş be, neaxive, ezê sebebê vê paşê ji te re vebêjim!"

Ez pê re meşîm. Ew çû mala jineke yextiyar, meşka xwe di çêrên wê de rûkir, vala kir. Paşê em pev re hatin mala Hezretê Ûmer. Min jê pirs kir;

"-Te çima ev kir?"

Wî ji min re wiha got:

"-Piştî tu çûyî qasidên Rom û Farisan hatin dev min. Ji min re gotin;

"-Ya Ûmer! Xuda xêr û qencîyan bide te. Hemû însanan li ser îlmê te, fezîleta [çêtirbûna] te û edaleta te îttîfaq kirine!"

Piştî ew ji dev min rabûn çûn, hestên xwe ecibandinê hatin min. Vêca ez jî rabûm, min ew tiştên ku te dîtin li nefsa xwe kirin."[31]

Ha di tesewwufê de her tişt, bi da zanîna heddê nefsê jê re û di piştî îdrak-kirina halê "**hîçbûn**"ê de destpê dike. Ji dilên ku vê hessasîyetê qezenc dikin, fezîletên mûstesna û cihêwaz xuya û zihûr dibin.

Di vê xusûsê de dîsa ev halê Hezretê Ûmer, çi mîsaleke bi ibret e:

**Îyas bin Seleme** ji bavê xwe wiha diguhêze, hîkayet dike;

"Hezretê Ûmer hate çarçîyê. Di destê wî de kopalek hebû. Wî rast bi alîyê min ve kopal hejand û got;

"-Di nîvî de nesekine, rêya mislimanan negire!" Kopal li ser-kevîya cilê min ket.

Sala paşê jî ew bi min re hevrû bû, li min rast hat, ji min pirs kir, ji min re got:

"-Seleme, tu yê biçî hecê?"

Çi dema min jê re got:

31. Mûhîbbû't-Teberî, er-Rîyadu'n-Nedra, II, 380

“-Erê, ezê biçim.” Wî bi destê min girt û ez birim mala xwe. 600 dirhem dane min û ji min re got:

“Tu yê van di rêya hecê de li xwe xerc bikî. Vê zanibe ku ev hemberîya wî kopalî ye ku min li te hejandibû!”

Min jî jê re got:

“Ya Emîrê mûmînan! Ew kopalê ku te behsa wî kir, ji xwe nayê bîra min?”

Wî jî ji min re got:

“Ew ji bîra min jî hîç neçûye!”[32]

**Hezretê Ebû’l-Hesen Xereqanî** dibêje:

“*Ew dostên Heq, ên ku digihîjin mertebeyên bilind, li tenişta emelên ku bi îxlas dikin, ji ber ku nefsa xwe tezkîye kirine, bilind û mezin dibin*.” [33]

“*Çawa nimêj û rojî ferz e, edakirina wan mecbûrî ye, eynî wisan berterefkirina kibr, hesed û hirsê ji dil jî zerûrî ye*.”[34]

Bi rastî ew sirra ku hemû dostên Heq Teala xistine zirwe; ev halê tewazû, hîçbûn û tinebûnê ye. Ji bo vê, zatên arif gotine:

“*Dema tu ji navberê derkevî, Aferînerê te dimîne!*”

32. Teberî, Tarîx, IV, 224
33. Ettar, Tezkîre, rûp. 622.
34. Ettar, Tezkîre, rûp. 629.

Xuya xiraba ku nefs zor dikare terk bike jî; ğurûr, kibr û enanîyet e. Yek ji mûtesewwufên pêşîn **Ebû-haşim es-Sûfî** gotiye:

"*Kolana kibreke ku cihê xwe di qelb de girtibe, ji kolana çîyan bi derzîyê zortir e*." Lêbelê heta mirov di vê de biser nekeve jî, ji hêla maneyî ve tekamul bûn û bûna ew "**însanê kamil**" ê ku dîn perwerdekirina wî li ber xwe hedef datîne jî, ne mûmkin e.

Çawa ku di hedîseke şerîf de hatiye gotin:

"*Ew kesê ku bi qasî zerreyekê jî kibr di dilê wî de hebe, naçe Cennetê*."[35]

Ji vê hêlê ve ğurûr, kibr, ucb û enanîyet; pençeşêra rêya manewî ne. Ji xwe emanca terbîya tesewwufî jî; terk-kirina gotina "**ene**" yanî "**ez**"a ku ji nefsanîyetê dizê, daîmî bi gotina "**tu, ya Rebbî!**" jî xistina mohra îbtalkirinê li enanîyetê ye.

Halê **Hellacê Mensûr**ê ku cihekî xusûsî yê wî di dilên arifan de heye, li gorî ji yên ku di alema maneyê de seyr dikin hatiye guhastin; dema ew di sêpîyên îdamê de şenq dikirin **Îblîs** hate cemê, jê pirs kir, jê re got;

"*-Te "**ene**"yek got û min jî "**ene**"yek got. Çawa dibe ku ji ber vê, rehm li ser te dibare û lanet jî li ser min dibarin!*"

35. Muslim, Îman, 147

Hellac ev bersiv da Îblîsî:

*"-Te bi gotina "Ene"yê xwe ji Adem çêtir dît. Te kibra xwe li holê danî. Min jî got: «Ene'l-Heq», min hebûna xwe di Heq de tine kir. [Eynî çawa ku dema çem dikeve nav okyanûsê êdî ji çemîtîya wî şop namîne, min jî ez-îtîya xwe heland û min jî nefsa xwe tam bi teslîmîyet ji Rebbê xwe re ram kir.] Ew kibra ku ez-îtîya xwe li holê danîne, elameta Cehennemê ye. Berterefkirina ez-îtîyê, yanî tinebûna di Heq de jî, îfadeya "**hîç**"bûnê ye. Ji ber vê sebebê rehm ji min re hatiye xwarê û lanet û zillet jî ji te re hatiye xwarê.*"

Dema **Şeytan** -eleyhillane- îtîraz li fermana Cenabê Heq kir û îsyana yekê li dijî fermana wî kir, danpêdan [îtîraf] bi gunehê xwe nekir, di şûna ku efiwê bixwaze de; ew ji ğurûr, kibr û enanîyeta xwe re bû yexsîr û li ser xeta û şaşîya xwe israr kir, ji gunehê xwe jî poşman nebû.. Di şûna ku ew nefsa xwe şermezar bike û tobe bike de; ew ji bo ğurûr û înada xwe bû gorî û qurban. Bi vî awayî, ji bo laneta Cenabê Heq dûçar bû.

**Hezretê Adem** û dêya me **Hezreta Hewwa** jî bi xapxapoka şeytan kirin, fêkîyê wê dara ku Xuda li wan qedeğe kiribû ta'm kirin û ew gunehê pêşî yê ku ji nesla însên zahir bûyî, kirin. Lêbelê wan wekî şeytan bi hinek behaneyan ser xetayê xwe nenixumandin û di şûna ku ew hewl bidin, bibêjin em temîz in

de, derhal wan nefsa xwe şermezar kir û bi semîmîyet heqîqet îtîraf kirin, li xetayê xwe mikur hatin:

"**Herduyan got: Xudayê me! Me zulm li xwe kir. Heke tu li me nebûrî û rehmê li me nekî, hemin emê ji ziyankeran bibin**."[36]

Herduyan fezîleta vegerîna ji şaşîyan şanî da, di nav poşmanî û mehcûbîyetê de xwe avêtin ber rehm û meğfîreta cenabê Heq Teala.

Dema ew tobe û îstiğfarên ku wan bi hêstirên semîmî yên çavan kirin ji terefê Cenabê Heq ve hatin qebûlkirin, ew ji bo lutfa îlahî naîl bûn, pê gihan.

Ji vê hêlê ve mezintirîn mûcadela tesewwufê; li hemberî Rebbê xwe ji nefsê re dane-zanîna heddê wê ye. Lewra nefs, di ser îbadetê bi xwe de jî xwe diecibîne, bi dûv nuqsanîyên dîgeran dikeve, ji rêya derdorê ve [ne rasterast] xwe çêtir dibîne.

**Şêx Sadî-yê Şîrazî** di berhema xwe ya bi navê Gulistanê de vê bîranîna xwe diguhêze, vedibêje:

"Di zarokatîya xwe de jî dilê min li ser îbadetê min bû. Ez bi şev radibûm, bi îbadetê mijûl dibûm. Ez şevekê li dev bavê xwe rûniştibûm. Di temamîya vê şevê de xew nekatibû çavên min û min Qur'ana Pîroz ji destê xwe bernedabû. Hinek mirov jî li hawîrdora me ketibûn xewê. Min ji bavê xwe re got:

36. E'raf, 7/23

“-Yek ji van serê xwe ranake, du reket nimêja teheccud nake; wisan radizin her wekî ku mirîbin.”

Li ser vê peyva min, bavê min mirûzê xwe kir û ji min re got:

“-Kurê m! Xwezî te gotegot di bara xelkê de nekiriba û tu jî wekî wan ji xwe re razabûna!”

Yanî bavê wî her wekî ku ev ders dida Sadî-yî:

“-Ew mirovên ku tu wan biçûk dibînî, çendan ji feyza wextê seheran mehrûm bin jî ferîşteyên Kîramen Katibîn tiştekî menfî di bara wan de nanivîsin. Lêbelê li deftera emelê te jî biradînê xwe biçûk-dîtin û gunehê ğeybetê hate nivîsîn...”

Ha nefs, wekî ku di vê mîsalê de jî wisa ye bêjimar xefk û kemînên wê hene ku ji **sûretê heq** têne dîtin. Ew kesê ku xwe jî heyberek his bike, bi hesta çêtirbûneke nefsanî bibêje “**ez**” -dixwaze bila ew yek ji mûrşidên li pêş be, ku di rêya manewîyatê de xizmet jî kiribe- ew ji rêya heqîqetê dûr bûye.

Di vê xusûsê de ev hadîse, çi qeder bi hikmet e:

Mûctehidê mezin **Hezretê Ehmed bin Henbel**, dema li Beğdadê ji bazarê vedigerîya, yekî çentê wî, di dest wî de dît, bilez bazda hat, xwest raje çentê wî û hilgire. Dema Hezret, nexwest çentê xwe bidiyê, mêrik jê re got:

“-Seydayê min, xizmet-kirin ji bo mezinên me, wezîfa me ye.” bi vî awayî israr kir.

Hezretê Ehmed bin Henbel jî li hemberî vê gotinê, ev îfadeya bi hikmet jê re got:

“-Heke em xwe ji wan mezinan zanibin ku çentê wan were hilgirtin, ev dibe kibr; evê bibe delîl ku em yek ji biçûkên rastî ne. Bi vê sebebê, heke hûn me yek ji mezinan zanibin, ev sewabê bi we bide qezenckirin jî, ewê me bixe ğefletê. Ya baştir ev e, ez xwe yek ji wan mezinan nejimêrim ku çentê wan were hilgirtin û ez bi xwe, barê xwe hilgirim. Lewra **li mehşerê jî her kes bi xwe barê xwe hildigre û barê ti kesî li ti kesî din nayê barkirin**.”

Ha wê sirra ku ev şexsîyetên mûbarek mezin kirine, hissîyatên vê tewazû, hîçbûn û tinebûnê ne. Di hemberî vê de nexasim di roja me de hinek rêberên (!) rêyên manewî, her wekî ku hêzek, qewetek û qudretekê ji bo xwe îzafe bikin wisan dikevin nav helwestên meğrûr, mûtekebbir û egoîstane, vêca ew bi vê helwesta xwe jehrê dixin nav rêya ku wê temsîl dikin û leke tînin ser nezaket û zerafeta rêya manewî ya ku têde ne jî.. Haleveku ev peyva dibêje; “*meh-keme, ne milkê qazî ye*” jî îfade dike; rêya manewîyatê ne heq û mûkteseba ti kesî ye...

## TESEWWUF; PEVREBÛNA BI SALIHAN RE YE

**Şêx Sadî,** di bara sîrayeta di halan de û kes, çawa dikare heyata manewî ya xwe biguherîne de vê mîsalê dide:

"*Seyê Eshabê Kehf Qitmîr, ji ber ku bi sadiqan re bû, şerefeke mezin qezenc kir; navê wî kete Qur'ana Pîroz. Jina duyema Hezretê Nûh û jina Hezretê Lût jî ji ber ku dilê wan bi fasiqan re bûye, ew ji bo Cehennemê dûçar bûne. [Pêğemberbûna mêrê wan jî feyda nedaye wan.]*"

Wekî ku **Hezretê Îmam Ğezalî** ferman kiriye; bi ğeyrê muslim, fasiq û ğafilan re bûn, bi zemanî re ew bi pevrebûna zêhnî, pevrebûna zêhnî jî piştî midetekî bi pevrebûna qelbî werdigere. Ev jî gav bi gav însanî ber bi helakê ve tehf dide, diajoyê.

**Hezretê Xwace Ubeydûllah Ehrar** jî [w. 1490] di vê xusûsê de hezkirîyên xwe wiha şîyar dike, dibêje:

"*Bi eğyar û bêganeyan re bûn, sistayîyê dide qelb, perkendebûnê dide rûh û perîşanîyê jî dide dil.*"

Ji vê hêlê ve mirov nikare bihizire ku mûmînekî ehlê teqwayê wê bi îrade û arzûya xwe bi ğafilan re rabe û rûne. Di vê xusûsê de şanîdana nuqsanîya hessasîyetê, dikare însanî heta bi xusrana ebedî jî bajo û bibe. Çawa ku di hedîsa şerîf de jî hatiye gotin:

"*Însan ji kê hez bike bi wî re ye.*"[37]

Yanî însan ji kê hez bike û bêhtir bi kê re unsîyetê bike, di qîyametê de bi wî re tê heşrkirin.

Çawa ku ji ğafilan tesîrê menfî zihûr dibin û ew qelbî dixin tengasîyê, ji salihan jî tesîrê mûsbet hasil dibin û ew jî dil xweş dikin. Bi rastî jî mirov dikare bi bereketa wê îrtbata qelbî ya ku bi salihan re hatiye çespandin, bigihîje çendîn qezencên manewî.

Ji ber vê cenabê Heq mûmînan teşwîq dike ji bo ew bi evdên sadiq û salih re bibin û dibêje:

"**Gelî yên ku îman anîne! Xwe ji Xuda biparêzin û her digel sadiqan bibin**!"[38]

Heke mirov bala xwe bidiyê, baş xuya dibe ku cenabê Heq di ayeta pîroz de nabêje; "**bibin sadiq**" lêbelê dibêje; "**digel sadiqan bibin!**" yanî bi sadiqan re bibin. Lewra sadiq-bûn, xwezatirîn û tebîîtirîn encama 'bi sadiqan re bûnê' ye.

**Hezretê Xwace Ubeydûllah Ehrar** dibêje:

"*Fermana di ayeta pîroz de "**bi sadiqan re bibin!**" bi awayekî daîmî pevrebûnê îfade dike. Dema di ayetê de «pevrebûn» wek mûtleq were zikrkirin, ew hem pevrebûna fiêlî, hem jî pevrebûna hukmî îfade dike. Pevrebûna fiêlî, ev e mirov; bi hazirîya qelbî*

37. Buxarî, Edeb, 96
38. Tewbe, 9/119

*bilfiêl di dîwana sadiqan de bibe. Pevrebûna hukmî jî ev e mirov; di ğiyaba [nehazirîya] wan de jî halê wan xeyal bike.*"

Hest bi mehebbeta zatê salih kirin û di ğiyaba [nehazirîya] wan de jî xwe bi wan re hiskirin, karîna ku mirov bişê bi nêrîna wan li heyat û hadîseyan binêre, bi mirovî zindîtîyeke mezina manewî dide qezenckirin. Ha di tesewwufê de bi mûlahezaya dabîn û temînkirina vê feyda manewî ehemmîyeteke mezin bi "**rabita**"yê hatiye dayîn.

## PEVREBÛNA QELBÎ: RABÎTA...

**Rabîta**, mehebbetê daîmî zindî û sağlem digre. Di esasê xwe de li kaînatê hîç ti însanekî bêrabîta nîn e. Herkes bêşiwar bi qelbê xwe pevre di halê îrtîbatê de ye.

Îrtîbata dê-bavekî bi ewladê wan re, ya ewladî bi dê-bavan re, îrtîbata hevseran bi hev re, îrtîbata ciwanekî bi zatekî ku jê hez dike û wî ji xwe re dixe nimûne jî, peywendîyeke dilî ya wiha heye. Yanî di demeke ku peywendîyeke wiha tebîî ya mehebbetê di navbera tiştên dinyewî û fanî de heye, mirov nikare bihizire ku bila peywendîyeke wiha di manewîyatê de nebe.

Sipehîtirîn mîsal, ji bo rabîtayê bi maneya tesewwufî, peywendîya mehebbetê ya di navbera **eshabê kîram** û mezinê me **Pêğember** de ye.

Eshabê kîram bi saya îrtîbata qelbî ya wan bi mezinê me Resûlûllah re ew în'îkas û însîbağa ku di rûhên wan de hatiye meydanê, bi transferbûna halê Mezinê me ji bo wan bi xwe bi encam bûye. Ji ber vê ye ku eshabê kîram karîne bi semîmîyet ji mezinê me Pêğember re bibêjin;

"*Ya Resûlellah! Bila canê min, malê min û her tiştê min ji te re gorî be!*" û wan ji vê jî şîranî û zewqeke mezin girtiye. Wan fedakirina her tiştê xwe di rêya Xuda û Pêğemberê wî de minnetek li ser canê xwe zanîne.

Ew ketine nav mûhtewa û naveroka hedîsa şerîfa ku dibêje: "*Şexs ji kê hez bike bi wî re ye*."[39] ew di ğiyaba mezinê me de bi pevrebûna halî bi mezinê me re bûn hevhal, ew di nav pevrebûna fiêlî û pevrebûna hissîyat û fikrîyatê de pêre bûne. Ew bi bereketa vê pevrebûna qelbî, ji bo lutfên cihêwaz û mûstesna yên cenabê Heq Teala bûne mezher.

Çawa ku ew **Xubeyb** ê ku ketibû kemîna mûşrikan û bi êsîrtî ketibû destê wan, berî li Mekkê were şehîdkirin, wî arzûyeke tenê hebû: Ew karibe silaveke tije hurmet û mehebbet ji Resûlûllah re bişîne... Lêbelê ma wî karîbû wê silavê bi kî re bişîne?! Wî bi bêçaretî berê çavê xwe da asîmanî, îltîca kir, wiha got:

39. Buxarî, Edeb, 96

“Xudayê min! Li vir ti kes nîn e ku silavê min bigihîne Pêğemberê te. Tu, wan silavê min bigihîne wî!”

Ew dem mezinê me Resûlûllah bi sehabîyê xwe re li Medînê bû, bi maneya “*bila silav li ser wî bin jî*” got; “*we eleyhisselam!*” Sehabîyên ku ev jê bihîstin bi heyret jê pirs kirin, jê re gotin;

“-Ya Resûlellah! Te bersiva silava kî da?”

Ji wan re got:

“*Min bersiva silava birayê we Xubeyb da. Ha Cibraîl, silavê Xubeyb ji min re anîn!*”[40]

**Resûlê Xuda** berî **Peymana Hudeybîyê** ya ku bi mûşrikên Mekkê re kiribû, **Hezretê Osman** jî wek qasid ji bo Mekkê hinartibû. Heke çi qeder Hezretê Osman ji wan re got; nîyeta me edakirina umrê ye, piştre emê vegerin jî lêbelê mûşrikan dîsa destûr neda. Ji bilî vê jî wan ew xist hebsa berçavan û jê re gotin:

“-Heke tu bixwazî, tu bi tena serê xwe dikarî Kabê tewaf bikî!...”

Ew sihabîyê mûbarek ê ku xwe ji bo Xuda û pêğemberê wî kiribû weqf, derseke mûhteşema sedaqetê da û ji wan re wiha got:

40. [Li Buxarî, Cîhad 170, Meğazî 10, 28; Waqidî I, 354-363’êyan binêrin]

"-Heta ku Hezretê Pêğember Kabê tewaf neke ez jî nikarim wê tewaf bikim! Ez Beytûllahê bes di piştî wî de zîyaret dikim. Li devereke ku Resûlê Xuda nehatibe qebûlkirin, ez jî nîn im..."[41]

Li rexê din, çi dema şaîaya [gotegota] Hezretê Osman hatiye şehîdkirin bi mûmînên ku li Hudeybîyê çavnêrî dikirin, giha, Resûlê Xuda jî li hemberî vê sedaqeta wî bi sedaqeteke mûhteşemtir pêşwazî kir û ji sehabîyên xwe bey'et wergirt; heke pêwîst bike, emê bi mûşrikan re herbê bikin. Piştre wî destekî xwe li ser destê dîtirê xwe danî û got:

"*Xudayê min! Ev bey'et jî ji ber Osman ve ye. Bêşiwar ew, di xizmeta Te û Resûlê Te de ye*." [42] Bi vî awayî pêbawerbûn û îtîmada xwe ya li ser wî îzhar kir.

Ha hesta pevrebûna qelbî ya sehabîyan bi Resûlê Xuda re, di ğiyaba wî de jî wiha bû. Her wekî ku di bedenên cuda cuda de bûn lêbelê bi heman kezeb û dilî dijîyan.

Di mewzûya Rabîta'yê de bêşiwar di navbera sehabîyan de mîsala zirwetirîn îrtîbata qelbî ya Hezretê Ebûbekr bi mezinê me Pêğember re ye.

Hezretê Siddîq, bi mehebbeteke wisan kûr bi mezinê me Resûlûllah re girêdayî û bend bû ku ew ketibû rewşeke wisan ku pê xweş bû û ew razî bû ji

41. Ehmed, IV, 324
42. Buxarî, Eshabu'n-Nebî, 7.

bo bevkenî û tebessumeke wî dinyayê tevî bide. Ew di wê xwestek û arzûyê de bû ku hemû tiştên xwe di rêya wî de feda bike. Heta mezinê me Pêğember neqlekê ev comerdîya hevalê xwe teltîf kiriye û jê re gotiye:

"*Bi qasî ku min ji malê Ebûbekr îstîfade kiriye, min ew qeder ji malê ti kesî din îstîfade nekiriye...*"

Ew sehabîyê timsala sedaqetê Ebûbekr ê ku her tiştê xwe ji bo Resûlê Xuda kiribû feda, wî ji vê peyva teltîfî jî cure maneyeke cuda dîtinê his kir û bi çavên hêstirbarîn got:

"-Ya Resûlellah! Ma ez û malê xwe bes, ne yên Te ne?!"[43]

Bi vî awayî wî îfade kir û got; min hemû hebûna xwe ji bo Hezretê Pêğember weqf kiriye û ez ji dil û can jê re ram bûme. Êdî dilê wî bûbû wekî eyneyeke berraqa ku têde alema qelbî ya Resûlê Xuda xuya dibû. Bi saya vê, ew bûbû mehremê nêzîktirîn ji bo esrarê nebewî. Her tiştê mezinê me Fexrê kaînatê, di qelbê wî de maneyeke zehf kûr qezenc kiribû. Wilo bûbû ku Ebûbekr di xusûsa îdrak-kirina hikmeta ayetên Xuda, hedîsên şerîf û hadîseyan de bûbû gire-gir û pêşîvanê sehabîyan. Wî çendîn nukteyên nebewî yên ku ti kesî ew fehm nekirin bi feraset û besîreteke pêşebîn his kiriye.

43. Îbnmace, Mûqeddîme, 11

Çawa ku dema ev ayet:

“...**Îro, min dînê we, ji we re kamil kir; min nîmeta xwe ji we re temam kir û min Îslam ji we re wek dîn pejirand**...”[44] di Heca Wedaê de hatibû xwarê. Herkes bi temambûna dîn keyfxweş bû. Lêbelê Hezretê Ebûbekr ev heqîqet ji vê his kir ku Ellah Teala di mideteke nêzîk de wê Resûlê Hezkirîyê xwe ji bo alema ebedî dawet bike. Ew bi jana agirê cudabûnê ku ketibû dilê wî, di huzn û şînê de ğerq bû.

Yek ji wan mîsalên dîtir ê ku vê fehmkirina zirava wî şanî didin jî ev nimûne ye:

Resûlê Xuda di rojên xwe yên dawîyê de bi sebeb giranbûna êş û nexweşîya xwe nikarîbû derkeve, biçe mizgeftê. Ebûbekr jî wek îmam teyîn kiribû ji bo li pêşîya cematê nimêjê bike. Feqet wî carekê xwe qenc his kiribû û derketibû, çûbû mizgeftê. Piştî wî hinek şîret û nesîhet li eshabê kîram kirin, wiha got:

“*-Xudayê şan-mezin, evdekî xwe di navbera bijardina dinyayê û nîmetên li cem xwe de serbest hişt. Wî evdî jî yên li cem Xuda bijardin!..*”

Li ser van peyvan, dilê hessas û tenik Hezretê Ebûbekr ğemgîn bû, piştre jî destpê kir, hêstirên ziwa ji çavên wî barîn. Lewra wî hestpê kir ku Resûlûllah bi vê cure axaftinê xatiran ji wan dixwaze. Wî jî ji ber

44. Maîde, 4/3

cudabûnê wekî ney-eke ku dinale, dest bi feryadê kir. Wî bi îske-îsk got:

"-Dêya min, bavê min bi gorî te bin, ya Resûlellah! Emê bavê xwe, dêya xwe, canê xwe, malê xwe û zarûzêçên xwe ji te re feda bikin!.."[45]

Ji bilî Ebûbekr ti kesî ji cemaetê hissîyata kûra Hezretê Pêğember fehm nekiribû û tênegihabû ku ew xatiran ji dinyayê dixwaze. Heta eshabê kîram ti mane nedabûne girîna Hezretê Ebûbekr û bi sosret û heyret ji hev re gotibûn:

"-Dema Resûlûllah ji evdê salihê ku gihiştina Rebbê xwe tercîh kiriye, behs kir, girîyê vî yextiyarî, bi rastî mirov dixe heyret û sosretê!"[46]

Lewra nehatibû hiş û eqlê wan ku ew evdê salihê di bara tercîhkirina nîmetên li cem Xuda de hatibû serbest-hiştin, Resûlûllah be û ew hisa ku Ebûbekr hestpê kiribû, wan ew his nekiribû.

Di vê navê de Resûlûllah, hem ew dilê ğemgînê Ebûbekr tesellî kir, hem jî ji bo qîmetê wî ji eshabê xwe re beyan bike, axaftina xwe wiha berdewam kir, got:

"*Her kesê ku qencîya wî gihabe me, hemberê wê yan bi eynê wê, yan bi zêdetirî wê jî hatiye edakirin.*

45. Ehmed, III, 91
46. Buxarî, Selat, 80

*Lêbelê Ebûbekr cuda ye!.. Ew qeder qencîyên wî çêbûne ku roja qiyametê Xuda wê hemberê wan eda bike, bide.*

*Çi bi hevaltîya xwe be, çi jî bi malê xwe be, ji her kesî bêhtir qencîya Ebûbekr gihaye min. Heke min ji bilî Xudayê xwe yekî din kiriba dost, bêşiwar min dê Ebûbekr ji xwe re kiriba dost. Lêbelê biratîya Îslamê hê çêtir e.*"

Resûlûllah berî barbike bal exrete ve bi çend rojan got:

"*Hemû derîyên [xusûsî] ku bi Mizgeftê ve tên vekirin, bila werin girtin, bes bila derîyê Ebûbekr vekirî bimîne!*[47] *Lewra ez li ser derîyê Ebûbekr nûrê dibînim...*" [48]

Bi vî awayî hemû derî hatin girtin, sade derîyê Ebûbekr tenê vekirî ma. Bi maneya îşaretkî dibe ev; derîyê nêzîkatîya manewî ya ji Resûlê Xuda, dikare li însanî vebe, dema ew di sedaqet, teslîmîyet, îtaet, fedakarî, dostanî û hezkirin û mehebbeta Resûlûllah de wekî Hezretê Ebûbekr be.

**Welhasil**, ew **rabîta**'ya ku taze girtina mehebbeta di dil de ye, ev e ku mirov hewl bide; bi sîlsîlîya

47. Buxarî, Eshabu'n-Nebî 3, Menaqibu'l-Ensar 45, Selat 80; Muslim, Fedaîlu's-Sehabe 2; Tirmizî, Menaqib 15.
48. Îbnû S'ad, II, 227; Elî el-Mûtteqî, Kenz, XII, 523/35686; Îbnû Esakîr, Tarîxu Dîmeşq, XXX, 250.

mûrşidên kamil ên ku gihane mezinê me Resûlûllah, îrtîbata qelbîya xwe xurt bike û ji hêla maneyî ve ji vê pevrebûnê îstîfade bike.

## YÊ LI YEMENÊ LI DEV MIN E...

Heke li tenişta vê pevrebûna qelbî ya bi dostên Xuda re, pevrebûna zahirî jî çêbibe, hingê ev dibe "**nûra li ser nûrê**". Lêbelê di terbîya tesewwufî de pevrebûneke ziwa û rijî ya zahirî ne meqbûl û kafî ye. Lewra hinek însan li ber çoka mûrşidekî kamil dibin jî, lêbelê ew bi sedem bêxeberî û ğefleta xwe ti hissekî wernagirin.

Li rexê din, çendîn mirîdên semîmî yên li welatê dûr hene ku bi wesîla mehebbeta fereh, hurmet, hesret û pêbendîya xwe ji bo mûrşidê xwe dikarin bigihîjin nesîbê mûstesna û cihêwaz.

Çawa ku mezinan gotiye: "*Yê li Yemenê li dev min e; yê li dev min jî li Yemenê ye.*" Bi vê sedemê ya mûhîm; em li kuderê dibin bila bibin, divê em rewş û halê rabîta'ya xwe, yanî hesta pevrebûna qelbî ya xwe her jidest nedin.

Çawa ku **mezinê me Resûlûllah** jî gotiye:

"*Ji mirovan yên ku ji her kesî bêhtir ji min nêzîk ew mûtteqî ne, ku kî dibin û li kuderê dibin her li hemberê Xuda ehlê teqwayê ne.*" [49]

49. Ehmed, V, 235; Heysemî, Mecmeu'z-Zewaid, Beyrût 1988, IX, 22.

Ew rabîta'ya ku di terbîya tesewwufê de usûleke mûhîm e, nexasim ji sedsala 19'an û pêde ji terefê hinek mirovan ve kirine her wekî ku mesela îman-kufrê be, wisan ew bi şiddet hatiye tenkîdkirin. Hal-hale rabîta, -wekî ku berê jî me îfade kir- waqîayeke psîkolojîyeka ğayet tebîî ye. Rabîtayeke ku bi vî awayî were fehmkirin û tetbîq-kirin, hîç terefekî wê nîn e ku îtîqadê xirab bike.

**Hezretê Ubeydûllah Ehrar** di vê xusûsê de wiha gotiye:

"***... Ew kesê ku qelbê wî bi tiştên dinyayî yên wekî mal-milk ve bend be û van dihizire kafir nabe lêbelê çima girêdana qelb bi mûmînekî*** *[kamil]* ***ve*** *[û ji wî hezkirin]* ***bibe sebebê kufrê?***" [50]

Ji vê jî zêdetir, ew însanên ku dilê wan bi rêberekî manewî ve ne bend be, bi sebeb heqîqeta ku "**tebîet valahîyê qebûl nake**." Îhtîmal heye ku ew bi dûv nimûneyên şaş bikevin. Çawa ku hatiye gotin; "*ew qelbê bi Heq ve mijûl nabe, batil wî dagir dike.*"

**Welhasil**; **rabîta ev e; mirîd wê hezkirina ji mûrşidê xwe ya ku hestpê dike, hewl dide wê daîmî di dilê xwe de taze wergire, emelên salihê wî û halê sipehîyê wî teqlîd bike. Lewra bi qasî sohbet û**

50. Elî bin Huseyn Safî, Reşahat-ê Eynu'l-Heyat [thk. Alî Asgar Mû'îyîyan], Tehran 2536/1977, II, 636-637.

**îrşada zatên salih, mehebbeta wan jî bi tesîr û bi feyda ye...**

## TESEWWUF;
## NE SÛRET E, RÊYA SÎRETÊ YE!..

Di xusûsa îstîfadekirina maneyî ji zatên salih de, -cihê wê hatiye- divê bi kurtasî em ji mijara resim û wêneyan jî behs bikin:

Di roja me de bi pirrbûna îmkanên teknîkî furyayeke fotoğraf kişandinê destpê kiriye. Her wekî ku her der bûye studyoyeke fotoğrafan, her kes jî bûye fotoğrafgir, bûye wênegir. Ya di zemanên din de li cihekî bihêle; em bi ğemgînî dibînin ku dema di Kabê de tewaf tê kirin, dema li Erefatê weqfe tê edakirin, dema di Rewza Mûtehhera de zîyaret tê kirin de jî ji hedd û hesabê zêdetir meşğûlbûn bi kişandina fotoğraf û vîdeoyan ve çêdibe. Ev ji wan karên malayanî ne ku feyz û rûhanîyeta îbadetê xirab dikin.

Eynî xusûs, mixabin di sohbetên manewî de jî pêktê. Di sohbetan de îcab dike ku bi pevrebûna qelbî, tefekkur û texessusê tîrbûn û himbizbûn li ser îstîfadeya manewî were kirin -belkû bi nîyeta baş be, bi hizra bila bîranîneke manewî bimîne be- lêbelê em dibin şahid ku zehf zêde fotoğraf û vîdeo têne kişandin. Feqet ji heddê wê zêdetir jî ehemmîyet dana bi vî karî jî ne rast e. Eynî wekî dermanê ku dema

dozaja wî tê zêdekirin di şûna şîfayê de dibe jehr, ev jî wilo zirarê didin manewîyata însên.

Divê em jibîra nekin ku kamerayên îlahî ji xwe her an û dema me qeyd dikin. Li axretê, evê li pêşîya me bêne danîn û bi me bêne temaşekirin jî...

Çawa ku di ayeta pîroz de wiha tê gotin:

“**Kî bi qasî zerreyekê xêr kiribe, ewê wê bibîne. Kî bi qasî zerreyekê şer jî kiribe, ewê wê bibîne**.” [51]

Wekî ku berî niha jî hatiye îfadekirin di pevrebûna bi salihan re û di rabîtayê de ya mûhîm; ne pevrebûna zahirî, sûretî û şeklî ye, lêbelê pevrebûna qelbî, gîyanî û rûhî ye.

**Hezretê Samî Efendî** dibêje:

“*Di rabîtayê de tefekkurkirina xeyala mûrşidî ne lazim e. Mehebbet lazim e. Ji xwe însan ji kê hez bike, daîmî wî tîne ber çavên [dilê] xwe*.” [52]

Resim, wê texeyyula însanî ya ku dikare ber bi bêdawîtî û mûcerredê ve dirêj bibe, di plana maddî de hebs dike, tixûb jê re datîne. Ji bilî vê jî, hukmên Îslamê di bara resiman de jî ji xwe malûm in.[53] Resimên însanan, sûretên wan terefên wan yên zerf in.

51. Zilzal, 99/7-8
52. Remezanoğlû Mehmûd Samî, Mûsahebe, VI, rûp. 151, Weşanên Erqam. Îst. 1982.
53. Ji bo tefsîlatê li “Nebîler Sîlsîlesî”yê I, rûp. 213-214, Weşanên Erqamê. Îst. 2013’an binêrin.

Ya mûhîm jî mezrûfa însanî ye, yanî alema dilî ya wî ye. Rêya tesewwifê jî, ne rêya sûretî ye, rêya sîretî ye. Ji pevrebûna bi salih û sadiqan re jî meqsûd; ji sûretê wan zêdetir, pevrebûna bi sîreta wan re ye. Heta xetên cereyanê ji dilan ber bi dilan ve neyên tesîskirin, hîç ti proteza ku jê tê xwestin cihê van bigre, yanî ji wasîteya sun'î û çêkirî feyda hasil nabe. Xuyanên eslî yên bi feyde; xuyahîyên li dinyaya hundurî ne, ew bîranên ulwî û întîba ne, ku di dil de dimînin.

**Hezretê Elî** çi xweş dibêje:

"Bi însanên salih û sadiq re bibin, bi wan re rûnin, rabin ku [karekter û şexsîyeta wan sîrayet bike, were we jî.] dema hûn li heyatê bin, bila însan bêrîya we bikin, dema hûn wefat bikin jî, bila ew hesreta we bikişînin."

**Cenabê Heq, par wergirtina ji tevna dilê mirovên ku ji wan hez dike, exlaqbûna bi exlaqê wan, bi vî awayî qelbekî selîm bike nesîbê me tevan ku ew her daîm zikr bike, fikr bike û şukr bike.**

**Amîn!..**

# RÊYA QELBÊ SELÎM..

Însanekî ku bi qelbê xwe mesafe qut nekiribe -çi qeder ew zana dibe bila bibe- ewê her xav bimîne. Ewê bi vê xavîya xwe îlmên dinyewî tehsîl bike, mesela heke ew doktorek be, di cihê ku ji însanan re şîfayê bexş bike de, ji bo karibe îhtîrasên nefsanî yên xwe tetmîn bike, ewê bibe qesabekî mirovan ku qaçağçîtîya organan dike. Heke ew hiqûqnas be, di cihê ku edaletê bicih bike de, ewê bibe serçeteyê toreke sûcan, yan jî ewê bibe celladekî zalim. Heke ew serokê dewletekê be, ewê bibe niwênerê zulmeke gemar û mekroh. Heke ew îlmên dînî tehsîl bike û bibe zilamê dîn jî, ewê têgihiştineke dînî ya bê rûh û ji teqwayê dûr, nîşan bide.

Lewra nefseke xava ku êsîra îhtîrasan be, ewê hemû îlmên xwe ji bo menfîetên suflî yên xwe bike alet...

# RÊYA QELBÊ SELÎM...

Cenabê Heq em evdên xwe, belaş [digel ku me ti bedel û hemberîyek nedaye jî] di "**ehsenê teqwîm**" de, yanî di qiwama sipehîtirîn de û li ser **fitreta Îslamê** aferandine. Lêbelê wî ji bo îmtîhanê em li ser sifetekî wilo aferandine û bi "**nefs**"-eke wisan xemilandine ku dikare berê xwe bide ser "**teqwa**" û "**ficûr**"ê, yan li ser xêr û şerrê yan jî li ser sewab û gunehan jî..

Ji bo em îmtîhana evdînîyê di heyata dinyayê de qezenc bikin, zortirîn astenga ku divê em jê bibûrin, nefsa me bi xwe ye. Ji bo em ji astenga nefsê jî bibûrin, zerûrî ye ku em nefsa xwe tezkîye bikin, yanî em bikevin rêya terbîya manewî û tekamulê.

**Hezretê Îmam Ğezalî** wiha dibêje:

"*Însan wekî mûmê hinguvîn e. Mirov kîjan şeklî bixwaze; çi mûsbet be, çi jî menfî be, dikare însanî bi terbîyê bixe wî şeklî.*"

Mesela du zarokên sê salî hene, yek ji wan cewrikê seyekî dibîne û şîr didiyê, yê din jî kevir diavêjîyê. Ev jî netîca ferqa wê terbîyê ye, ku her yekî ji wan wergirtiye.

Ha ji bo berterefkirina temayulên menfî yên di fitreta însanî de û pêşvebirina amadekarîyên mûsbet jî **terbîya manewî** lazim e.

**Hezretê Îmam Ğezalî** di însanî de sê hêzên fitrî tesbît kirine ku ew şekl didin hal û bizavên însanî. Ew jî ev in:

1] **Quwweya Eqlîyye** ye [hêza eqlî ye],

2] **Quwweya Ğedebîyye** ye [hêza hêrsa bedenê ye],

3] **Quwweya Şehewîyye** ye [hêza arzûyan e].

Ev hersê qewet jî xwe di sê şeklan de di heyatê de didin xuyakirin;

**Îfrat**, **tefrît** û **îtîdal**.

**-Îfrat**: Ji pîvanê bûrîn, bi zêdegavîyê ve çûn e.

**-Tefrît**: Ziddê zêdegavîyê ye. Yanî nuqsanî û sistahî şanîdan û di jêra navê de man e.

**-Îtîdal** jî, nîva îfrat û tefrîtê ye. Yanî nuqteya hevkêşîya meqbûla hal û bizavan e.

**Îfrata quwweya eqlîyye**, cerbeze ye/serxweveçûn e. **Tefrît**a wê ehmeqtî ye. **Îtîdal**a meqbûla wê

jî, bi bikaranîna eqlî di bin rêberîya wehyê de gihiştina hikmet û ferasetê ye.

**Îfrata Quwweya Ğedebiyye**, hiddet e, yanî hêrsa zehf zêde ye. **Tefrît**a wê, tirsonekî ye. **Îtîdal**a meqbûla wê jî, şecaet e; bi qasî miqdarê lazim û di cihê wê de bikaranîna hêz û cesaretê ye.

**Hezretê Elî** dema ji bo Xuda ceng dikir û tam dikir ku kafirekî bikuje, ew kafir bi hewl û bêçaretîya xwe tif dike rûyê wî, li hemberî vê Hezretê Elî wî nakuje û dev jê berdide. Ev hadîse, di vê xusûsê de nimûneyeke mûstesna ye.

Lewra ew sehabîyê mûbarek, ne ji bo hêrsa nefsa xwe, yan jî ji bo qouretî û ğurûra xwe tetmîn bike ceng dikir. Lêbelê wî sade bi meqseda fermana Xuda bîne cih, cîhad dikir. Wî ev emelê xwe sirf ji bo riza'ya Xuda dikir, ji bo siha arzûyeke nefsanî neyêne serê jî wî karî hêrsa xwe biqurpîne û ev fezîlet nîşan dabû. Yanî wî quwweya ğedebîyye'ya xwe ji bo îrşada wehyê ram kiribû û îradeya xwe ji bo bikaranîna meqbûltirîn şeklê wê, şanîdabû.

**Îfrata Quwweya şehewîyye**, ficûr e, bê edebî û bê exlaqî ye. **Tefrît**a wê cimûd e, yanî sarbûn û bi qeşa-bûn e. **Îtîdal**a meqbûla wê jî, edeb, îffet û heya ye.

Îslamê; hemû reftar û bizavên beşerî yên ku dişên bi quwwetên eqlî, ğedebî [hêrsî] û şehewî bêne bici-

hanîn, îdealîze kirine û şeklên rewa û meqbûlên wan dîyar kirine. Mesela di zahirê xwe de “qatil” û “ğazî” eynî kar û fiêlê dikin. Feqet qatil, ji bo hesabê nefsa xwe cînayetê dike û dibe ku wî mezintirîn sûc kiriye; ğazî jî; dibe ku wî kirina fezîleta cîhada ji bo riza’ya Xuda, kiriye.

Ji hêla bidestxistina qezenca maddî ve di zahirê xwe di navbera “**riba**” û “**ticaret**”ê de lihevçûn û mûşabehet heye. Lêbelê ew riba’ya ku xirab bikaranîna heqê ferd û civakê ye, heram e; ticaret jî wesîla qezenceke helal e.

“**Zina**” û “**cîma-gan**” jî wekî vê ne. Zina, neslan mehû dike, kirineke heram û merdûd e. [Têkilîya zayendîya rewa di navbera hevseran de] Ew heyata aîlewî û malbatîya afîfane ya ku wesîle ye ji bo çêkirina nesl û zurîyyeteke baş û civakeke dilşad û aram, helal û meqbûl e.. Çawa ku di ayetê de wiha tê gotin:

“**Ew** [evd wiha dûa dikin] **dibêjin: Xudayê me! Jin û zarokên wisan bide me ku çavên me rohnî bikin û me ji mutteqîyan re jî bike rêber!**”[54]

Naxwe ew kirinên însanî yên ku di zahirê xwe de dişibihin hev, li gorî ka nefs di terbîya îlahî re derbas bûye yan nebûye, dibin sersebebê seadet û dilşadî, yan jî helaket û felaketê.

54. Furqan, 25/74

Ha emanca terbîya manewî jî; parastina hêz û temayulên însanî ji îfrat û tefrîtê û anîna wan ji bo sewîya îtîdala [hevkêşîya] meqbûl e ku Qur’an û Sunnetê ew dane zanîn. Heke ev temayulên fitrî ji halê wan re werin hiştin û ew neyêne terbîyekirin, ewê ne ji bo xêrê; lêbelê ji bo zulm û şerrê bibin wasîte; ew nabin sersebebê feydê, lêbelê ewê bibin sersebebê zirarê.

Ji vê hêlê ve însan mexlûqekî wisa ye ku bi awayekî mûtleq pêdivîya wî her bi talîm û terbîyê heye.

Cenabê Heq jî, pêğember wek mezintirîn terbîyekar ji însanan re kirine xelat. Bi taybetî jî wî pêğemberên xwe di wan serdem û werçerxên cahilî de şandine ku heq-hiqûq û însanîyet hatibûne berzekirin û jidestdan. Pêğemberan ew însanên ku bûne peyrewên wan, di jêr terbîya wehyê de perwerde û kamil kirine, ew ji tarîtîyên cahilîyetê xilas kirine û ew anîne wî halê wisan baş û kirine şexsîyetên stêrî yên wisan ku karibin medenîyeta fezîletê damezirînin.

## SÊ WEZÎFEYÊN PÊĞEMBERAN

Di ayeta pîroz de tê goitin:

“[Gelî mirovan!] **Sûnd be ku me pêğemberek ji nav we bi xwe ji we re şand. Ew ayetên me ji we re dixwîne, we** [ji xirabîyan] **paqij dike, Qur’an û**

**hikmetê li we dide hînkirin û we ji bo tişta ku hûn pê nizanin, fêr dike.**”[55]

Cenabê Heq di vê ayeta pîroz de balê dikişîne ser sê wezîfeyên mûhîm ê **mezinê me Resûlûllah**:

1) يَتْلُو عَلَيْكُمْ آيَاتِنَا : **Ew ayetên Xuda ji we re dixwîne, dîn teblîğ dike.**

2) وَيُزَكِّيكُمْ : **Ew alema navxweyî ya we tezkîye dike; hestên we temîz dike.**

3) وَيُعَلِّمُكُمْ الْكِتَابَ وَالْحِكْمَةَ : **Ew di netîca vê terbîya rûhî de kûr-nuqteyên Qur'ana Pîroz; hikmet û sirrên îlahî yên ku di kaînat, hadîsat û wiqûatan de têne şanîdan, li we dide hînkirin**.

Wekî ku tê zanîn, mezinê me Pêğember ummeta xwe ji bo Îslam û bawerîya tewhîdê bang kiriye; wî ev jî bi vê destpê kiriye, wehya ku jê re dihat, dixwend û ew teblîğ dikir. Ev wezîfe, di gihandina însanan ji bo hedefa nîhaî de qunağ û merhela pêşîn e.

Gihiştina meqseda eslîya banga tewhîdê jî, bi paqijkirina nefsa mirovan ji qirêjên manewî yên wekî **kufr**, **şirk**, **nîfaq**, **rîya**, **kibr** û **hesed**ê û gihandina wan bi **îxlas**, **teqwa**, **xuşû** û **hizûr**ê mûmkin e.

**Hezretê Ebû'l-Hesen Xereqanî** di vê xusûsê de wiha dibêje:

55. Beqera, 2/151

“*Heke ji tenûrê çîkek bipeke, li cilê te bikeve, derhal tu destpê dikî wî dimevirînî! Lêbelê çawa tu dikarî destûrê bidî agirekî wekî van sifetên xirab; kibr, hesed û rîyayê ku dînê te dişewitîne, di qelbê te de raweste?!*” [56]

Ha **tezkîye**, derbaskirina hemû hestan di parzûnka îmanê re ye û paqijkirina wan e. Ew, her wekî rafînekirinê, sefha û qunağa temîzbûn û xalisbûna wan e.

**Îbnû Ebbas** îfadeya “**tezkîye/paqijbûnê**” ku di ayetan de derbas bûye, bi awayê ku “*kes dibêje* ***«laîlahe îllellah!»***” tefsîr dike.[57] Lewra gava pêşîn di tezkîyê de, paqijbûna qelb ji kufr û şirkê ye.

Çawa ku di kelîma tewhîdê de jî pêşî bi “**nefy**”ê tê destpêkirin. Yanî însan dibêje; “**la îlahe**” her wekî wan hemû hewesên nefsanî û xuyên mekroh ên ku bûne pût ji qelb têne derxistin. Piştre însan derbas dibe diçe “**îsbat**”ê. Yanî ew bi awayê gotin; “**îlellah**” wî qelbê xwe yê ku di rewşa nezargeha îlahî de ye, bi nûra tewhîda Ellah Teala tije dike.

Şair vê rastîyê çi xweş îfade dike:

*Eğyara ji dilê xwe bajo, derxîne, ta Heq têde tecellî bibe;*

56. Xereqanî, Nûru’l-Ulûm, rûp. 239.
57. Qurtûbî, el-Camî, XX, 22.

*Padîşah naçe serayê, ta xane ava nebe...*

"*Ji seraya dilê xwe, ji ğeyrê Ellah çi hebin tevan bajo, jê derxîne. Lewra padîşah ji bo serayeke ne sipehî, ne hilanî û danî û ne temîz teşrîf nake, nayîyê.*"

Di piştî vê sefha temîzîya dil de jî, merhela "**talîma Qur'ana Pîroz**" tê ku ew jî wan emr û nehî û ferman û qedeğeyên îlahî beyan dike, ewên ku divê mirov bi xebera wan bike û wan her di jîyana xwe de tetbîq bike.

Xwe kûr berdana di tefekkura Qur'anê de jî, bi gihiştina vê temîzîya qelbî mûmkin e. Lewra mirov bes bi qelbekî temîz dikare Qur'ana Pîroz bixwîne û têbigihe.

**Hezretê Osman** wiha dibêje:

*"Heke qelbê we tertemîz bûna, hûn ji kelamê Xuda têr nedibûn."*[58]

Ji vê cîhetê ve şert e ku mirov pêşî alema hundurîna xwe ji tesîra fikrên batil û hestên suflî rizgar bike û wê bi îtîqadeke sahîh, yanî bi bawerîyeke tekûz û exlaqekî xweş tezyîn bike, bixemilîne. Ha di piştî van hemû merhelan de bende destpê dike; ji bo tecellîyatên "**hikmet**"ê, yanî ji bo batinê hadîsat, wiqûat û tiştan û ji bo heqîqetên sirrî dibe mezher û xuyageh.

58. Elî el-Mûtteqî, II, 287/4022

## ÎLMÊ BÊFEYDE

Balkêş e ku di ayetên pîroz de "**tezkîye**" û "**talîma Kîtab û hikmetê**" li cem hev hatine zikrkirin û bibîrxistin. Di eynî zemanî de ev îfadeyeke vê heqîqetê ye; bi qelbekî ku nehatibe tezkîyekirin, di maneya rastîn de îlm tehsîl nabe; ew îlmê ku hizr tê kirin ew hatibe tehsîlkirin jî, di rêya xilasîya ebedî de ti feydê nade xwediyê xwe.

Ji lewma **mezinê me Pêğember** wiha nîyaz dikir, digot:

"*Xudayê min, ez ji îlmekî ku feydê nade, ji dilekî ku natirse, ji nefseke ku têr nabe û ji dûayeke ku qebûl nabe, xwe diavêjim ber penaha te*."[59]

Însanekî ku bi qelbê xwe mesafe qut nekiribe -çi qeder ew zana dibe bila bibe- ewê her xav bimîne. Ewê bi vê xavîya xwe îlmên dinyewî tehsîl bike, mesela heke ew doktorek be, di cihê ku ji însanan re şîfayê bexş bike de, ji bo karibe îhtîrasên nefsanî yên xwe tetmîn bike, ewê bibe qesabekî mirovan ku qaçağçîtîya organan dike. Heke ew hiqûqnas be, di cihê ku edaletê bicih bike de, ewê bibe serçeteyê toreke sûcan, yan jî ewê bibe celladekî zalim. Heke ew serokê dewletekê be, ewê bibe niwênerê zulmeke gemar û mekroh. Heke ew îlmên dînî tehsîl bike û

59. Muslim, Zikr, 73

bibe zilamê dîn jî, ewê têgihiştineke dînî ya bê rûh û ji teqwayê dûr, nîşan bide.

Lewra nefseke xava ku êsîra îhtîrasan be, ewê hemû îlmên xwe ji bo menfîetên suflî yên xwe bike alet... Cahilekî ku wê zulma nikaribe bi cehaleta xwe bike, ewê karibe hê kambaxtira wê zulmê bi wî îlmê ku bidest xistiye, bi hêsanîtir bike. Lewra bi vegotina **Hezretê Mewlana**;

"*Ha te îlm li mirovê bêexlaq hîn kir; ha te şûr da destê mirovê eşqîya*."

Yanî îlm ji bo nefsên xav ên ji terbîya manewî mehrûm, di şûna ku ew evdî ji Rebbê wî nêzîk bike de, ew dibe perdeyeke ğefletê ku ew hê bêhtir wî ji Rebbê wî dûr dike.

Naxwe tehsîla îlmê rastî, sade ne bi depokirina agahîyan di zêhn de ye. Ji bo îlm li dinya û uqbayê feyda ji însên re temîn bike, zerûrî ye ku ew kes di netîca terbîya manewî de tezkîye bûbe, bi qelbê xwe merhele û qunağ qut kiribin û bi wijdana xwe û exlaqê xwe jî gihabe, kamil bûbe.

**Hezretê Mewlana** dibêje:

"*Gellek alim hene ku nesîbê wan di îrfanê de nîn e. Îlm ji ber kirine û daqurpandine, ew nebûye dostekî wî, yê ku Xuda jê hez dike!*."

Divê emê vê jî jibîr nekin ku hemû îlm ji hewldan û ğeyreta dabîn û tesbîtkirina wan qeyde û rêz û rêçên ku cenabê Heq di kaînatê de danîne, pêktên. Îlmê heqîqî jî, bi wan sefhan [qunağan] ve hilawistî û daleqandî namîne, gaveke din jî diavêje, wê qudreta bilind û mûhteşema ku ew qeyde û rêz û rêç danîe, nas dike, bi vî awayî ew dikare xwe biguhêze û bikeve nav sirr û hikmetên îlahî.

Çawa ku **Hezretê Mewlana** wê werçerxa xwe ya ku di zirweya îlmên zahirî de bû; lêbelê hê jî çêja manewî ya nêzîkbûna xwe ji Heq Teala tam nekiribû wiha îfade dike; “**xav bûm**”; dema ew destpê dike di keş û hewaya dil de ji sirr û hikmetên îlahî waqif dibe û rûpelên kitêba kaînatê werdigerîne, li hev diqulibîne bi “**pijîyam**” îfade dike; werçerxa xwe ya marîfetûllahê ku bi şewta sirrên îlahî dihele û digihîje evîna heqîqî jî bi “**şewitîm**” îfade kiriye.

Li rexê din, ew kesê ku dilê xwe bi endaz û pîvanên Qur’an û Sunnetê negihandibe ser îstîqametê, ji ti emelên wî yên wekî tehsîla îlm, feyda nayê. Lewra bi îfadeya **mezinê me Hezretê Elî**;

*“Siha yê xwehr jî xwehr e.”*

Hemû reftar, hal û hereketên însên xuyahîyên alema hundurîna wî ne, ew xwe li derve şanî didin. Wekî ku ji cedwel û pêkarê xwehr xîjkeke rast dernayê, ji însanekî dilê wî ne berraq jî, çavnêrîya hereketên bi fezîlet hêvîyeke beyhûde û pûç e. Ewên ku

nîyetên wan tarî bin, rêyên wan ronak nabin. Her çêr û kûz çi di navê de hebe, wê dipalîne, dirijîne. Ji dilekî şîlo, di maneya rastî de hal û hereketên temîz û berraq zihûr û xuya nabin.

Berevajî vê, safîyet, xalisîyet û sipehîtîya alema navxweyî ya evdî; dibe wesîle ku di wî bi xwe de teqdîra îlahî, lutf, rehm û bereketa wî tecellî bibin. Ev qisse, ji bo vê heqîqetê çi qeder nimûneyeke bi îbret e:

## BEXÇÊ HINARAN

**Nûşîrewan**ê ku di tarîxê de bi edaleta xwe meşhûr e, rojekê dema li malê bû, ji hevalên bi xwe re veqetiya û rêya wî çû nav bexçekekî. Wî ji ciwanekî li wir re got:

“-Ji kerema xwe hinarekê bide min?” Wî xortî jî hinar dayê.

Nûşîrewan, ji lipên hinarê pirr av derxist, têhna xwe pê şikand û ev rewş zehf li xweşîya wî çû, her wekî ku ew pê mest bû. Ew di dilê xwe de fikrî û ji xwe re got:

“-Ev bexçê ku ev fêkîyên bi lezzet di navê de hene, divê ew her ji min re be. Ez çi bikim bila bikim, her divê ez vî bexçê hinaran ji xwe re bikirrim, bistînim.”

Piştre wî hinareke din jî xwest. Lêbelê vê neqlê, hinara ku wî sitandî ziwa û tirş derketibû. Dema wî sebebê vê pirs kir, wî xortê sahib -feraset jê re got:

“-Siltanê min, ez dibê hema dilê we xwest zulmê bike. Ez dibê hema hûn hizrîn ku bi hêz û şîyana xwe vî bexçeyî ji min bistînin.”

Vêca Nûşîrewan dev ji fikra ku vî bexçeyî bi zorê bistîne, berda, ew ji nîyeta xiraba di dilê xwe de poşman bû û tobe kir. Piştre dema wî hinareke din xwest, hinareke ji ya yekê zehf têrav û şîrîntir jê re hat.

Siltan di nav sosret û bizdînê de ma, hikmeta di lezzeta vê hinarê de pirs kir. Wî xortî, vê neqlê jê re got:

“-Ez zen dikim we ji fikra menfî ya xwe tobe kir.”

Li gorî rîwayetê Nûşîrewan, di netîca vê bûyerê û hadîseyên wekî wê de bi întîbahê hat û li xwe şîyar bû. Wî nîyetên şaş ên di nava xwe de berteref kirin û xwe ji zulm û neheqîyan bi temamî xiritand. Wî êdî bi titîzî rîayeta heq-hiqûqan kir. Bi vî awayî navê wî bi edaletê baqî û nemir ma.

Nûşîrewan, heqên xwe bi zêdeyî dan û wî û temamê xelkê xwe li hev helal kirin. Dema wî wefat kir, ew di tabûta wî de li her alî û terefê memleketê wî hate gerandin. Di vê navê de delêlîyekî wiha bang dikir:

“-Heqê kî li me hebe, bila were heqê xwe bistîne!..”

Hîç ti kesekî ku dirhemekî wî jî li wî hebe peyda nebû. [60]

Naxwe ewên ku xwedî dinyaya dilekî sipehî û temîz bin, li pey xwe tim û daîm sipehîtî û bîranên xweş dihêlin. Lewra hemû hal û hereketên însanî cure eyneyeke alema navxweyî ya wî ye. Çawa ku di hedîsa şerîf de hatiye gotin:

“*Bêşiwar Xuda Teala li bedenên we û sûretên we nanêre; lêbelê li qelbên we dinêre*.”[61]

Yanî li gorî mahîyeta arzû û nîyetên di dil de, nêrîn û mûamela cenabê Heq jî li evdê wî diguhere. Ew, aqîbeta mirovê ku dinyaya dilî ya wî temîz û nîyeta wî xêr be, bi xêr dike. Teqdîra îlahî jî li gorî îstîqameta di nîyet û fikrê de, tecellî dibe.

Ev hadîse jî, mîsaleke tîpîka vê ye:

## MÛHASEBEYA WIJDANÎ YA SULTAN ALPARSLAN...

Alparslan berî 1071’ê derkeve mûhareba meydanî ya Malazgirtê, wî cilên sippî li xwe kirin û got; “*ev kefenê min e!*”. Yanî wî xwe, ne ji bo şohreta

60. Li M. Samî Remezanoğlu, Mûsahebe, VI, rûp. 43-44’an binêrin.
61. Muslim, Birr, 33; Îbnûmace, Zuhd, 9

cîhanê, lêbelê wî bi wecda îmaneke xalis xwe ji bo şehîdbûnê hazir kir. Berî ew bikevin herbê jî, wî ji leşkerên xwe re ev axaftina wecîz û kurt kir, ji wan re got:

"*Ya ezê mûzaffer bibim, bigihîjim ğaya xwe; ya jî ezê wek şehîd biçim Cennetê. Ji nav we kî bixwaze li pey min were, bila ew min taqîb bike. Ewê ku bixwazin ji min veqetin jî bila ew herin! Li vir sultanê ku ferman dike û leşkerê ku ferman lê were kirin, nîn in. Lewra ez jî îro yek ji we me. Ez ğazî me, bi we re şerr dikim. Ewên ku min taqîb bikin, nefsa xwe ji Xudayê bilind re bikin weqf û şehîd bibin, ewê bigihin Cennetê; ewê ku sağ jî bimînin, ewê bigihin ğazîtîyê. Ewên ku ji vê cîhadê veqetin jî, li axretê agir, li dinyayê jî rezîltî li benda wan e.*"

Ji bo vê îxlasa Sultan Alparslan, cenabê Heq, li hemberî artêşeke ku pênc qatan ji artêşa wî qerebaliğtir bû, li hemberî Romen Dîyojen zafer jê re kir nesîb.

Ji nav însanan bes ewên ku xwedî îxlas bin, ewê bigihîjin xilasîya rastîn. Lêbelê ewên xwedî îxlas jî tim û daîm di îmtîhaneke mezin û xeternak de ne. Çawa ku ew reşkujîya bi heyata serdarê mezinê Îslamê Alparslan bûyî mal jî di mahîyeta îmtîhaneke wiha de hatiye cih. Wiha bûye:

Sultan Alparslan, di piştî zafera Malazgirtê de, di sala 1072'yan de digel jimareke zêde ya hespsiwaran ber bi Maweraunnehrê ve derket seferê. Wî

dor li Keleha Xane ya li ser Çemê Amûderyayê girt. Serdarê Kelehê Yûsuf el-Xwarezmî bû ku ew li ser mezhebê firqeya rêşaşa Batinîtîyê bû. Dema ew têgiha ku Keleh hê bêhtir nikare li ber xwe bide, teslîmbûna xwe ragihand. Dema ev xayîn ji bo hizûra Alparslan hate derxistin, wî êrîş bire ser Sultan û ew bi xencera xwe birîndar kir. Leşkeran derhal Yûsuf el-Xwarezmî kuştin. Lêbelê Sultan Alparslan jî ji birîna ku lê ketibû xilas nebû. Ew di 25'ê Cotmeha sala 1072'yan de bi şehîdî giha Rebbê xwe. Peyvên wî yên dawîn jî bûne ev:

"*Min çi zemanî hewl dabe êrîşê bibim ser dijmin, min xwe diavêt ber penaha Ellah Teala û min arîkarî jê dixwest. Doh jî dema derdiketim ser girekî, ji ber zehfbûna leşkerên min û mezinbûna artêşa min bû ku her wekî ew çîyayê di bin pêyê min de dihejîya. Di dilê min de fikreke wiha derbas bû, min ji xwe re got; "ez hukmdarê dinyayê me, ma kî dikare li hemberî min ğalib were!"*

*Ha di netîca vê de cenabê Heq, ez bi evdekî bêçareyê xwe ceza kirim. Ez bedelê ğefleta kurtedemeke xwe didim. Ji ber vê hizra ku di qelbê min re derbas bûbû û ji ber xeta û qusûrên ku min berî wê kirine ji Ellah Teala efûyê dixwazim û tobe dikim. La îlahe îllellah, Mûhemmedu'r-Resûlûllah!..*"

Ha ji bo vê, heta tu bibêjî bes mûhîm e ku mirov dilê xwe terbîye bike, her daîm bi Xuda re bibe, hes-

tên xwe jî her wekî ku bişoyê û wan di wê safîtîyê de bigre ku Heq Teala jê razî bibe. Lewra heke hizrên nefsanî rêya xwe ji bo ketina nîyetên di dil de bibînin, cenabê Heq bi nezara rehmê li wî dilî nameyzîne.

Ğaya Tesewwufê ev e, karibe di wî dilê ku nezargeha îlahî ye de qiwamekê sabit û cihgir bike ku cenabê Heq dê jê razî bibe û bi rehm û înayeta xwe lê binêre. Ji bo vê jî divê mirov nefsanîyeta xwe berteref bike, dilê xwe ji tiştên zirardar, heta ji hizrên nelazim û malayanî jî temîz bike.

Mecelle'yek di qaîdeyê xwe de dibêje:

"*Defaa mefasida ji celba menafîa ewla ye*."

Yanî: *"berterefkirina xirabîyan ji qezenckirina tiştên bi feyde wezîfekeke li pêştir e."* Li ser vî esasî, birînek pêşî cerahet-mîkroba wê tê temîzkirin, paşê ew tê pansûman kirin. Di rewşeke berevajî de pansûman çi qeder baş dibe bila bibe, birîn baş nabe.

## TEXELLÎ, TEHELLÎ, TECELLÎ

Rêwîtîya tekamula manewî di tesewwufê de bi vî cumleyî hatiye xulasekirin:

**Texellî, Tehellî, Tecellî**

Yanî rêwîtîya manewî;

-Pêşî **texellî/texlîye**, yanî valakirina alema navxweyî ji her tiştê ku însên ji Xuda dûr dikin; paqijkirina

qelb ji cerahetên manewî yên wekî şirk, kufr, nîfaq, rîya, ğurûr/quretî, kibr, ucb û hesedê ye.

-Piştre **tehellî/tehlîye**, yanî xwe xemilandina însanî bi exlaqê xweş û emelên salihê ku evdî bi Rebbê wî didin hezkirin û mehebbeta îlahî jê re celb dikin, dikişînin. Di serê van de jî bi îlawe li ser ferzan, ew îbadetên nafîle ku têne edakirin û mezîyetên exlaqî yên wekî van; comerdî, merhemet, şefqet, xizmet, tenikîya rûhî, nezaket, zarafet û fedakarî tên.

**-**Di netîca van tevan de para xwe wergirtina ji **tecellî**yatên manewî ye. Yanî di piştî ku qelb riqqet û kûrahîyê qezenc bike, ber bi zirweya marîfetûllah û mehebbetûllahê ve mesafe girtin e.

Lewra Ellah Teala; sirr û hikmetên tecellîyatên ezamet û qudreta îlahî ya ku di Qur'ana Pîroz û kaînatê de şanî dane, bes ji bo qelbên mûseffa, yanî ji bo qelbên selîmê ku ji hêla maneyê ve paqij bûne û tekamul bûne, îhsan dike.

Ha ew dilên ku di van merhele û qunağan de derbas bûbin û gihabin sefayê, bi bereketa tewekkul û teslîmîyeta ji Heq Teala re, digihîjin tecellîyatên mûstesna û cihêwaz.

## ELLAH BES E!..

Li gorî rîwayeta **Ebûhûreyre**, mezinê me **Resûlûllah** ev qisseya kesekî ji Îsraîlîyan vegotiye:

*“Merivek ji Benû-îsraîlîyan de ji hevalê xwe hezar dînar deyn xwestibû. Wî jî, jê re gotibû:*

*-Şahidên xwe ji min re bîne, ezê di hizûra wan de bidim te, bila ew bibin şahid!*

*Ewê ku deyn xwestibû jî jê re gotibû:*

*-Wek şahid Xuda bes e!*

*Ewê ku deyn dide jî, jê re gotibû;*

*-Naxwe ji bo vê kefîl bîne!*

*Ewê ku deyn xwestibû jê re gotibû:*

*-Wek kefîl Xuda bes e!*

*Ewê ku deyn dide [îtîmad li wî kir û] jê re gotibû:*

*-Te rast got!» û ji bo wadeyeke diyarkirî pere dane wî.”*

*Ew zilam ji bo rêwengîya behrê derket û îhtiyaca xwe temîn kir. Paşê ew li gemîyekê gerîya ji bo deynê xwe di wê wadeya ku li hev kiribûn de bi şûn de bide xwediyê deyn, lêbelê wî gemî peyda nekir. Vêca wî di nav bêçaretîyê de rahişt perçekek êzing û nava wî neqirand û qul kir. Wî hezar dînar û mektûbek bi hev re xistin nav devera niqirandî. Wî têde bi xwediyê deynan re xîtab dikir û rewşa xwe jê îzah dikir. Paşê devê qula wê girt û rast kir. Paşê jî ew hate ber peravên behrê û wiha got:*

*"-Ey Xudayê min! Tu dizanî ku min ji filan kesî hezar dînar deyn sitandibû. Dema wî şahid ji min xwestibû, min jê re gotibû: "Wek şahid Xuda bes e!" Ew jî bi şahid girtina te razî bûbû. Dema wî kefîl ji min xwestibû, min jê re gotibû: "Wek kefîl Xuda bes e!" Ew jî bi kefîltîya te razî bûbû. Ez jî vêga ji bo gemîyekê bibînim ğeyret dikim lêbelê min gemî peyda nekir. "Ez wê ji te re dikim emanet!" û ew perçê êzing avêt nav behrê. Ew êzing jî di behrê de avjenî kir û çû heta ji ber çavan nependî û winda bû.*

*Ev zilam, piştre ji wir çû û bi berdewamî li gemîyekê gerîya ji bo wî ji wir bibe.*

*Di vê navberê de ew kesê ku deyn dabûyê jî, çavnêrî li rêya gemîya ku dê pereyên wî jê re bîne, dikir. Gemî nehatibû, lêbelê wî ew perçê êzingê ku pereyên wî di qula wî de bûn, dît. Wî rahişt wî perçê êzingan ji bo bibe malê û wî bişewitîne. Dema wî ew bi birrekê perçe kir, bi pere û mektûbê re rûbirû bû.*

*Piştî mideteke ew zilamê ku deyn sitandibû jî [gemîyek dît û] hate welatê xwe. [Li ser îhtîmala ku dibe xwediyê deynan hîn deynê xwe wernegirtibe derhal] rahişt hezar dînaran, hate cem xwediyê deynan û jê re got:*

*"-Ez bênavber li gemîyê gerîyam ji bo pereyên te ji te re bînim. Lêbelê min berî vê gemîya ku ez vêga pê hatime, gemîyeke din peyda nekir."*

*Deynxwaz jê pirs kir, jê re got:*

*"-Ma te tiştin ji min re şandibûn?"*

*Deyndar jê re got:*

*"-Min berê ji te re gotibû; min gemî peyda nekir."*

*Deynxwaz jê re got:*

*"Hezretê Ellah Teala ji ber te ve di qula perçekekî êzing de pere ji min re şandine [yanî li hemberî îxlasa te cenabê Heq Teala wek kefîlê te pere gihandine min. Naxwe ev hezar dînarên ku te vêga anîne ji te re man. Bi vê wesîlê di nav hizûr û aramîyê de] tu gihayî pereyên xwe û vegere here."*[62]

Ha tecellîyatên îlahî ji bo wî yê xwedî îtîqadeke sağlem û temîz û xwedî dilekî gihabe sefayê, dibin nesîb!..

Halê wan kesên ku bi maneya rastîn bi terbîya tesewwufî gihabin kemalê dişibihe halê kesê di vê hedîsa şerîf de. Ji bo ew tim û daîm bi qelbê xwe bi Xuda re dibin û bi wan emelên ku ji bo riza'ya Xuda dibin wesîle mijûl dibin, cenabê Heq Teala jî ji bo hinek karên wan dibe kefîl. Ew ji bo nîyet û ğeyretên xalîsane yên wan fewqelade bereketan îhsan dike.

Li rexê din, ew zatê ehlê tewekkulê yê di hedîsa şerîf de, xwe avêtiye ber penaha Xuda û deynê xwe

62. Buxarî, Kefalet, 1; Buyû', 10

bi perçê êzing avêtiye behrê, wekî ku wî bi mûcibê sewîya qelbî ya xwe emel kiriye, wî, bicihanîna mûcibê rîayeta esasên şer'î jî îhmal nekiriye.

Lewra şerîet, daîmî wek pêyê sabitê pergarê mecbûr e di bingeha fiêl û kirinan de be. Ew hal û hereketên qunağ û merheleyên terîqet, heqîqet û marîfetê, bes ku li ser bingeha şerîetê bin, nirxekî îfade dikin. Mezintirîn elametê ehlê tesewwufê yê rastî, ew gihabin kîjan merteba manewî bila gihabinê, tim û daîm di halê bi titîzî rîayetkirina esasên şer'î de ne. Çawa ku ew zatê arif dema gemî peyda kir, derhal -ji bo fermana şerîetê bîne cih- hezar dînarên din peyda kirine û ji xwedî-deynê xwe re anîne.

## MÛRŞIDÊN KAMIL...

Cenabê Heq, modela însanê kamil bi awayê mûkemmeltirîn di şexsê **Mezinê me Pêğember** de ji bo însanîyetê şanî daye. Naxwe mezintirîn rêzanê me, nimûneya me û mûrşidê me; bêşiwar **Mezinê me Resûlê Xuda** ye.

Digel vê jî yek ji hersê wezîfeyên mezinê me **Pêğember** ku ayetan dixwîne û helal û heraman **teblîğ dike**, ji **terefê aliman** ve; tezkîya nefsan û tesfîya qelban e. **Wezîfa îrşadê** jî ji terefê **mûrşidên kamil** ve heta bi roja me her hatiye îfakirin û bicihanîn.

Mûfessir **Bûrsawî** di bara ayeta; “**li wesîleyên nêzîkbûna ji Xuda bigerin...**”[63] de dibêje:

“*Ev ayet, bi awayekî eşkere dibêje; li wesîlê bigerin. Ev mûtleq lazim e. Wusleta ji bo Xuda bes bi vê tê cih. Ji wesîlê meqsed, alimên heqîqetê û mûrşidên kamil in*.”[64]

Alimekî ku ders dide telebên xwe, ew ji bo gihan û kamilbûna telebê xwe wesîleyek e. Mûrşidên kamil jî di rêyên manewîyatê de wezîfa rêberîyeke wekî rêberîya aliman ya di îlmên zahirî de, îfa dikin, bicih tînin.

Li ser vî esasî, ewên ku di xusûsa fiqhî de nuqsanî û kêmasîya wan hebe, bila di rehle’ya tedrîsata alimekî salih re derbas bibin û zahirê xwe sererast bikin, biedilînin. Ewên ku di bara heqîqetên tesewwufî de jî nuqsanî û kêmasîya wan hebe ku em dişên jê re “**fiqha batin**” jî bibêjin, bila ji zatên arif, ên ehlê teqwayê, yanî bila ji sohbet û nesîhetên mûrşidan tefeyyuz bikin û alema qelbî ya xwe tenzîm bikin. Bila kêmasîya xwe di xusûsên qelbî yên wekî îxlas, teqwa, xuşû û îhsanê de telafî bikin û xwe ji hêla maneyî ve kamil bikin, bigihînin.

Mezintirîn îhtiyaca însanî ev e ku karibe ji îmtîhanên dinyayî bi selametî derbas bibe, bigihîje

63. Maide: 35
64. Bûrsewî, Rûhu’l-Beyan, IV, rûp. 543

Heq Teala. Dostên Heq Teala jî di vê xusûsê de însanan îrşad dikin û di qutkirina merheleyên maneyî de ji wan re dibin arîkar. Ew ji cumle û tevahîya bi qîmettirîn wesîleyan e ku Xuda ew ji bo mirovan lutf kirine. Lewra di eynî wextî de mûnasebetên wan hem bi xelkê re, hem jî bi Heq Teala re hene. Bi vê sebebê, ew xizmeta pirekê dibînin ku di ser xwe re xelkê digihînin Heq Teala.

Dema ji xwacê me yê Farisî **Yaman Dede** ku pêşî ew krîstiyan bû, bi wesîleya **Hezretê Mewlana** û *Mesnewî*'yê gihabûye hîdayetê, dihate pirsîn:

"-Hûn, çima ev qeder behsa *Mewlana* û *Mesnewî*yê dikin?"

Wî digot:

"-Ewladê min, Mewlana bi destê min girt. Wî ez berim ber derîyê Hezretê Pêğember û ji bo hîdayeta min bû wesîle. Ev qeder bibîranîna min ji bo yekî ku ez ji êgir xilas kirime hê hindik e jî!"

Ha mûrşidên kamil ên rastî jî warisê Pêğember in û şexsîyetên nimûneyî ne. Ew zirweya mûkemmelîyeta îrşad, reftar û bizavên Nebewî ne ku ji bo zemanan hatine belav û tewzî-kirin. Ew ji bo kesên ku ji şerefa dîtina Hezretê Pêğember û eshabê wî mehrûm, "**modelên însanê kamil**" in ku divê wan ji bo xwe bikin nimûne. Îrşad û şîretên wan jî ku bi lîsanê rehmê yê wan dilan îhya û sağ dikin, di esasê xwe de şevnem û

xwîsîtîyên rûhanîyetê ne, ku ji kehnîya nebewî dizenzilin, dipalin û tên.

Xizmeta ku mûrşidên kamil pê radibin û wê dikin; ji wê hewldan û ğeyreta edakirin û bicihanîna wezîfa pêğemberan a tezkîyê û dane dewamkirina wê, pêktê. Ji vê cîhetê ve jî tesewwuf; di destê mûrebbî yên ku bera bûne warisê Mezinê me Pêğember de mektebeke manewî ye, têde nefs tê tezkîyekirin û qelb tê tesfîye kirin. “**Seyr û silûk**” jî ji wê hewldan û ğeyretê pêktê ku însan here mekteba terbîya manewî û di rêya bûna însanê kamil de mesafe bistîne.

## HESSASÎYETA RÎAYETA SUNNETÊ

Mûhîmtirîn taybetmendîya mûrşidên heqîqî û elameta farîqeya wan; îtaet û pêbendbûna mûstesna’ya wan ji bo Resûlê Xuda ye. Bariztirîn wesfê wan jî bi titîzî rîayetkirina wan ji bo Qur’ana Kerîm û Sunnetên mezinê me Resûlûllah e ku ew jî tefsîra fiêlî ye ji bo Qur’anê. Ew hezkirîyên xwe jî bi eynî titîzî û hessasîyetê digihînin, perwerde dikin.

Naxwe mirovekî rîayeta Sunnetê nake, yan di vê xusûsê de qusûr, îhmal û tawîzên wî hebin, ne mûmkin e ku ew bibe mûrşidekî kamil.

Ev hadîse, vê xusûsê çi xweş îzah dike:

**Bayezîdê Bistamî** ku yek ji mûrşidê kamil ên mezin e, ji bo dîtina mirovekî ku di navbera însanan

de bi welîtîya xwe meşhûr bûbû, bi mirîdên xwe re derketibû rê. Ew zatê ku diçûne zîyareta wî jî ji mala xwe derket, dema diçû mizgeftê bi rexê qiblê ve tif kir. Bayezîd heta tu bibêjî bes, ji vî halê xav û laqeydê wî zatî mehzûn bû, hê silav jî nedayîyê derhal bi şûn de vegerîya. Ji telebên xwe re jî wiha got:

"*-Ev zat, di xusûsa rîayetkirina edebeke ku mezinê me Resûlûllah daye hînkirin de jî ne pêbawer e! Vêca mirov wê çawa di bara esrarê Cenabê Heq de pê bawer bibe?!*" [65]

Eshabê kîram jî di xusûsên dînî de bi van cure hessasîyetên xwe ji bo nesl û nifşên ku piştî wan tên, bûne nimûne. Çawa ku eshabê kîram ji bo hedîseke ku dizanîbûn bidin te'yîdkirin, bi rêya qunağa heyvekê dûr ve diçûn, digel ku gellek meşeqqet dikişandin jî ew rawî'yê ku wê serî lê dabana, ji ber ku didîtin wa ye ew hespê xwe bi ciherekî vala yê êm dixapîne û wî ji bo cem xwe bang dike, ew bi malûlê zeîftîya karekterî qebûl kirine û nekarîne wî mirovekî ehl û layiqê ku hedîs jê were wergirtin, bijimêrin..

**Ebû'l-Alîye** jî ku yek ji îmamên mezin ê nesla tabîîna ye, wî misaleke din ji bo vê hessasîyeta Îslamî wiha vegotiye:

"Dema em diçûn cem kesekî ji bo hedîsê jê wergirin, pêşî me li awayê nimêjkirina wî dimeyzand, me

65. Qûşeyrî, Rîsale, rûp. 57, 416-417.

digot; heke ew nimêja xwe rind eda bike; ‘‘ew, karên dîtir ên xwe jî rind dike.’’ û em li cem dirûniştin. Me digot; heke ew nimêja xwe xirab eda bike; ‘‘ew karên dîtir ên xwe jî xirab dike.’’ û em ji cem radibûn.’’[66]

Ha ew kesên ku di xusûsên dînî û manewî de îtîmad li wan were kirin, divê mirov di wan de li hessasîyeta îttîba Qur’an û Sunnetê bigere. Lewra mezintirîn kehnîya feyza dilî, bi titîzî pêbendbûna bi Qur’an û Sunnetê ya di her sefha heyatê de ye.

Ev tesbîta **Hezretê Îmamê Rebbanî** jî çi qeder manedar e:

“*Carekê ez ketim ğefletê û bi lingê rastê xwe çûme qedengehê. [Bi sebeb vê bizava mûxalifa Sunnetê ya xwe] ew roj ez ji gellek halên manewî mehrûm bûm*.” [67]

Dîsa Îmamê Rebbanî rojekê ji telebekekî xwe re gotibû:

“-Çend qerenfîlan ji nav bexçê me bîne!” Ew jî çû şeş qerenfîl anîn. Dema Hezret ev dît, bi vegotineke ğemgîn jê re wiha got:

“-Hê jî telebê me li hedîsa şerîfa ku mezinê me Pêğember dibêje: “*Xuda tek e, ji tekî hez dike!*”[68] miqate nabin. Haleveku miqatebûna li vê mûsteheb e.

66. Darimî, Mûqeddîme, 38/429
67. Kişmî, Berekat, rûp. 197.
68. Buxarî, Deawat, 68

Ma însan mûstehebê çi zen dikin? Mûsteheb ew tişt e ku cenabê Heq jê hez dike. Heke di hemberî emelekî ku Ellah Teala jê hez dike de hemû dinya û axret were dayîn, naxwe dîsa hîç tiştek nehatiye dayîn." [69]

**Hezretê Saîd bin Mûseyyeb** ê ku yek alimên mezin ê nesla tabîîna ye, wî merivek dît ku di piştî esrê de wek nafîle du reket nimêj kirin. [Kirina vî zatê ku di wextê kerahetê de nimêja nafîle kiribû li xweşîya wî neçû.]

Wî merivî ku nimêj-kirî jê re got:

"-Ya Ebû Mûhemmed! Ma ji bo ku min nimêj kir, Xuda Teala wê min bixe ezabê?!" Bi vî awayî xwest berevanîyê ji kirina xwe bike.

Hezretê Saîd bin Mûseyyeb jî jê re got:

"-Na! Cenabê Heq ji bo te nimêj kiriye te naxe ezabê, lêbelê ji bo ku te mûxalefeta Sunneta Senîyye kiriye, wê te bixe ezabê!"[70]

**Hezretê Bayezîdê Bistamî** jî hemû halê xwe bi Sunneta Senîyya mezinê me Resûlûllah mîzan dikir, diwezinand. Mezinê me, ji bo wî tam qistas û endazeke fiêlî bû. Nesîheteke mûhîma wî jî wiha ye:

69. Kişmî, Berekat, rûp. 198; Ebû'l-Hesen en-Nedwî, Îmam-ê Rebbanî, rûp. 180-181.
70. Darimî, Mûqeddîme, 39/442

"*Kî xwestina îlmê û xwendina Qur'ane û heyata zuhdê terk bike, li ser çûna cemaetê dewam neke, di [defînkirina] cenazeyan de beşdar nebe, neçe serdana nexweşan û îddîa bike ku ew sofî ye, ew sade bid'etçî ye*." [71]

Yanî naxwe ne ku mûrşidek, lêbelê heke mirîdekî normal jî ji van cure sunnetan, yanî ji wacîbatên evdînîyê yên ferdî û îctîmaî dûr bimîne, ti elaqeya jîyîna wî jî bi tesewwufê re nîn e.

Nimêja **Teheccud**ê û îhyakirina wextên şevê jî sunneteke mûhîm e. **Mezinê me Resûlûllah** di sefer û rêwîtîyên dûr û bi meşeqqet de jî nimêja teheccudê terk nekiriye. Li ser vî esasî, mirov nikare hizr pê bike ku ehlê tesewwufê li hemberî teheccud û seheran bêgane bimîne.

Çawa ku **Bayezîdê Bistamî** gotiye:

"*Heta min şev nekirbane wek rojê hîç ti sirrek ji min re nehatiye vekirin*."

Dîsa ev peyvên **Bayezîdê Bistamî** di bara hessasîyeta rîayeta Sunneta Senîyye de çi pîvaneke sipehî dide:

"*Ez hizirîm ku Ellah Teala min ji îhtiyacên xwarin-vexwarin û zewcê [jinê] xilas bike, paşê min ji xwe bi xwe re got:*

71. Beyheqî, Şûeb, III, 305; Îbnû'l-Cewzî, Telbîsu îblîs, rûp. 151.

*"-Ji bo min daxwazkirineke wiha ji Ellah Teala wê çawa caiz bibe?! Resûlûllah tişteke wiha daxwaz nekiriye!" û ez ji vê hizra xwe vegerîyam*. " [72]

Naxwe îcab dike ku mirov li dûv wan kesan neçe ku di bin navê **zuhd** û **teqwa**'yê de di reftar, hal û bizavên xwe de sunneta Resûlê Xuda taqîb nakin. Lewra ev cure zewat, bi heyata xwe ya riyazet û mûcaheda ku têde zêdegavîyê dikin ew hewl didin xwe bixin mewqîyekî -haşa- ji Resûlê Xuda dîndartir û zahidtir ku ev jî cur'eteke mezin, ğeflet û rêşaşî ye.

Çawa ku di ayeta pîroz de jî di xusûsa şîyarkirina ji van cure tixûb-nenasî û bêedebîyan de wiha tê gotin:

"***Gelî yên ku îman anîne! Nekevin pêşîya Xuda û Resûlê wî. Ji Xuda bitirsin!..***"[73]

Çawa ku mezinê me **Resûlûllah** jî sihabîyekî xwe yê ku ecele kiribû û berî wextê wê qurban serjê kiribû, şîyar kiribû û ferman li wî kiribû ku ew piştî nimêja îdê dîsa qurbanekê serjê bike. [74]

Bila em ji bîra nakin ku ji cenabê Heq Teala nêzîktirîn evd, mezinê me Pêğember e, wî di her xusûsê de îtîdal wesîyet kiriye û ew bi xwe jî ji bo vê bûye nimûneyeke zindî.

72. Qûşeyrî, Rîsale, rûp. 57; Mûnawî, Feyzu'l-Qedîr, VI, 108.
73. Hucûrat, 49/1
74. Li Îbnûmace, Edahî, 12/3151-3154; Ebûdawid, Dehaya, 5'an binêrin.

Ev hadîse, vê xusûsê çi xweşî îzah dike:

**Mezinê me Resûlûllah** rojekê ji eshabê kîram re behsa qiyametê kiribû. Ew jî zehf hestgerm bûbûn û girîn. Piştre deh kes ji wan li mala **Osman bin Mez'ûn** kom bûn. Wan di netîca îstîşara ku kirin de ev qerar dan; ji niha û pê de emê daw-delingên xwe ji dinyayê bikişînin. Emê xwe bidin xesandin. Emê bi roj, rojî bigrin, bi şev jî heta sibehê îbadetê bikin. Emê goşt nexwin. Emê têkilîya xwe bi xanimên xwe re kêm bikin. Emê bêhna xweş li xwe nedin û emê li sererdê negerin [keyfê nekin].

Dema mezinê me Resûlûllah ji vê qerara wan xeberdar bû, pêşî ew şîyar kirin, piştre jî eshabê kîram kom kirin û ev axaftin ji wan re kir:

"*Çi li hinek mirovan qewimiye ku pevrebûna bi xanimên xwe re, xwarin-vexwarinê, lixwe-kirina bêhna xweş, razanê û zewqên rewa yên dinyayê li xwe heram dikin?! Bêşiwar ez, ji we re nabêjin; bibin keşe, yan jî bibin rahib. Di dînê min de çawa terka xwarina goşt û xwe dûrkirina ji jinan nîn e, eynî wilo daw-deling ji dinyayê kişandin û xwe di dêran de girtin jî nîn e.*[75] *Seyaheta ummeta min rojî û rahibtîya [teqwadarîya] wan jî cîhad e.*

75. Tişta ku Tesewwif telqîn dike dide hînkirin jî ev e. Yanî mirov karibe di kesretê de jî wehdetê bijî û din av qerebaliğan de jî bi qelbê xwe bi Cenabê Heq re bibe.

*Îbadetê ji Xuda re bikin, hîç tiştekî ji wî re nekin şirîk, herin hec û umrê eda bikin, nimêjên xwe eda bikin, zekata xwe bidin û rojîya Remezanê bigrin. Hûn xwe rast û durust bikin da ku dîger jî wisan bibin. Ummetên berî we ji ber zêdegavîyên xwe çûne helakê. Wan dîn ji xwe re zor kirin, Xuda jî ew li wan zor kir. Îro ewên ku li dêran û keşîşxaneyan hene, beremayeyên wan e.*"

Li ser vê, ev ayeta ha nazil bû:

"**Gelî yên ku îman anîne! Tiştên xweş û pak ên ku Xuda ji we re helal kirine, hûn li xwe heram nekin û ji tixûbî nebûrin. Lewra Xuda ji tixûbbuhêran hez nake**."[76]

Naxwe ew pîvanên ku Resûlê Xuda di bara heyata beşerî de danîne di wî terzê heyatê yê ku li derveyê wan mabin de ti xêr nîn e. Bi berevajî ev, însên ber bi hinek zeîftîyên rûhî ve diajon; her wekî ne-aramî, bêhizûrî, stres, bêhevkêşî, qehronekî, yan jî ketina rêyên ğeyrê meşrû û nerewa..

Ji vî cîhetî ve, bi awayekî ji bo Sunnetê guncaw be pêşwazîkirina li îhtiyacên beşerî di daîreya helal de, rasttirîn rê ye. Bi hinek hêncetên ku ji sûretê heq xuya dibin, her wekî xizmeta ji dîn re, yan jî hê bêhtir nêzîkbûna ji Heq Teala li xwe heramkirina hinek

76. [Maîde, 5/87] (Li Wahidî, rûp. 207-208; Elî el-Qarî, el-Mîrqat, I, 182-183)

tiştên helal, mirov nikare bi ti şekl û awayan, vê wek lazimîya dîndarîyê bibîne.

Naxwe mûmîn, divê berî her tiştî ji bîr neke ku mezintirîn rêberê wî **Resûlê Xuda** ye. Divê hewl bide ku wî ji nêzîktir ve nas bike. Divê her halê xwe bi halê wî biwezinîne. Piştî ew vê bike jî, wê ğayet jê re hêsan be; ka kîjan însan di rêya Resûlê Xuda de ye, kîjan ne di rêya wî de ye, divê ew li dûv kî biçe, yan jî ew li dûv kî neçe.

Mûfessir **Bûrsewî** di vê xusûsê de wiha dibêje:

*"Heke tu bibî tabiê yekî, bibe tabiê mezinê pêğemberan Mûhemmed! Ewê ku Adem û hemû pêğember û welîyên ku piştî wî hatine di bin alaya wî de ne.*

*Heke tu bixwazî bibî tabiê yekî ji ummeta wî, sirf ji ber ku ew di nav xelkê de meşhûr e, yan jî ew li cem rêvebir û siltanan meqbûl e, nebe tabiê wî! Berevajî vê, ya ji te re lazim, pêşî naskirina Heq e, piştre dan çêjandin û tamkirina wî bi însana ye. Di vê mijarê de derîyê îlmên Rebbanî **Hezretê Elî** wiha dibêje:*

*"Ewê ku bi wasîteya însanan [ğafilan] Heq nas kiribe; di gera rêşaşîyê de digevize û wilo radiweste. Ji bo vê, pêşî [ji Qur'an û Sunnetê] Heq nas bike, bi vî awayî ji xwe tu yê ehlê Heqîyê nas bikî."* [77]

77. Rûhu'l-Beyan, VI, rûp. 370-371, Weşanên Erqam.

Ji vî cîhetî ve, ew kesên ku di jîyîna wan bi xwe de hessasîyeta rîayetkirina Qur'an û Sunnetê nebe -çendan ew di navbera xelkê de wek mûrşid meşhûr bûbin jî- dîsa divê mirov îtîbarê nede wan. Heke ji wan halên wekî keşf, keramet, fezîlet û yên wekî van sadir bibin jî, divê mirov bi îhtiyat ji van nêzîk bibe. Lewra ev, bi pirranî ne keramet û fezîlet in, lêbelê hîle û xefka şeytên, îstidrac in.

**Hezretê Ebdûlxaliq Ğucduwanî** jî îfade kiriye, gotiye: "Bes ew kesê ku bi destekî xwe raje Qur'ana Kerîm û bi destê din jî raje hedîsa şerîf û bi nûra wan di rêya ronahîyê de bimeşe, dikare bigihîje merteba "fena'ya nefs"ê.

Ji bilî vê jî, wî ev nesîhet li mirîdekî xwe kiriye:

*"Hîç ti zemanekî ji hînbûna îlmê dûr nebe! Îlmê fiqh û hedîsê hîn bibe! **Xwe ji sofîyên cahil dûr bike** ku ew, zeîftîyê digihînin rêya dîn... Xwe bi Sunneta Şerîf asê bigre û di rêya îmamê selefê salihîn de here!.."*

## DIQQET BIKE KA TU, DÎNÊ XWE JI KÊ HÎN DIBÎ!

**Mezinê** me **Resûlûllah** ji **Ebdûllah bin Ûmer** re wiha gotiye:

"*Ey Kurê Ûmer! Xwe baş bi dînê xwe bigre, xwe baş bi dînê xwe bigre! Lewra ew, hem goştê te ye,*

*hem jî xwîna te ye.* ***Baş diqqet bike ka tu, dînê xwe ji kê hîn dibî!*** *Îlmên dînî û hukmên wî ji alimên ehlê îstîqametê bigre, ji yên ku bi rexên rast û çepê ve meyl didin, negire!*" [78]

Naxwe mûmîn, divê pêşî mahîyeta heq û heqîqetê ji Qur'an û Sunnetê hîn bibe. Piştre jî divê ew wî kesê ku dikare li gorî qistasên Qur'an û Sunnetê ji xwe re bike rêber, dîyar bike û dîsa divê ew ğeyret bike, hewl bide di îstîqameta Qur'an û Sunnetê de bipêşve here. Lewra ewê ku bi rastî, ne tabiê Qur'an û Sunnetê be, mûrşidekî kamilê heqîqî jî nikare ti feydekekê bide wî.

**Hezretê Mewlana** çi xweş dibêje:

"*Qur'ana Kerîm, hal û wesfên pêğemberan e. Heke tu wê tetbîq bikî, ferz bike ku te bi pêğemberan re, bi welîyan re hevdîtin kiriye! Heke digel ku tu Qur'anê dixwînî jî, tu bi xebera fermanên wê nekî û tu exlaqê Qur'anê nejîyî, wê hevdîtina pêğemberan û welîyan çi feydê bide te?..*"

**Cenabê Heq, jîyîna emr/temenekî di îstîqameta Qur'an û Sunnetê de, birêveçûna di rêya hezkirîyên xwe de û heşrbûna bi evdê salihên xwe re ji bo me tevan lutf bike.**

**Amîn!..**

78. Xetîb el-Beğdadî, el-Kîfaye Fî Îlmi'r-Rîwaye, el-Medînetu'l-Munewwere, el-Mektebetu'l-Îlmîyye, rûp. 121.

# DI MEHEBBETÊ DE ÇARÇEVEYA MEŞRÛÎYETÊ

Merivekî ji **Yaqûb** pirs kir, jê re got:

"-Ey Pêğemberê eqlmend ê qelbê wî mûnewwer! Te bêhna gomlekê Yûsuf, ê ku ji Misrê dihat, kir; lêbelê te, çima dema li ber serê te di bîrê de dihat avêtin, ew nedît?"

Yaqûb ev bersiv dayê:

"-Ew nesîbên îlahî yên ku em gihane wan, wekî birûskên lêxer in. Ji ber vê, heqîqet carina ji me re eyan dibin, carina jî ji ber me têne sergirtin!"

Yanî heke Cenabê Heq perdê veke bende, yên din jî dibîne; feqet heke ew serbigre jî însan dibe ku koncala li ber xwe jî nabîne. Yanî bende, di kîjan meqamê manewî de dibe bila bibe, bêçare ye. Daîm îhtiyaca wî bi lutfa Cenabê Heq heye.

# DI MEHEBBETÊ DE ÇARÇEVEYA MEŞRÛÎYETÊ

Di tesewwufê de **mehebbet**, sermayê eslî yê pêşveçûna manewî ye, tezahur û xuyabûna wê jî **rîayeta edeba** ye. Îrtîbata qelbî bi mûrşidên kamil re, yanî **sermayê eslî yê rabîta'yê mehebbet** e. Feqet wekî ku di her xusûsê de wisa ye, di mehebbetê de jî zêdeçûn, însên dixe ser rêyên şaş.

Bi vê sebebê, di rabîta'yê de ya şaş ev e; mehebbeta ku ji însanan re were şanîdan, mirov ew qas têde zêdegavîyê bike her wekî ku wê bigihîne dereca mehebbeta îlahî. Ji cîhetê maneyî ve, ew zatê ku mirov wî ji xwe re dike rêber, her wekî ku mirov ulûhîyetê jê re îzafe bike, ew qeder wî zêde bilind bike, mirov ji heddê zêdetir hurmet jê re bigre û jê re hest bi bendbûneke mûteessibane bike, ev kişkişîna ji bo reftar, hal û bizaveke wisan çewt e ku Qur'an û Sunnet wê teswîb nakin, rast nadêrin.. Xuda hafiz, ev

hal di şûna ku feydê bide mirovî de zirarê dide mirovî, heta mirovî ji rêya rast derdixe û dixe rêya nerast.

Îcab dike mirov ti zemanî vê ji bîr neke ku mûrşid, ji bo mirîdî sade rêzan e, jê re rê şanî dide, yanî ew “**wasîte**” ye. Di mehebbeta wasîteyî de zêdeçûn û ew xistina bi “**ğaye**”, ji bo şirkê li derî xistin e, li derî gerîn e. Eqîda tewhîdê jî bi ti awayekî nikare hevpişkî, şirkê, anku şirîkatîyê tehemmul bike.

Mesela dema em li firokekê siwar dibin, firok wasîte ye. Ğaya me, bi wasîteya wê firokê gihiştina emancê ye. Piştî mirov wasîtê, wasîte zanibe, têde ti mehzûr nîn e ku mirov jê îstîfade bike û pê bigihîje ğaya xwe. ji bo gihiştina wê riza’ya îlahî ku hedefa me ye, gerîn û serîlêdana li hinek wesîleyan ti zirara wê nîn e. Heta Rebbê me bi xwe jî bi gerîna li wesîleyan ferman dike û dibêje:

“**Gelî yên ku îman anîne! Ji Xuda bitirsin û li navgîna ku we ji wî nêzîk dike, bigerin**.”[79]

Ya mehzûr ev e; mirov di hezkirina wesîle û wasîteyan de ji pîvanê bibûre û wan ji bo xwe bixe ğaye.

Ewên ku ji bo van zêdegavîyan hatibin kişkişandin, hem ji bo dijberên tesewwefê bûne sermaye, hem jî wan zirar daye îstîqameta rêya manewî

79. Maîde, 5/35

ya ku ew bi xwe terefgir û mensûbê wê ne. Ev jî guneh û webalekî mezin e.

Di vê xusûsê de divê ev halê **Hezretê Ebûbekr**ê ku ji nav sehabîyan tevan bêhtir ji Resûlê Xuda hez dikir; lêbelê ev mehebbeta xwe daîmî ji bo îtîdal, teennî û îstîqametê xistibû wesîle, ji bo hemû ehlê tesewwufê nimûnê pêkbîne:

Wefata mezinê me Resûlûllah ji eshabê kîram re zehf giran hatibû. Herkes di şaşomaş-bûnê de bûn, heta ketibûne dehşetê. Lewra wan êdî ew rûyê dêmgul ê Resûlê Xuda yê ku ji canê xwe bêhtir jê hez dikir, nedîta û êdî wê hedana wan bi hebûna wî nehata. Di van sehabîyan de zatên wisan hebûn ku ew çavên pê Resûlûllah nedidîtin, ew guhên ku pê ew nedibihîstin û ew heyata ku ew têde nedijîya, nedixwestin.

Eshabê kîram di mescidê de dest bi girî kirin. Dema dilên wan bi vê êş û elema bêtarîf dihejîya, heta şexsîyetekî bi dîrayet ê wekî Hezretê Ûmer jî rabû ser xwe û got:

"*Bila ez nebihîzim ku ti kesek dibêje "Mûhemmed mir!" Heke na, ezê bi şûrê xwe li stûyê wî bixim! Resûlûllah jî wekî ku Mûsa ji xwe çûbû wisan ji xwe çûye!...*" Bi vî awayî wî ew axaftina xwe ya ku destpê kiribû, berdewam kir; ew, wisan axivî, wisan axivî heta ku kef bi devê wî ket.

Dema **Hezretê Ebûbekr** ew xebera tehl bihîst, derhal li hespê xwe siwar bû û hate Medînê. Rûyê mezinê me Pêğember vekir. Paşê xwe bi ser de kir, li serê girî, enîya wî maç kir û got:

*Wellahî, Resûlûllah wefat kiriye!*

*«... **Em yên Xuda ne!** [Em evdên Xuda ne!] **Û em dîsa li wî vedigerin!**»* [Beqere, 2/156]

*Bavê min, dêya min ji te re feda bin! Ez bi Xuda sûnd dixwim ku Xuda wê ti zemanekî du caran êşa mirinê bi te nede tamkirin! Te, carekê wefat kir û tu ji rêbiwara mirina mûqedder derbas bûyî! Piştî vê careke din mirin ji te re nîn e!..*

*... Tu di sağîya xwe de jî sipehî bûyî, tu di piştî wefata xwe de jî sipehî yî!..”* Piştî rûyê Resûlê Xuda girt, derket derve.

**Hezretê Ûmer** jî hê ew axaftina xwe ya ku digot; Pêğemberê me wefat nekiriye, dewam dikir. Hezretê Ebûbekr jê re got:

*“-Ey Ûmer, êdî rûne!”*

Hezretê Ûmer bi ber rûniştinê ve nehat. Hezretê Ebûbekr ev peyva xwe jê re ducarî, sêcarî kir û di zemanê hessas de, bi metaneteke mezin ev axaftina xwe ya ku hedana xelkê dianî û ew teskîn dikirin, kir, ji wan re wiha got:

“*Ellah Teala, hê dema ew li navbera we bû, xebera wefatê dabû pêğemberê xwe. Xeber dabûyê ku hûn jî [dema ecelê we were] hûnê bimirin. Resûlûllah wefat kiriye! Ti kes ji we jî wê sağ nemîne. Kî Mûhemmed diperêse, bila zanibe ku Mûhemmed wefat kiriye! Kî jî îbadet ji Xuda re dike, hîç şubhe nîn e ku Xuda heyy' e, namire!*

*Ellah Teala gotiye:*

*“ **Muhemmed, bes pêğember e! Bi rastî beriya wî jî pêğember hatine û çûne. Ma vêga heke ew bimre, yan jî ew were kuştin, hûnê bi ser pehniya xwe ve vegerin** [dînê xwe yê berê, kufrê]**? Kî, bi ser pehniya xwe ve wiha vegere, ewê bi ti awayî nikaribe ti ziyanê bide Xuda. Xuda, her dê spasdaran xelat bike**.”*[80]

Dema însanan ev ayet bihîst, êdî baş qenaet pê anîn ku Resûlûllah wefat kiriye. Ew, ew qeder ketibûn heyret û dehşetê ku heta Ebûbekr ew ayet nexwend, her wekî ku nizanîbûn ev ayet nazil bûye, hatiye xwarê.

**Hezretê Ûmer** dibêje:

“*Wellahî ez bûm ku heta wê rojê wekî ku min ev ayet hîç nebihîstibû! Dema min ew ji Ebûbekr bihîst, ez ketim dehşetê. Bû ku lingên min ez nedigirtim.*

80. Alî Îmran, 3/144

*Benê çokên min qetîyan û ez ji cihê xwe bi ser erdê de ketim.*" [81]

Wekî ku hate dîtin, Ji herkesî bêhtir yê ku ji Mezinê me hez dikir û yê ku hurmet û tazîm jê re nîşan dida Ebûbekr bû, ev mehebbeta bêhemta ya wî, hîç ti zemanekî ji bo şaşbûnê nebûye sersebeb û ew nexistiye helwest û tewreke ku ji heqîqetên şer'î re bibe dijber.. Berevajî vê, ew mehebbet jê re bûbû pîvana îstîqameteke wisan sağlem ku wî ew mirovên ketibûne şaşîyan jî îqaz û îrşad dikirin.

## ÎFRAT Û TEESSUB

Ev cure peyvên ku hinek mirîdên bi cezbê-ketî di heyecana xwe şaşkirinê de dibêjin;

*"Heke şêxê min tiştekî bixwaze Xuda jî hemin wî dide...*" mîsaleke bariz e ku mehebbet, hurmet û pêbendbûn ji heddê layiqê xwe derketiye û gihaye dereca îfrat û teessubê.

Lewra mezinê me Pêğember digel ku hebîbê Xuda bû jî, Xuda dûayên wî jî tev qebûl nekirine. Çawa ku Mezinê me di hedîseke şerîf de wiha gotiye:

"*Min sê tişt ji Rebbê xwe teleb kirin. Wî du ji wan dan û yek jî bi şûn de vegerand: Min ji Rebbê xwe xwest ku ew ummeta min bi ğelayeke umûmî nebe*

81. Îbnû Se'd, II, 266-272; Buxarî, Meğazî, 83; Heysemî, IX, 32; Ebdûrrezzaq, V, 436.

*helakê, wî ev da min. Min jê xwest ku ew ummeta min bi awayê xeniqandina di avê de nebe helakê, wî ev jî da min. Min jê xwestibû ku ummeta min di navbera xwe bi hev re herbê nekin, ev jî bi şûn de hate vegerandin*."[82]

Naxwe Rebbê me, dûayên pêğemberan jî heke bixwaze qebûl dike, heke bixwaze jî qebûl nake. Ji vî cîhetî ve bende, di kîjan meqamê manewî û mertebê de dibe bila bibe, wekî emelên wan, îhtiyaca dûayên wan jî bi qebûl-kirina Xuda heye.

Ev pîvan, piştî ku ji bo pêğemberan jî wiha be, îcab dike em baş fehm bikin ka ew di çi derece û astê de ji bo mirovên li derveyê pêğemberan şamil tê û wan jî dide ber xwe, çendan ew ewlîyaullah ên mezin bin jî.

Ji vê awirê ve, mirov nikare bibêje; dema evdekî hezkirî yê Xuda dûa bike hemin ewê qebûl bibe, yan jî dema ew li ser nexweşekî bixwîne bêşiwar ewê şîfa bibe. Lewra ew xusûsên wiha, divê herdu alî bi îxlas bin û li kêleka îxlasa herduyan jî divê ew ji bo teqdîr û mirada Xuda jî guncaw û mûnasib bikeve da ku ew netîca jê tê arzû-kirin, hasil bibe. Ji bilî vê jî divê ji eqlê me derneyê ku qebûlbûna hinek dûayan ne li vê dinyayê xuya dibe, lêbelê dibe ku ew li axretê tecellî bibe û ev xusûs jî bi mirada Heq ve bend in.

82. Muslim, Fîten, 20/2890

Xusûseke din jî, hem ji bo pêğemberan, hem jî ji bo ewlîyaûllah meşreb û teserrufên cihê cihê hatine lutfkirin. Naxwe dibe wesfeke qenca ku di yekî de derdikeve pêş, ew di yên din de di heman ast û sewîyê de nebe. Ji bo wê, ji temaman heman teserruf hêvîkirin rast nabe. Ji xwe wezîfa eslî ya wan jî ne ev cure teserruf in, lêbelê îrşad û îqaza dila ye.

Ev hadîse, bi eşkerehî li holê datîne û dide xuyakirin ku hemû teserruf, bi xwestina Xuda ve bend in.

Mamê Resûlê Xuda Ebûtalib bi salan bi awayekî fedakarane hem berevanî ji Resûlê Xuda, hem jî misliman dikir. Mezinê me Resûlûllah zehf arzû dikir ku ew îmanê bîne û ew di vê xusûsê de israrkar dibû. Ebûtalib jî li hemberî vê israra wî ji birazîyê xwe re digot:

“-Ez heqîqeta te dizanim. Lakin heke ez îmanê bi te bînim, jinên Qureyşîyan wê min eybdar bikin!” Wî, ew heqîqeta ku bi wijdana xwe qebûl dikir lê ji ber ku ew ji esebîyeta qewmî ya xwe re meğlûb bûbû, ew iqrar nedikir. Di paşîyê de peyva Ebûtalib ji Resûlûllah re bû ev:

“*-Ez li ser dînê berê [dînê Ebdûlmttelib] dimrim. Heke Qureyşîyan di bara min de negotiba ji mirinê tirsîya ji lewma dînê xwe guherand, min peyvên te qebûl dikirin!...*” [83]

83. Buxarî, Cenaiz 81, Menaqibu’l-Ensar 40; Îbû Se‘d, I, 122-123.

Di bersiva van peyvan de mezinê me Pêğember got:

“-*Ez jî heta li min neyê qedeğekirin, ezê tim ji bo te îstiğfaran bikim!*”[84] û ew wek ğemgîn ji mala mamê xwe derket, çû.

Bi sebeb ku Resûlûllah zehf ğemgîn bû û ji apê xwe re got: “*Ezê ji te re îstiğfaran bikim!*” di ayeta pîroz de wiha hate gotin:

“[Resûlê min!] **Bi rastî tu nikarî yê ku jê hez dikî bînî ser hîdayetê, lêbelê; Xuda kê bivê, wî tîne ser hîdayetê û ew çêtir dizane ka ji bo hîdayetê kî layîq in**.”[85]

Naxwe ğeyret û hewldana pêğemberan jî bi tena serê xwe ji bo anîna ser hîdayetê ne kafî ye. Heke Cenabê Heq bixwaze ji bo van ğeyret û hewldanan bereketa tesîrê lutf dike, wê digihîne encamê, heke bixwaze jî wê bê encam dihêle.

## TEWESSUL

Digel vê jî, dema bende dûa dike, heke ew evdên ku Xuda ji wan hez dike pêğemberan û zatên salih bike wesîle, yanî bi hurmeta wan bixwaze [tewes-

84. Ji bo vê îstğfarxwestina Mezinê me Pêğember ji apê xwe re hinek misliman xwestin ji bo bav û bapîrên xwe yên mûşrk îstiğfar bikin. Vêca ev îstğfarxwestina wan bi nazilbûna ayetên pîrozên 113-114 ên sûretê Tewbe hatine qedeğekirin.
85. Qesas, 28/56

sulê bike] ew hê zehftir merhemeta îlahî celb dike, dikişîne. Ev, bi bîranîna salihan ku peyabûna rehmê jê tê hêvîkirin di mahîyeta teberrukê de ye.

Lêbelê dema mirov di dûakirinê de hezkirîyên Xuda bike wesîle jî, divê mirov daxwazan ne ji şexsên wan bi xwe bike; lêbelê daxwazên xwe her ji Xuda Teala tenê bike. Lewra Failê Mûtleq bes Cenabê Heq e. Naxwe her daxwaza însanî bes û bes bi xwestina Xuda tenê tê cih.

Ji bo vê ye ku hatiye gotin: "Tewfîq, ji Xuda ye." Yanî ewê ku hemû serkeftin û mûweffeqîyetan bexş dike, Xuda Teala ye. "Himmet"a zatên salih jî dûayên wan e. Ew jî hel û çareserkirina asêpirsên maddî û manewî ji Xuda Teala nîyaz dikin.

Di ayeta pîroz de, di mijara îşaret pêdana ku hemû kar, bi mirad û teqdîra Xuda Teala ve bend in de, wiha hatiye gotin:

"**Ma ew nizanin ku bêguman Xuda ye, ewê ku toba bendê xwe qebûl dike û sedeqeyan jî werdigre?..**"[86]

**Tewessul** jî ev e;  mirov bi arzûya celbkirin û kişandina riza û lutfa Cenabê Heq, bi hurmeta hezkirîyên Cenabê Heq daxwaz jê kirin e.

86. Tewbe, 9/104

Dema Cenabê Heq çêbûna tiştekî mûrad bike, jê re dibêje “**Bibe!**” û ew kar jî tê cih. Digel vê jî Ellah Teala bi mûcib û mûqteza’ya mûrada îlahî ya xwe teserrufa hinek bûyeran bi hinek evdên xwe sipartiye.

Mesela şîfa ji Xuda ye. Feqet Cenabê Heq, doktor, derman û yên wekî van ji bo şîfayê kirine wesîle. Naxwe divê mirov bi tewessula van wesîleyan li şîfayê bigere. Serlêdana mirovan li doktoran ji bo şîfayê jî şirk nayê jimartin. Lewra her mûmîn, dizane ku Xuda şîfayê dide û doktor jî wasîte ye. Cenabê Heq maddeyên kîmyewî yên di dermanan de ji bo şîfayê aferandine û ew bi însanan dane îcad û peydakirin.

**Eshabê kîram** jî arîkarî ji **Resûlûllah** dixwestin, şefaet jê teleb dikirin, halên xwe yên wekî feqîrtî, nexweşî û deyndarîyê lê erz dikirin, dema ew diketin tengasîyê jî bilez diçûn cem wî. Li gorî di gellek rîwayetan de hatiye guhastin; dema rewşa hişkesalîyekê xuya bû, însan hatin cem Resûlê Xuda û jê xwestin ew dûa ji Cenabê Heq bike û baranê jê daxwaz bike.

Dema eshabê kîram ev dikirin jî helbet baş dizanîn ku Resûlûllah di gihiştina xêran de sade wasîte û sebeb e. Failê Heqîqî, Qadirê Mûtleq, bes Cenabê Heq e.. Lêbelê wan hêvî dikir ku Rebbê me bi hurmeta mehebbeta hebîbê xwe, wê dûayên wî hê bêhtir qebûl bike, ji lewma wan bi vê rêyê tewessul dikirin.

Sehabîyan ji me zehf baştir dizanîn ka Mezinê me çi tiştî "**şirk**" û çi tiştî jî "**tewhîd**" dijimêre.

Rojekê **Merwan**; merivek dît ku wa ye rûyê xwe li ser kevirê qebra şerîfa Resûlûllah danîye, vêca bi berstika wî girt û jê re got:

"-Tu dizanî, tu çi dikî?"

Dema wî zatî serê xwe fitiland meyzand ku wa ye, ev kes **Ebû Eyyûbê Ensarî** ye. Wî sihabîyê evîndarê Pêğember wiha got:

"-*Belê, ez dizanim çi dikim. Ez hatime cem Resûlûllah, nehatime cem kêvir. Min ji Resûlûllah bihîst ku wiha digot:*

*"Dema ehlê dîn wî hildin ser xwe ji bo dîn nekeve fikaran; lêbelê dema yên neehl dest bi tedwîra dîn bikin, hingê tu çi qeder ji bo dîn bikevî fikaran û li serê bigrî cihê wê ye.*"[87]

Naxwe ew tewessula ku rîayeta edeba wê hatibe kirin şirk jimartina wê ne di cihê xwe de ye. Ya şirk ev e; ewê ku tewessulê dike, wî kesê ku tewessulê pê dike di mewqîyekî wisan de dibîne ku ew jî wekî Xuda Teala dikare kar bide, yan jî zirarê bide. Bi vê sebebê, ew kesê ku tewessulê dike, divê zanibe ku ew zatê tewessul pê tê kirin sade bi destûra Xuda wekî ku

87. Ehmed bin Henbel, V, 422; Hakim, IV, 560/8571; Heysemî, V, 245

dibe sebebê xêrê, bes bi xwestina Xuda dibe sebebê defa xirabîyekê jî.

## ZÎYARETA QEBRAN

**Mezinê** me **Resûlûllah** wiha gotiye:

"*Mirinê zehf di bîra xwe bînin! Lewra bîranîna mirinê [însên] ji gunehan paqij dike, li hemberî dinyayê jî dixe zahid. Heke dema hûn zengîn bin, hûn mirinê di bîra xwe bînin, ewê we ji afetên zengînîyê biparêze. Dema hûn feqîr bin, hûn mirinê di bîra xwe bînin, ewê bike ku hûn ji heyata xwe memnûn bibin*." [88]

"*Mirinê û piştî mirinê jî rizîna cesed û hestîyan di bîra xwe bînin! Ewê ku heyata axretê bixwaze, wê xemla heyata dinyayê terk bike*."[89]

"*...Kî mirinê zehf di bîra xwe bîne Xuda ji wî hez dike*."[90]

"*Wê mirina ku hemû zewqan ji kokê mehû dike zehf di bîra xwe bînin."*[91]

Bi vê sebebê erbabê tesewwufê, her roj mûddetekê mirinê tefekkur dikin, zindîtîya manewî bi rûhên xwe didin qezenckirin. Lewra ji bo berterefkirina nefsanîyetê û înkîşafa rûhanîyetê tefekkura mir-

88. Suyûtî, Camîu's-Seğîr, I, 47
89. Tirmizî, Qiyame, 24
90. Heysemî, X, 325
91. Tirmizî, Qiyame, 26

inê wesîleyeke mûstesna ye. Ew bi zindîtîya manewî ya ku ji vê tefekkurê wergirtine, xwe ji karên çewt û pûç diparêzin, ew tim û daîm ğeyret dikin, hewl didin karên bihavil û zehf zêde emelên salih bikin.

Li gorî rîwayetan **Hezretê Elî** zehf zêde diçû serdana qebran. Rojekê hinek mirovan jê re got:

"-Ey Elî! Ev çi halê te ye, te qebr ji xwe re kirine cîran?" Wî jî ev bersiv da wan, ji wan re got:

"-Min dît ku cîranê heqîqî ne! Lewra ew hîç xirabîyekê nakin û [ew bi halê xwe daîmî dersa îbretê didin me] axretê dixin bîra mirovî!"[92]

Dostekî Heq, ji bo em ji ğefletê xilas bibin û karibin nîmeta emr û temen bi emelên salih binirxînin û karibin daîmî di halê hemd, şukr û rizayê de heyata evdînîyeke aram bijîn, ev şîretên ha kirine:

"Dem bi dem here nexweşxanan, nexweşan zîyaret bike! Bihizire ku tu wekî wan êşdaran bi nexweşîyekê mûbtela nebûyî, ji bo halê xwe, ji bo nîmeta sihheta li ser xwe, şukr bike!

Dem bi dem here girtîgehan, heyata girtîyan di zîndanê de ya bi hezar û yek êş û janan tije, tefekkur bike! Bihizre ku ew cînayet di netîca hêrsa kurtedemekê de, yan jî di encama cinnetê de hatiye kirin, li terefê din jî ew wek ğemgîn ketine hebisxanê, hinek

92. Îbnû Ebû-şeybe, Mûsannef, VII, 102/34514

hene ku mecbûr in wê êş û cefayê bikişînin, dibe ku tu jî di cihê wan de bûne! Ji ber ku Ellah Teala tu ji ketina halê wan mûhafeze-kirî, jê re şukr bike! Ji bo selametîya mirovên li wir jî dûa bike!

Piştre here **qebristanan**, li feryad û hewarên bêdeng ên ku bi zimanê halê xwe ji kêlên qebran bilind dibin, guhdarî bike! Bihizre ku piştî tu nîmeta emr û temen jidest bidî, poşmanbûna te wê ti feydê nede te! Qîmetê wextên xwe zanibe! Ji bo mirovên di qebran de razayî ne, dûa û îstiğfaran bike! Û hewl bide ku tu rojên xwe yên piştî van hê bêhtir bi hemd, şukr û zikr binirxînî!"

Bi rastî sipehîtirîn wesîla ku mirin û axretê bi însanî dide tefekkurkirin, zîyareta qebra ye. **Mezinê me Resûlûllah** wiha gotiye:

"*Min zîyarta qebran li we qedeğe kiribû... Êdî hûn dikarin wan zîyaret bikin. Lewra zîyareta qebran axretê di bîra we tîne.*"[93]

Mezinê me Pêğember di destpêka nibiwweta xwe de zîyareta qebran ji ber xetera ku dibe ew dîsa vegerin ser şirkê qedeğe kiribû. Lewra însan di serdema cahilîyetê de diçûn zîyareta qebran ji bo hizr pê bikin ku rûhên kalên wan qudsîyet qezenc kirine û pirrbûna mirîyên xwe jî dixistin sebeb ji bo bi mezinbûna qewmê xwe şehnazîyê bikin. Mezinê me ji bo ti eser û

93. Tirmizî, Cenaiz, 60; li Muslim, Cenaiz, 106'an binêrin

berhem ji vê adeta cahilîyetê nemîne, di zemanên pêşî de zîyareta qebran qedeğe kiribû.

Feqet piştî ku Îslam tam xurt bû û îman û tewhîd di qelban de baş hatin bicihkirin, êdî piştî cih ji bo endîşeya ku ew mezaran biperêsin, meded û arîkarîyê ji wan hêvî bikin û qudsîyetê bidin wan, nema, mezinê me ji bo zîyareta qebran îzn dabû, heta ev teşwîq kiribû..

Resûlê Xuda zehf caran eshabê xwe yê li **Qebristana Beqîê** û **şehîdên Uhudê** zîyaret dikirin. Bi îfadeya dêya me **Hezreta Aîşe**, mezinê me her şeva ku li cemê dima di beşa dawîya wê şevê de diçû **Qebristana Beqîê**, silav li yên li wir dikir û ji wan re dûa dikirin.[94]

Heta şevekê **Cebraîl** hate cem mezinê me Pêğember, jê re got:

"*-Rebbê te ferman li te kiriye ku tu herî serdana ehlê Beqîê û ji wan re îstiğfar bikî!*" Mezinê me jî derhal ji bo vê fermanê îcabet kir û **Cennetu'l-Beqî** zîyaret kir.[95]

**Ebdûllah bin Ebî-Ferwe** wiha dibêje:

Pêğember qebra şehîdên li **Uhud**ê zîyaret kir û wiha got:

94. Li Muslim, Cenaiz, 102'yan binêrin.
95. Muslim, Cenaiz, 103

"*Xudayê min! Evdê te û pêğemberê te dibe şahid ku ev şehîdên heqîqî ne. Heta qiyametê jî kî were van şahîdan zîyaret bike û silavê li wan bike, ew jî bersiva silava wî didin.*" [96]

Dîsa Hezretê Pêğember li eshabê kîram hîn kiriye ku dema ew biçin zîyareta qebran wiha bibêjin:

"*Silav li we be, gelî mûmîn û mislimanê xelkê vî dîyarî! Înşaellah em jî dê di demeke nêzîk de werin bigihîjin we. Ez dixwazim Xuda hem me, hem jî we efû bike.*"[97]

**Îmam Şe'bî** ku yek ji mezinên tabîîna ye, wiha dibêje:

"*Dema yekî ji nêzîkên Ensarîyan wefat dikir, ew zehf diçûn qebra wî zîyaret dikirin û li cemê Qur'an dixwendin.*" [98]

Naxwe dema mûmînek biçe qebristanê, bila pêşî silavê li xelkê qebristanê bike, bila ji bo wan dûa bike, heke mûmkin bibe jî bila Qur'anê bixwîne û hizr pê bike ku rojekê ew jî her dê wekî wan bimre. Çawa ku yek ji dostên Heq **Hezretê Hatemê Esam** jî gotiye:

---

96. Hakim, III, 31/4320
97. Muslim, Cenaiz, 104
98. Ebûbekr bin Hellal, el-Qîrae inde'l-Qubûr, Beyrût 1424, rûp. 89, hijmar: 7.

"*Mirovekî ku biçe qebristanê, dûa ji bo yên li wir neke û [encama] xwe nehizire; wî hem xîyanet li xwe, hem jî li yên li wir, kiriye*."

Li gorî veguhastina **Sufyan bin Ûyeyne**, wiha dihate gotin:

"*Îhtiyaca miriyan bi dûa, ji îhtiyaca sağan ya bi xwarin-vexwarinê zehftir e*."[99]

Naxwe di bara meşrûîyeta xwendina Qur'ana Kerîma li ser qebran de hemû ûlema gihane qenaeteke qet'î.

**Îmam Newewî**, di Şerhu'l-Mûhezzebê de wiha dibêje:

"*Ji bo kesê ku diçe zîyareta qebran, heta ku karibe xwendina Qur'anê û di pişt wê de jî dûa-kirin ji bo yên li wir mûsteheb e*."[100]

Li gorî **Qurtûbî**, dema li cem qebrê Qur'an were xwendin, ewê di qebrê de wê dibihîze û bi saya kerema Xuda, hem ji bo sewaba xwendina Qur'anê, hem jî ji bo sewaba guhdarî-kirina li wê nail dibe. Bi vê sebebê ew digihîje rehma îlahî. Li cem vê jî, ev heye; digel ku wî ew qîraetê Qur'anê nebihîstiye jî lê sewaba qîraeta ku jê re hatiye hedîyekirin ew jî wekî sedeqe û dûayê digihîje wî.

99. Suyûtî, Şerhu'l-Sudûr, Lubnan 1417, rûp. 297
100. Suyûtî, Şerhu'l-Sudûr, rûp. 303

Di “Fetawa Qadîxan”ê de ku yek ji kitêbên Henefîyan e, wiha tê gotin:

“*Ew kesê ku li cem qebran Qur’anê dixwîne heke ew hizr pê dike ku bi dengê Qur’anê unsîyetê bide yên di qebran de, bila ew, wê li wir bixwîne, heke qesdeke wî ya wiha nebe, [heke lı cem qebran nexwîne jî] ji xwe li kuderê be jî Ellah Teala qîraetê dibihîze.*”[101]

Yanî mirov li kuderê bixwaze bila li wir bixwîne û sewaba wê baxş bike. Lêbelê heke ew li dev qebrê bixwîne, ew dibe wesîle, ji bo mirî hem ji bo sewaba guhdarîkirina li xwendina Qur’anê, hem jî ji bo îstîfadekirina ji rehm û sekîneta ku di wê anê de tên xwarê, nail bibe.

Naxwe di zîyareta qebran de xwendina Qur’anê bûye **îcma**[102]-yeke ku ji 1400’an û bi vir ve her hatiye tetbîqkirin. Ji bo mirî jî ji wê rehma ku bi tîlaweta Qur’anê hasil dibe, îstîfade bikin, bi taybetî xwendina **Yasîna Şerîf** bûye usûleke ku ji herkesî ve malûm û pêzan e.

Çawa ku di hedîsa şerîf de jî wiha hatiye gotin:

---

101. Suyûtî, Şerhu’sûSudûr, rûp. 304
102. Îcma; di Hiqûqê Îslamê de çar delîlên eslî hene: Qur’an, Sunnet, Qiyasa Fuqeha û Îcma-ya Ummetê ye. Îcma’ya Ummetê; îttîfaqkirina temamê mislimanan bi taybetî jî alimên Îslamê yên ku ji meselê agahdar in, li ser mijarekê ye.

"*...Yasîn qelbê Qur'anê ye. Heke kesek bi nîyeta bidestxistina riza'ya Xuda û mala axretê, wê bixwîne, bêşiwar gunehê wî tên efûkirin.* ***Sûretê Yasînê li ser mirîyên xwe jî bixwînin***."

Mirov dikare sûret û ayetên din jî ji bo îstîfadekirina manewî ya mirîyan bixwîne. Di vê mijarê de ji gellek rîwayetan yek jî wiha ye:

"*Dema yek ji we wefat bike, wî zêde nedin sekinandin û bibin qebrê. Dema hûn wî defin bikin jî bila li ber serê wî Sûreta Fatîhê, li ber lingên wî jî beşa dawîyê ji Sûretê Beqere [Amenerresûlû] were xwendin*."[103]

**Îmam Şafîî** -rehmetûllahî eleyh- jî wiha dibêje:

"*Li ber serê qebrê ayet û sûret ji Qur'anê xwendin mûsteheb e. Xwendina temamê Qur'anê [xetimkirina wê] jî hê sipehîtir e*." [104]

Wekî ku hate dîtin zîyaretkirina qebran, silav li yên li wir kirin, dûa û îstiğfar-kirin ji bo yên li wir, li ser navê wan xêr-hesenat kirin, tîlawet-kirina Qur'anê ji bo mirîyan wesîla rehmê ye.

Heke zîyareta qebran, bi rîayet-kirina esasên edebên Îslamî were îcrakirin, ji bo gellek xêran wesîle ye. Lewra hîç guman nîn e ku di netîca tefekkura mirinê

103. Teberanî, Kebîr, XII, 340; Deylemî, I, 284; Heysemî, III, 44
104. Newewî, Rîyazu's-Salihîn, Beyrût, ts. Rûp. 293.

de wê îhtîrasa nefsan bişikehe, însan wê zehf bêhtir berê xwe bide ser teqwayê, ewê bibe xwedî riqqeta qelbî û ewê xwe ji ğefleta bi edaya xwecihî-ya gera li ser dinyayê, biparêze. Qebristan wekî eyneyekê ye ku paşwext û îstiqbala herkesî têde xuya dibe. Heke însan karibe zehf caran bi nêrîna îbretê li vê eynê binêre, ewê xwe ji zîyankirina li dûv hewesên pûç jî dûr bigre. Naxwe zîyareta qebran sipehîtirîn wesîle ye ji bo hewldan û ğeyreta xwe hazirkirina ji bo axretê.

Ji bo vê ye ku kalên me, qebristan bi taybetî li pêşberî mizgeftan û di nav bajaran de çêkirine. Di saya vê de însanên ku ji wir tên û di wir re derbas dibin, hem fatîha ji mirîyan re dixwînin, dibin wesîla rehmê, hem jî ew bûye sersebeb ku însan paşwexta xwe temaşe bikin û hîn bêhtir mirinê tefekkur bikin.

Li rexê din, divê mirov bi titîzî xwe ji hinek şaşîyên ku di zîyaretkirina qebran de têne kirin jî, biparêze; Her wekî mûm pêxistina li ber serê qebran, kinc pêve kirin û yekser ji wî zatê di wê qebrê de meded û arîkar hêvîkirin..

Divê mirov hîç ji bîr neke ku ew zatê di wê qebrê de razayî çi qeder zatekî mezin dibe bila bibe, her divê di şexsê wî de tiştek ji wî neyê xwestin. Divê bi wesîla qîmet û xatirê wî yê li cem Heq Teala, dîsa daxwaz ji Heq Teala bi xwe were kirin.

Lewra tekane mercî û failê mûtleq ê ku tiştek jê were xwestin, Cenabê Heq e. Heta xwestina wî pê

nebe, ti evdek, nikare hîç ti xêrekê bîne meydanê û nikare ti şerrekî jî def bike, [ji ser xwe, yan jî ji ser ti kesî din bide alî]. Ji ber vê di ğiyaba zatên salih de, yan jî di esnaya zîyareta qebra wan de peyvên wekî; "**ey Filan zat! Şîfayê bide min, yan jî filan îhtiyaca min temîn bike!**" bi vê awayê cahîlane yekser daxwaz ji wan kirin, ew di wê derecê de şaşîyeke mezin e ku derî li ber şirkê veke. Divê mirov bi titîzî xwe ji vê peyvê û yên wekî wê biparêze ku ew dikare wê eqîda ğayet hessasa tewhîdê jî xirab bike û zirarê bigihiniyê.

Divê mirov bi awayekî asê û sağlem xwe ji her cure îfadeyan biparêze ku ew di çareserkirina asêpirsên maddî-manewî û sewq û îdareya kaînatê de bi ber zêhnê mirovî bixe ku ji bilî Xuda dibe yekî din jî xwedî teserrufa mûtleq be.

Îqazkirina mirovên ku bi sebeb ğefleta xwe, yan jî cehaleta xwe hinek reftar û bizavan dikin ku serê wan digihîje şirkê, peywir û wezîfa her mûmînî ye. Lêbelê di vê xusûsê de, ewên ku bi navê derketina li hemberî zêdegavîyan, ew qeder zêde diçin heta ku zîyareta qebran ya ku bi rîayetkirina edebên Îslamî jî be "**şirk**" dijmêrin, ew jî bi awayê berevajî xetayeke din wekî xetaya wan dikin.

Îslamê wekî ku di her xusûsê de wisa ye, di mijara zîyareta qebran de jî îtîdal esas girtiye. Peyv û kirina mezinê me Pêğember û eshabê wî di vê xusûsê

de sipehîtirîn nimûne ne ku şanî didin ka divê mirov çawa vê erkê bîne cih û nekeve îfrat û tefrîtê jî.

## HETA ELLAH TEALA NEDE ZANÎN...

Dibe ku hinek mirîd ji ber zêde ji mûrşidê xwe hez dikin, bikevin fikr û hizrên wiha û bi heyecaneke bi ser xwe de fûrî, bibêjin; "**mûrşidê min her tiştî dizane!**" Bêşiwar ev jî teleqqî û wergirtineke kêm e.

Çawa ku hinek caran pirs ji **Mezinê** me **Pêğember** dihate kirin, mezinê me jî digot; "*ez wê tişta ku hatiye pirskirin, ji yê ku ew pirsê kiriye, bêhtir nizanim*."[105]

**Şêx Sa'dî** di berhema xwe ya bi navê *Gulistan*ê de wiha dibêje:

Mirovekî ji **Yaqûb** pirs kir, jê re got:

"-Ey Pêğemberê eqlmend ê qelbê wî mûnewwer! Te bêhna gomlekê Yûsuf, ê ku ji Misrê dihat, kir; lêbelê te, çima dema li ber serê te di bîrê de dihat avêtin, ew nedît?"

Yaqûb ev bersiv dayê:

"-Ew nesîbên îlahî yên ku em gihane wan, wekî birûskên lêxer in. Ji ber vê, heqîqet carina ji me re eyan dibin, carina jî ji ber me têne sergirtin!"

105. Li Muslim, Îman, 1'ê binêrin.

Yanî heke Cenabê Heq perdê veke bende, yên din jî dibîne; feqet heke ew serbigre jî însan dibe ku koncala li ber xwe jî nabîne. Yanî bende, di kîjan meqamê manewî de dibe bila bibe, bêçare ye. Daîm îhtiyaca wî bi lutfa Cenabê Heq heye.

## BENDE BÊ XETA NABE

Dîsa hinek mirîd ji ber zêde ji mûrşidên xwe hez dikin, dikevin îfratê û hizrê wiha dikin, dibêjin; "**mûrşidê min, hîç xeta nake!**" Bêşiwar ev jî teleqqî û wergirtineke şaş e.

Lewra li gorî gellek rîwayetan[106] hatiye ragihandin; di piştî pêğemberan de çêtirînê mirovan **Hezretê Ebûbekr** e.. Wî jî piştî wek xelîfe hate hilbijardin, ew xîtaba pêşî ya ku kirî ji bo hemû lîder û mûmînên ehlê terîqê yên ku heta qîyametê werin, endazeke ew qeder mûhteşem ji mislimanan re sipartiye hiştiye. Ew dibêje:

*"Gelî mirovan! Digel ku ez ne çêtirînê we me jî, va ye ez li ser serê we wek xelîfe hatime hilbijardin. Heke ez wezîfa xwe bi tekûzî bikim, arîkarîya min bikin. Heke ez şaş hereket bikim jî, ji min re rêya rast şanî bidin..*

106. Li Elî el-Mûtteqî, Kenzu'l-Ummal, XI, 549/32578; Îbnûmace, Mûqeddîme, 11/106; Ehmed, I, 127, Ii, 26'an binêrin.

*...Heta ez bi xebera Xuda û Pêğember bikim hûn jî bi xebera min bikin! Heke ez bi xebera wan nekim, lazim nake hûn jî bi xebera min bikin!..”* [107]

Heke çêtirîn şexsîyet wiha bibêje, naxwe îcab dike ku mirov bihizre ka ewên ku lazim e wî ji bo xwe bikin nimûne, çawa bibêjin.

Dîsa yek ji mezinê mûrşidên kamil: **Mezher Canê Canan** zehf bal dikişand ser vê xusûsê; divê herkes ji bo Sunneta Senîyye guncaw û mûnasib be. Digel vê jî wî tewazûyeke mezin şanî dida, wiha digot:

“*Kî, bibîne em karekî bikin ku bi hukmên îslamê re ne ahengsaz be, derhal bila ew me şîyar bike!*” [108]

## HEY ÎNSAN, XWE QURE NEKE!..

Dîsa hinek însan ji ber zehf zêde ji rêya manewî ya ku ew peyrewên wê ne, hez dikin wiha dibêjin; *“di rêya me de mirovê ku ji herkesî gunehkartir be jî, wê ji bo çil kesan şefaetê bike, li axretê kî xwe bi dawa mûrşidê min bigre, ewê yekser biçe cennetê”* Ev cure îddîa hîç bi esasên şer‘î re ahengsaz nabe.. Ew bê esas û bê mesned e. Mirov dikare li heyezanên bi ser xwe de fûrîna heyecanên dîtir jî rast were.

107. Îbn S‘ed III, 182-183; Suyûtî, Tarîxu’l-Xulefa, rûp. 69, 71-72; Hemîdûllah, Îslam Peygamberî, II, 1181.
108. Ebdûllah Dehlewî, Meqamat-i Mzherîyye, rûp. 43.

Di serî de divê em îfade bikin ku şefaet, heq e. Heke Rebbê me bixwaze, dikare ji bo evdê xwe yê ku ew dixwaze, vê selahîyetê bexş bike. Lakin bes Rebbê me bi tenê dizane ka kî wê ji bo kê şefaetê bike, wekî ku di ayeta pîroz de hatiye gotin:

"**Bê destûra wî, ma kî dikare li cem wî şefaetê bike?!**"[109]

Ji bilî vê jî, ev îqaza ku mezinê me **Resûlûllah** ji keça hezkirîya xwe **Hezretê Fatima** re kiriye jî, zehf îbretamîz e:

"*Ey Fatima, keça Mûhemmed Resûlê Xuda! Emelê salih ê li cem Xuda meqbûl, bike! [Heke na, bi pêğemberbûna bavê xwe bawer nebe!] Lewra ez [heke hûn evdînîyê nekin] nikarim we ji ezabê Xuda xilas bikim!*"[110]

Naxwe heke însan hezkirina ji evdên salih, hurmet, aîdîyet, mensûbîyet û husna zenê ya ku li hemberî wan hestpê dike bi tenê wek nesseke qet'î ya sersebebê xilasbûna ebedî ya xwe bibîne, ew ji hêla maneyî ve zirarê dide mirovî.

Yek ji wan xusûsên mûhîmtirînê ku qelbê reqîqê ewlîyaûllah dilerizîne jî ev endîşe û fikar e ku bi sebeb wan îltîfatên zêdeyî heddê ji wan re têne şanîdan, di

109. Beqere, 2/255
110. (Îbn Se'd II, 256; Buxarî, Menaqib, 13-14; Muslim, Îman, 348-353)

hizûra Heq de hesab ji wan were pirsîn e.. Ji bo vê ye ku dema mirovekî pesnê **Hezretê Ebûbekr** dida, wî derhal bi ber Cenabê Heq ve îltîca dikir û digot:

"*Xudayê min! Tu ji min, bêhtir bi min dizanî. Ez jî ji wan bêhtir bi xwe dizanim. Xudayê min, min ji wê zena ku ew di bara min de dikin, çêtir bike! Wan xetayên min, ên ku ew pê nizanin jî meğfîret bike! Ji bo wan peyvên ku ew di bara min de dibêjin jî, hesabê ji min nepirse!*" [111]

Ji bo heman endîşe û fikarê **Hezretê Xalidê Beğdadî** jî wesîyet kiriye ku îfadeyên îltîfatê li ser kêla wî neyên nivîsîn.

Ha ew mirovên ku bi maneya rastîn ehlê tesewwufê ne, mûmînên wilo ne ku dilê wan bi vê hessasîyetê dilerize.

Divê mirov hîç ti zemanekî jibîr neke ku krîstîyanan bi sebeb zêdeyî heddê pêğemberê xwe mezin kirine, eqîda tewhîdê xirab kirine û ew ji Cenabê Heq re xistine şirîk.

Ji vê hêlê ve **Mezinê** me **Resûlûllah** ummeta xwe ji van cure ğulû û zêdegavîyan daye parastin, ev îqaz kirine û gotiye:

*"Min di pesn-dayînê de nefirînin [ber perê asîmana] wekî ku krîstîyanan wisan zêde pesnê Îsa kurê*

111. Suyûtî, Tarîxu'l-Xulefa, rûp. 104.

*Meryemê dane. Ev mûheqqeq e ku ez evdê Xuda me. Naxwe ji bo min bibêjin; «evdê Xuda û Resûlê wî.»”*[112]

“*Hûn, min zêdetirî wê dereca ku heqê min e, bilind nekin! Lewra Xuda berî min bike Resûl, ez kiribûme evd*.”[113]

**Mezinê me Resûlûllah**, şerefa evdbûna ji bo Cenabê Heq ji her tiştî çêtir qebûl kiriye. Ev rîwayet jî, ji bo vê heqîqetê mîsaleke bariz e:

Rojekê Resûlê Xuda bi Cebraîl re sohbet dikir. Di wê anê de melaîketek ji asîmanî hate xwarê. Cebraîl got; ev cara yekê ye ku ev melaîket tê dinyayê.

Wî melaîketî got:

“-Ya Mûhemmed! Rebbê te, ez şandim cem te. Ji te dipirse; tu dixwazî bibî pêğemberekî melaîket yan jî tu dixwazî bibî pêğemberekî evd?”

Mezinê me li Cebraîl meyzand, wî jî got:

“-Ey Resûlê Xuda! Li hemberî Rebbê xwe mûtewazî be!”

Mezinê me Resûlûllah jî got:

“-*Ez dixwazim bibim pêğemberekî evd*.”[114]

112. Buxarî, Enbîya, 48
113. Hakim, III, 197/4825; Heysemî, IX, 21
114. Ehmed, II, 231; Heysemî, IX, 18, 20

Ha di piştî vê tercîhê de “**evdînî**” bû bi şereftirîn meqam ku însan dikare bigihîyê.

Çawa ku di kelîma tewhîdê de di qismê ku bi mezinê me Resûlûllah re elaqedar de di serî de îfade dike ku ew “**evd**” e. Naxwe rêya gihiştin û naîlbûna ji bo riza’ya îlahî di vê ğeyret û hewldanê re derbas dibe ku mirov karibe evdînîya ji bo Heq Teala di her qûnağ û sefheya heyata xwe de bijî.

Îcab dike mirov vê jî ji bîr neke ku ji bilî pêğemberan her bendeyekî din, aciz, nekar û kêmasîdar e, ne temam e. Heta pêğember bi xwe jî bi hesab ku ew beşer in “**zelle**”yan dikin. Lêbelê ji ber ku ew ji bo te’yîda [piştevanî û desteka] îlahî bûne mezher ew têne teshîh kirin. Yek ji hikmeta van jî; di bîra pêğemberan jî tînin ku ew aciz û bêçare ne; bi ummetên wan jî didin hînkirin ku bila ew wekî ku dereca ulûhîyetê bidin pêğemberên xwe bila wisan di bilindkirina wan de zêdegavîyan nekin.

Naxwe ji bo mezinên manewîyatê çi qeder mehebbet û hurmet lazim be, di bilindkirina wan de heta tu bibêjî bes rîayetkirina hidûdên şer‘î zerûrî ye. Di rewşeke berevajî de di vê xusûsê de ewên ku ji tixûbê xwe bûrîne; hem zirar dane îstîqameta xwe, hem jî leke anîne ser safîyeta rêya manewî ya ku ew peyrew û mensûbê wê ne.

Wekî ku di her xusûsê de wisa ye, dem bi dem di tesewwufê de jî îstismarkar derketine holê. Îro jî çi

ji ezperestîyê be, çi ji ber nexweşîyeke rûhî be, çi jî ji ber xapîna bi îltîfatên zêdegavî yên mûxateban be hinek rengeşêx radibin îddîayên wiha dikin; *“ez qutbê zemanî me, ez ğewsê zemanî me!..”* Ev kesên ku bi van cure îddîayên ku bi temamî ji rûhê rastî yê tesewwufê dûr radibin, ketine îddîaya xwe mezinkirinê, yan jî ketine lêgerîna li şohretê.

Haleveku wekî **Hezretê Osman** gotiye:

“*Yek ji elametê evdê mûtteqî ev e; însanên din xilasbûyî û xwe jî helak-bûyî dibîne*.”

Bila em jibîr nekin ku ji bo em li hemberî hev pesnê xwe bidin û îftîxarê bikin em nehatine vê alema îmtîhanê. Em tev ji bo vê dinyayê hatine şandin ji bo em hîçbûn, fanîbûn û aczîyeta xwe îdrak bikin û evdînîya xwe li Rebbê xwe erz bikin. Di vê alema fanî de **paya mezintirîn evd-bûna ji bo Heqq** e. Her yek ji me bi xetayê xwe û sewabê xwe, bes evdekî aciz û bêçare ye. Di bara encama me de jî piştî hemû ğeyreta ku ji dest me were em nîşan bidin, em xwe dispêrin rehm, meğfîret û înayeta Rebbê xwe tenê.

## TESEWWUF; GIRTINA DIL DI HEVKÊŞÎYA TIRS Û HÊVÎYÊ DE YE

Dersa ku ji vê bûyera di esrê seadetê de hatiye jîyandin dertê, divê em hemû wê ji bo xwe bikin destûra jîyanê:

**Osman bin Mez'ûn**ê ku ji zahid û abidê meşhûrê sehabîyan büye, li Medînê li mala jineke bi navê **Ummû'l-'Ela**'yê wefat kiribû. Vê jinê gotibû:

"-Ey Osman, ez şehde didim ku vêga Ellah Teala îkramê dide te."

**Mezinê** me **Resûlûllah** mûdaxele kir û jê re got:

"-*Tu ji ku dizanî ku Xuda îkramê didiyê?*" Dema wê jinê got;

"-Wellahî ez nizanim!" Resûlê Xuda ev îqaz kir, got:

"-*Binêrin, Osman wefat kiriye. Ez wek şexs, ji bo wî ji Xuda xêrê hêvî dikim. Lêbelê digel ku ez pêğember im jî ez nizanim wê çi ji min û te were kirin [wê çi hal werin serê min û serê te].*"

**Ummû'l-'Ela** dibêje:

"Qesem bi Xuda ye di piştî vê bûyerê de min li ser [hal û îstiqbala] ti kesî tiştek negot."[115]

Lewra ji bilî pêğemberan û yên ku pêğemberan ji bo wan mizgîniya xilaskirina îmanê di nefesa dawîn de dabe, ji bo ti kesî din temînat nîn e ku ew îmanê di nefesa dawîn de xilas bike. Çawa ku di ayetên pîroz û hedîsên şerîf de hatiye eşkerekirin; hinek mirov hene bostek maye biçin Cennetê, lê dibe ku dîsa ew ji bo

115. Buxarî, Tabîr, 27

ezabê îlahî dûçar bibin.. Berevajîyê vê; hinek mirov jî hene bostek maye biçin Cehennemê lê dibe ku dîsa ew ji bo rehma îlahî naîl bibin.

Îcab dike mirov hîç ti zemanekî rewşa **Bel'em bin Baûra** [116] jibîr neke. Ew yek ji tevahîya van cure kesan bûye ku piştî gihabû wî meqamê ku li Lewhû'l-Mehfûzê binêre û wê bixwîne, ew dîsa li hemberî nefsa xwe meğlûb bûbû û gihabû xusrana ebedî.

**Qarûn** jî yek ji wan mirovên sahib zuhd û teqwa bûye ku Xuda Teala gellek îhsan û nîmet li wî bi xwe kiribûn. Ji van jî zêdetir ew baştirîn kes bûye ku Tewrat rind dixwend û ew qenc tefsîr dikir. Lêbelê Xuda wek îmtîhan serweteke ew qeder zehf dabûyê ku xizîne jê tije dibûn, divîyabû vê kerem û dana îlahî ew ji Heqq nêzîk kiribûya lê ew bi serweta xwe jê dûr ketibû. Ew wisan bû ku dema Mûsa hesabê zekatê ji Qarûn re da zanîn, wî got:

"-Min ew qezenc kirin!" Bi vê gotina xwe wî îtîraz lê kir. Ji vê jî zêdetir ji ber ku serweta dinyayê ew ehmeq kiribû, li xwe nihabû, tenezzul kiribû ku îftîra jî bixe stûyê Mûsa. Di netîcê de ew digel xizîneyên xwe yên ku pala xwe dida wan û bi wan bawer dibû ketin binê erdê û wilo ew hate helak-kirin.

116. Li Eraf, 7/176'an binêrin.

**Hezretê Xalidê Beğdadî** jî dibêje:

*“...Di nefesa dawî de [kî wê xilas bibe ev] mechûl e. Çendîn fasiq û facir hene ku [tobe kirine û hatine ser îstîqametê] bûne ji welîyên kamil. Çendîn kesên sahib wera jî hene ku [bi xebera nefsa xwe kirine û ji ser îstîqametê çûne bi vî awayî ew] ketine esfela safilînê...”* [117] Wî di gellek nameyên xwe de dûa teleb kirine ji bo mirov karibe di nefesa dawîn de nefesa xwe bi îmanê bide.

Bi vê sebebê di tesewwufê de nehêja dîtina bendeyên Xuda û biçûkxistina wan qedeğe ye. Li pêşberî vê jî ğayet şaş e ku mirov bawerîyê bi ti kesekî bike her wekî ku zanibe mûheqqeq ew ji ehlê Cennetê ye û ew qeder ji yekî re îltîfat bike her wekî temînatê bidiyê ku ewê di nefesa dawîyê de îmanê xilas bike.

Naxwe di rêwîtîya manewî de gotina: “**Ez êdî gihame kemalê**”, yan jî di xwe de wehmkirina “**çêtirbûneke manewî**”, bi vî awayî qurebûn û ketina rexawetê nîn e. Tam berevajî vê; esasê karpêker ev e, mirov tim û daîm xwe netemam û nuqsan bibîne û hewldan û ğeyreta xwe her zêde bike.

Şair çi xweş gotiye:

*Ji bo kamilî, mêzîneke wekî çeşma însafê nabe,*
*Îrfaneke wekî bi kêmasîya xwe zanînê jî, nabe...*

117. Es‘ed Sahib, Buğyetu’l-Wecd, rûp. 120-121, jimar: 16.

**Hezretê Ebû'l-Hesen Xereqanî** jî dibêje:

"*Heta herkes fehm bike ku ew hîç tiştekî nizane ewê her pesnê xwe bi zanîna xwe bide. Paşê dema ew fehm dike ku ew hîç tiştekî nizane, ew ji zanîna xwe şerm dike, ha ew dem marîfet digihîje kemalê. Lewra zanîna rastî, zanîna nezanîna xwe ye.*"

Ew pêğemberên ku axreta wan di bin temînata îlahî de ye jî tim û daîm di nav hesta **xewf û ricayê/tirs û hêvîyê** de xwe diavêtin ber penaha rehma îlahî.

Mesela, **Îbrahîm Xelîlê**/dostê Xuda, ewê ku di malê xwe, canê xwe û ewladê xwe de hate îmtîhankirin jî dîsa wî di nav fikar û endîşeya axretê de wiha nîyaz dikir, digot:

"[Ey Rebbê min!] **Ew roja ku tu** [evdên xwe] **ji nû ve sağ dikî, min mehcûb neke!**"[118]

**Mezinê me Pêğember Hebîbê Xuda** jî digel ku hemû gunehên wî yên ku bûrîbûn û yên ku hê wê hatibana kirin jî tev hatibûne efûkirin jî dîsa wî bi hêstirên çavan re bi şev nimêj dikir, îstiğfar dikirin heta ku lingên wî diwerimîn. Dema jê dihate pirsîn; tu çima wiha dikî? wî digot:

"*-Ma bila ez ji Xuda re nebim evdekî şukrdar?..*"[119]

118. Şûera, 26/87
119. Îbn Hibban, II, 386

Dîsa ti kes ji "**Eşre'yê Mûbeşşere**" yanî ji wan deh eshabên ku hê li dinyayê mizgînîya çûna Cennetê ji wan re hatibû dayîn, pişta xwe bi vê mizgînîya ku gihabûnê nesipartine, di wezîfe û peywira evdînîya xwe de ti sistahî şanî nedane, ew hîç qure nebûne û neketibûne rexawetê. Tam berevajî vê rewşê, bi riqqeteke qelbî ya mezin bi ezm û şewq ğeyretên xwe hê zêdetir kirine û heyateke nimûneyî ya evdînîyê jîyane.

Ev bûyer, ji bo hessasîyeta qelbî ya eshabîyan çi mîsaleke sipehî ye:

**Selmanê Farisî**, bi her halê xwe, bi taybetî jî bi ğeyretên fedakarane yên di rêya Xuda de bûbû şexsîyetekî wisan mûmtaz û mûstesna ku Ensarî û Mûhaciran herduyan digotin:

"*-Selman ji me ye.*" Bi vî awayî dibû ku nikarîbûn wî di navbera xwe de leva bikin, heta wan di vê xusûsê de dest bi nîqaş û miqirsîyê jî kiribûn. Resûlûllah jî hem ji bo navçîtîya wan bike, wan lihev bîne, hem jî ji bo Selman teltîf bike, digot:

"*-Selman ji me ye, ji Ehlê Beytê ye!*"[120]

Digel vê îltîfata nebewî jî ew sehabîyê mûbarek, di nav tewazûyeke mezin û mehwîyetê de jîyaye û dilê wî tim û daîm bi endîşeya axretê lerizîye.

120. Hakim, III, 691/6541; Heysemî, VI, 130; Îbnû Hîşam, III, 241; Îbnû Se'd, IV, 83

Çawa ku du kesan silav li Hezretê Selman kirin û jê pirs kirin;

“-Ma tu sehabîyê Resûlûllah î?”

Wî jî ev bersiv da wan, ji wan re got:

“- Ez nizanim.”

Dema ewên ku hatibûn tereddud kirin, gotin; “gelo em bi şaşî hatine cem yekî din” Selman peyvên xwe ji wan re wiha îzah kirin:

“-Min Resûlûllah dît û ez çûme sohbeta wî jî. Lêbelê *sehabîyê eslî yê Resûlê Xuda ew kes e ku karibe pê re biçe Cennetê.”*[121]

Ha va ye, ji we re mîsaleke şahesera hîçbûn û tewazûyê. Digel îltîfatên Mezinê me Resûlûllah jî, ew nikare xwe mirovekî xilasbûyî bibîne û îmana sehabîyekî wilo ku dilê wî di bara encama wî de dilerize..

Dîsa rewşa **Xalid bin Welîd**ê ku ji bo medhdana Resûlûllah bûyî mezher jî ji bo vê hessasîyetê mîsaleke dîtir e;

Wî serkeftinên bêjimar ji bo tarîxa Îslamê hedîye kirine. Di roja **Mûte**’yê de tam neh şûr perçe bûne, wî bi sê hezar yekîneyên ordîya Îslamê çavê ordîya sed hezar kesan a dijminan tirsandibû. Wî li Yermûkê des-



121. Heysemî, VIII, 40-41; Zehebî, Sîyer, I, 549

tan nivîsandine. Ew fetihkarê Sûrîye ye. Ew bi îfadeya nebewî “**Şûrê Xuda**” ye. **Xalid bin Welîd** di sala 21’ê hicrî de li Himûsê nexweş ketibû. Hevalên wî yên sîlahan li cemê bûn. Dema wî dikir wefat bike, şûrê xwe ji hevalên xwe xwest. Rahişte qebza wî, bi şefqet destê xwe bi ser de bir û anî. Piştre mûhasebeyeke wijdanî kir û wiha got:

“-Çendîn şûr di destê min de perçe bûn.[122] Ev şûrê min ê dawî ye ku ewê mirina min bibîne. Tişta ku min zehf ğemgîn dike ev e; ev Xalid ê ku heyata wî tev li meydanên cengê derbas bûye û wî rûyê nivînan nedîtiye, wekî bêçareyan li ser nivînê dimre. Hîç ti sehabîyekî Resûlûllah li ser nivîna reheta xwe nemiriye; yan ew li meydanên cengê, yan jî li welatekî dûr dema dînê Îslamê belav dikir li ğerîbîyê şehîd bûye.

Ax Xalido! Şehîd nebiwo Xalido!.. Ji bilî mertebа şehîdîyê meqamek nema ku ez negihamê. Di wicûda min de cihê bostekê nîn e ku bi şûr, yan jî bi rimê birîndar nebûbe. Ma dawîya mirovekî ku di dirêjahîya emrê xwe de ji bo belavkirina dînê Îslamê her di herban de hesp dane ğaran û bazdan wê li ser nivînê bibûye?! Haleveku min mirina xwe her li meydana şerran li ser hespê xwe dema min ji bo Xuda li dijî dijmin şerr dıkır wek şehîd çavnêrî dikir.”

Piştre wî got:

122. Li Buxarî, Meğazî, 44’an binêrin.

“-Ez wesîyeta xwe dibêjim, min rakin ser pêya.”

Dema ew rakirin ser pêya, wî got:

“-Min berdin, heta niha min şûrê xwe her hilgirtibû, êdî bila ew min hilgire.” Û birha xwe berda serê û got:

“-Ezê mirina xwe her wekî ku di şerr de bim li ser pêya pêşwazî bikim. Dema ez bimrim hespê min û şûrê min bidin agîdekî ku bêtirs di şerran de xwe di tehlûkan de noq bike. Ez dimrim û ji bilî hespê xwe û şûrê xwe ez nebûme xwediyê tiştekî din. Cebanê min bi vî şûrê min bikolin. Qehreman ji şingeşinga şûran zewq distînin.” Wî di nav hesreta ku karibe li meydana herbê şerbeta şehadetê vexwe, kete ser nivîna xwe, kelîma şehadetê anî û rûhê xwe teslîm kir.[123]

Ha sehabe-ê kîram, bes ne di peyv û navê xwe de, lêbelê di rasteqîne û kirina xwe de jî sehabe bûn. Ew bi her halên xwe ji bo Resûlê Xuda ram bûbûn. Digel ku heyata wan ji emelên salih tije bûye jî ti caran xwe xilasbûyî nedidîtin, tim û daîm di evdînîyê de ğeyret şanî dane. Divê ev hal, ji bo hemû mûmînan bibe nimûne.

Heqîqeten qîmetê manewî yê însên, bi maneya rastî wê di axretê de dîyar bibe. Ji bo vê tişta ku divê evd bike; di nav hissîyata hîçbûn û aczîyetê de li ser

123. Li Sadiq Dana, Îslam Qehremanlari, I, rûp. 68-69, Weşanên Erqam, Îstanbûl, 1990’an binêrin.

evdînîyê dewam bike. Em jî divê bi sebeb endîşeya nefesa dawîyê her nefesa xwe di nav ğeyreta jîyîna bi Kîtab û Sunnetê de derbas bikin û wekî Yûsuf vê nîyazê ji ser zimanê xwe nexin:

"... [Ey Rebbê min!] **Min wek misliman bimirîne û min bigihîne salihan!**"[124]

Bila em jibîr nekin ku em di kîjan meqamî de dibin bila bibin, em ji tayînkirina encama xwe û dîyarkirina encama dîgeran aciz û nekare ne. Di vê xusûsê de tim û daîm îhtiyaca me bi rehm, meğfîret û înayeta Rebbê me heye.

Çawa ku Ellah Teala di şexsê Resûlê Hezkirîyê xwe de ji me re gotiye:

"**Heta yeqîn** [mirin] **were te, her ji Rebbê xwe re evdînîyê bike!**"[125] Bi vî awayî ferman li me kiriye, ji me re gotiye, heta bi nefesa dawîyê heyateke evdînîya li ser îstîqametê bijîn.

**Cenabê Heq bi lutf û kerema xwe aqîbeta me bi xêr bike.**

**Amîn!..**

124. Yûsuf, 12/101
125. Hicr, 15/99

# JI BAĞÊ HIKMETÊ ĞUNÇE

**Hezretê Elî** ferman dike, dibêje:

“Bi peyv û bizavên nuktedar û hikmetdar bêhna rûhê xwe vekin. Lewra wekî ku beden dikerixin û lawaz dibin, rûh jî wilo dikerixin.”

❁

Hikmetên ku dilê ğafil jidest dane, ew bes dikare bi rehle-ya tedrîsata ehlê dil, peyda bike...

# JI BAĞÊ HIKMETÊ ĞUNÇE

**Mezinê me Resûlê Xuda ferman dike, dibêje:**

"*Ji însanan hinek ên wilo hene ku ji bo xêrê kilîl, ji bo şerrê jî kilîd in. Hinek ên wilo jî hene ku ji bo şerrê kilîl, ji bo xêrê jî kilîd in.*

*Xwezî bi wan kesan be ku Xuda kilîlên xêrê dane destê wan! Xwelî li wan kesan be ku Xuda kilîdên şerrê dane destê wan!*"[126]

❁

"*Bes ji van herdu kesan ğibte tê kirin:*

*Yek, ew kes e ku Xuda Qur'an daye wî. Ew kes, bi şev û bi roj her pê ve meşğûl dibe, pê emel dike. Ewê din jî, ew kes e ku Xuda mal daye wî. Ew jî bi şev û bi roj vî malî înfaq dike.*"[127]

❁

126. Îbnûmace, Mûqeddîme, 19; Beyheqî, Şûeb, I, 455
127. Muslim, Mûsafirîn, 266, 267

"*Xudayê min! Ez, ji îlmê ku feyda nade, ji qelbê ku natirse, ji nefsa ku têr naxwe û ji dûaya ku bersiva wê nayê dayîn, xwe diavêjim ber penaha te*."[128]

❁

Mezinê me Pêğember, di hinek dûayên ku piştî nimêjên şevê dikirin de wiha nîyaz dikir, digot:

"*Xudayê min! Ez ji te rehmeke wisan dixwazim ku tu wê ji cem xwe didî, vêca tu bi wê rehma xwe;*

*dilê min pê hîdayet bikî,*

*karên min pê kom bikî,*

*bela-wela-bûna min pê bixî nîzamê,*

*îmana kamil pê bidî rûhê min,*

*emelê salih ji bo zahirê min [lutf bike],*

*temîzî û îhsanê ji bo emelên min îhsan bike,*

*îstîqameta ji bo riza'ya xwe mûnasib ji min re îlham bike,*

*dostê ku hogirîya min pê were ji min re lutf bike,*

*û min pê ji her xirabîyan biparêze!*"[129]

❁

128. Muslim, Zikr, 73
129. Tirmizî, Deawat, 30/3419

**Hezretê Ebûbekr ferman dike, dibêje**:

“Çar kes ji evdên salih ên Xuda ne:

**1.** Ewê ku dema mirovê tobe kirî, dibîne [ji ketina wî ya ser rêya xilasîyê zewqê distîne û pê] keyfxweş dibe.

**2.** Ewê ku ji bo efiwa gunehkaran, lavlavê ji Rebbê xwe dike.

**3.** Ewê ku di ğiyaba biradînê xwe de, jê re dûa dike.

**4.** Ewê ku ji bo kesê ji xwe mûhtactir, arîkarî û xizmetê dike.

❁

“Ji şohretê bireve, da ku şeref bi dûv te bikeve.”

❁

“Ji mirinê re amade bibe, da ku heyata ebedî ji te re were bexşkirin.”

❁

“Vê baş zanibe ku emelek heye, Cenabê Heq dixwaze ew bi roj were kirin, wî bi şevê qebûl nake; emelek jî heye, dixwaze ew bi şev were kirin, wî jî bi rojê qebûl nake!”

❁

"Xudayê min! Çêtirîn emrê min bixe yê dawîyê, çêtirîn emelê min bixe yê dawîyê û çêtirîn rojên min jî bixe roja çavpêketa te."

❁

**Hezretê Ûmer ferman dike, dibêje:**

"Kesê ku ez bêhtir jê hez dikim ew kes e ku eyb û qusûrê min ji min re dibêje."

❁

Însanekî li cem Hezretê Ûmer bi sitayîş behsa însanekî din dikir. Hezretê Ûmer sê pirs ji wî kirin:

**1.** Te hîç rêwîtî bi wî re kiriye?

**2.** Te pê re danûstaneke wekî ticaretê, mûameleyeke îctîmaî kiriye?

**3.** Te pê re sibeh-êvarê cîrantî kiriye?

Dema wî kesî di bersiva van hersê pirsan de jî got: "Na", Hezretê Ûmer jê re got:

"-Ez bi wî Xudayî kim ku ji wî pê ve ti îlah nîn in, tu wî nas nakî!"

❁

Ji bo hûn însanan rast bikin, divê pêşî hûn xwe rast bikin. Cahiltirînê însanan ew kes e ku axreta xwe ji bo dinyaya dîgeran, difiroşe."

❁

**Hezretê Osman ferman dike, dibêje:**

“Mûmînê heqîqî di nav şeş texlît tirs de ye:

**1.** Ew ditirse ku Xuda îmana wî jê bistîne.

**2.** Ew ditirse ku melaîket wan tiştê wî binivîsin ku ewê roja qiyametê wî riswa bikin.

**3.** Ew ditirse ku şeytan -eleyhillane- emelê wî pûç bike.

**4.** Ew ditirse ku melekê mewtê/Ezraîl, di ğefletê de wî ji nişka ve bigre.

**5.** Ew ditirse ku bi dinyayê serxweve biçe û ji axretê ğafil bibe.

**6.** Ew ditirse ku zêde bi zar û zêçên xwe bilebike û bi awayekî têr û tam bi zikrê Xuda ve meşğûl nebe.”

❁

“Çar tişt hene ku zahirê wan fezîlet e, batinê wan jî ferz e:

**1.** Bi salihan re rabûn û rûniştin fezîlet e, xwe bi wan girtin ferz e.

**2.** Qur’an-xwendin fezîlet e, bi wê emel-kirin ferz e.

**3.** Zîyaret-kirina qebran fezîlet e, xwe jê re amade-kirin ferz e.

**4.** Zîyareta nexweşan fezîlet e, ji wan îbret-girtin ferz e.”[130]

❁

**Hezretê Elî ferman dike, dibêje:**

“Emelên ji hemû emelan zortir çar xeslet in:

**1.** Efûkirina di dema hêrsbûnê de ye.

**2.** Comerdî-kirina di dema hewcedar-bûnê de ye.

**3.** Xwe parastina ji xirabîya nefsa xwe di cihên girtî û tenha de ye.

**4.** Rast-gotina li hemberî wî kesî ye ku mirov jê ditirse, yan jî menfîetekê jê hêvî dike.”

❁

“Du ajar hene ku ez nizanim kîjan ji wan bêhtir keyfa min tîne:

**Ya yekê** ev e; kesê bi hêvîya ku ezê hewcedarîya wî pêşwazî bikim bi semîmîyet tê dev min û arîkarîyê ji min dixwaze.

**Ya Duduyan** jî, ev e; Xuda Teala, arzûya wî kesî bi wasîteya min bîne cih, yan jî wê hêsan bike. Ez, ji

130. Îbnû Hecer, Mûnebbîhat, rûp. 14

holê rakirina tengasîya mislimanekî li ser xwedîbûna ji bo zêr û zîvê ku dinya jê tije dibe, tercîh dikim."[131]

❁

"Wî nemerdî nexe nav şêwra xwe ku te bi feqîrbûnê ditirsîne û nahêle tu qencîyê bikî, wî newêrekê ku li hemberî karên mezin ezma te dişikîne û wî çikûsê ku bi zulmî xirabîyê ji te re dixemilîne! Lewra nemerdî, newêrekî û çikûsî arzûyên curecur in ku hemû di sû-a zenna bi Xuda de, digihîjin hev."

❁

"Dilê xwe bi şîretê bide jîyandin, bi hikmetê rohnî bike."

❁

**Bayezîdê Bistamî ferman dike, dibêje:**

"Sofî ew kes e ku Qur'ana Pîroz dixe destê rastê xwe, Sunneta Senîyye dixe destê çepê xwe; bi çavekî xwe li Cennetê, bi çavê xwe yê din jî li Cehennemê dinêre; dinyayê dixe terefê jêra xwe û axretê li jora xwe dipêçe, dikeve îhraman û di navbera herduyan de dibêje; "lebbeyke Ellahumme lebbeyk!/ferman bike Xudayê min, ez li ber emrê te berdeste û hazir im!" û bi ber Mewlayê xwe ve baz dide."

❁

131. Elî el-Mûtteqî, VI, 598/17049

“Heke hûn yekî bibînin ku wa ye keramet jê re hatibin dayîn, heta ew li hewayê çarmêrkî rûniştibe jî zinhar pê nexapin! Lê binêrin ka ew emr û nehîyên îlahî rîayet dike, gelo ew hidûdên îlahî mûhafeze dike, gelo ew bi durustî hukmên şer‘î tîne cih! [Di rewşa berevajî de ev halê wî, ne keramet e, lê îstidrac e.]”

❁

**Ebû’l-Hesen Xereqanî ferman dike, dibêje:**

“Xuda hûn temîz anîne dinyayê; naxwe hûn jî lewitî neçin hizûra wî!”

❁

“Ji Tirkistanê heta bi Şamê strî ketibe telîya yekî ew ketiye telîya min. Ew kevirê ku li lingê yekî ketibe, wî lingê min êşandiye. Heke di qelbekî de huzn hebe, ew qelb, qelbê min e.”

❁

“Xuda Teala di piştî îmanê de tiştekî ji dilê temîz û zimanê rastgo mezintir ji bo bendeyê xwe îhsan nekiriye.”

❁

“Du kes hene fitna ku wan di bara dîn de derxistiye, şeytan bi xwe jî nikare wê derêxe:

**1.** Ew alimê ku ji bo dinyayê çikûs [yanî alimê ku bi îlmê xwe emel nake, ji teqwayê dûr e û li ser komkirina malê dinyayê çikûs] e.

**2.** Ew sofîyê xav ê ku [ji îlmên dînî] mehrûm e.

❁

**Yûsufê Hemedanî ferman dike, dibêje:**

"Ew kesê ku di rêya dîn û şerîetê de naçe, heke ew her roj kerametekî jî şanî bide, ew bi dûv şeytên ketiye. Ew kesê ku bawerîyê bi tiştekî li dijî Sunnetê bîne, heke wî îlmên dinyayê jî [tev] jiber kiribin, ew ğeyretên wî ji bo wî bes xwe westandin e."

Wekî ku di ayeta pîroz de jî hatiye gotin:

"**Xebat kiriye** [lêbelê hewante] **westîyaye**."[132]

❁

**Mûhemmed Arif Rîvgerî ferman dike, dibêje:**

"Destpêka terîqetê, seadeta wê, kilîla wê û fermana dîn ev e; mirov karibe di nav tobe û xuşû'ê de bi ber Xuda ve îltîca bike! Tobe, mûhîmtirîn wirda mûmînî ye."

❁

"**Arif** ew kes e ku di her nefesa Xuda daye de qelbê xwe tam bide wî û bila ev hal, heta nefesa

132. Ğaşîye, 88/3

dawîn jî dewam bike! Di heman demê de ev halê wî, ji însanan jî veşartî bimîne!”

❁

**Seyyîd Emîr Kulal ferman dike, dibêje:**

“Heke hûn şevên xwe bi îbadetê derbas bikin û ji birçîya pişta we wekî têla kemançê zirav jî bibe, heta luqma we û xirqa we ne helal be, hûnê nikaribin bigihîjin meqsedê!”

❁

**Behaûddîn Şahê Neqşîbend ferman dike, dibêje:**

“Rêya ehlê dil ev e; emelê salihê xwe hindik dibîne, di halê tewazû, hîçbûn, tinebûn û aczê de dibe, emelên xwe bi xeta û halên xwe nuqsan dizane. Di xusûsa şikandina enanîyeta nefsê de tiştekî dî bi qasî ku mirov xwe bi xeta bibîne, bihaviltir nîn e. Yek ji hikmeta ku pêğember bi xwe jî ketine xetayên ğeyrê-îradî yên bi navê “zelle” jî ev e.”

❁

“Ya Rebbî! Xelk ji te ditirse, ez jî ji xwe ditirsim! Lewra ya Rebbî, min tim ji te qencî û ji nefsa xwe jî tim xirabî dîtiye.”

❁

**Ûbeydûllah Ehrar ferman dike, dibêje:**

“Min ev rê, ji kitêbên sofîyan hîn nebûme, berevajî vê, min ew ji xizmeta xelk û mexlûqatan qut kiriye... Herkes di rêyeke cuda de birin, em jî di rêya xizmetê de birin. Ha ji ber vê xizmet; usûleke wisan e ku ez jê razî me û ez jê hez dikim. Ez ji bo mirovên ku îstîdat û liyaqeta wan bibînim, xizmetê tewsîye dikin.”

**Mûhemmed Zahid ferman dike, dibêje:**

“Edebên tesewwifî, ew çira ne ku rêya wî kesê dixwaze di vê rê de bipêşve here, rohnî dikin. Her kî bixwaze di alema manewî de bipêşve here û bibe xwedîyê hal, bêşiwar bila ew edebên ku dostên Heq ew talîm û tetbîq kirine, rîayet bike.”

❁

**Îmamê Rebbanî ferman dike, dibêje:**

“Ji bilî tiştê ku Xuda ji wan razî ye, bi tiştekî din razî nebin, wan arzû nekin! Ev [arzûyên nefsanî] hemû, li gorî ku ewê di nefesa dawîya me de bi dawî bibin, naxwe hema ji vêga ve terka wan bikin!.. Dostên Xuda bi [nefsa xwe re mûcadele dikin û bi] arzûya xwe terka wan dikin.”

Lewra hatiye gotin:

“*Berî mirinê hûn bimrin!*” Yanî berî mirin were, terka îhtîrasên nefsanî yên xwe bikin.

❁

**Mûhemmed Masûm Sirhindî ferman dike, dibêje:**

“Hem li ser îbadet û taetê bibin, hem jî bi sebeb qusûrên xwe yên di van îbadetan de îstiğfar bikin! Emelên ku hûn dikin [daîmî wan nuqsan bibin û hîç ti zemanekî wan] ji bo Xuda (kafî û tam) layiq nebînin!

Yekî ji mezinan wiha gotiye: “*Emelê salih bike û îstiğfar bike!*” Ha rêya evdînîyê ev e.”

“Hîç ti mehrûmekî ji edebê, negihaye cenabê Heq.”

❁

**Ebdûllah Dehlewî ferman dike, dibêje:**

“Em hatin bağê cîhanê ji bo gulan kom bikin, lêbelê em ji bo strîyan hemmaltîyê dikin.”

(Li vê cîhanê xezîneyeke mûhteşema seadetê wekî dostbûna ji bo Heq heye, çi hezîn e ku mirov li dûv arzûyên suflî yên nefsê were kişkişandin!..)

❁

“Mûhîmtirîn sebebê ku mirov li cem Cenabê Heq qebûlê bibîne û meqbûl bibe ev e; mirov tam bi şikestina dil û di nav evdînîyê de berdewam zikr bike û berê xwe bide Ellah Teala.”

❁

“Ew kesê ku bi dûv arzûyên nefsa xwe bikeve, ewê çawa karibe ji Xuda re bibe evd?!”

❁

**Mewlana Xalidê Beğdadî ferman dike, dibêje:**

“Pirr asêpirs e ku berî tu bikevî rêya seyr û silûkê yanî hê nebûyî sofî, tu karibî di rêwîtîya ebedîyetê de li ser îstîqametê birêve herî. Lewra nefsa emmare ya ku mirov dibe helakê, curecur bela, xefk û xapxapokên wê hene.

❁

“Heke kesek ji kitêban hemû îlman (yên dînî) ji ber bike jî dîsa ne mûmkin e, ew ji hîlebazîyên nefsê xilas bibe. Ev hîlebazî, bes bi terbîye û teserrufa mûrşidekî kamil berteref dibin. Heke na evd, ji bo tecellîyên manewî yên ku dilê wî mamûr [ava] dikin nabe mezher û di rêya dînê mûbîn de bi semîmîyet û îxlas bipêş nakeve.”

❁

“Kesekî ku bi Îslamê mûşerref bûbe çawa dibe ku ew şevê tevî bide xewê û emanetê Ellah Teala mûhafeze neke?! Yek ji mûhîmtirîn emanetên Cenabê Heq ji me re jî, di wextên seherê de rabûn û rawestina di qîyamê de ye.”

❁

**Seyyîd Taha'yê Hekkarî ferman dike, dibêje:**

"Emelên xwe binax nekin! Di serî de xwe ecibandina însanî [bi sebeb emelên ku kirine, xwe mezinkirin û serxweve-çûna wî]; wekî di mezarî de binaxkirina emelên xwe û tinekirina wan e."

❁

**Mûhemmed Es'ed Efendî ferman dike, dibêje:**

"Ji ber ku letîfe tev ji tesfîyê re hewce ne, zerûrî ye ku rêwîyekî Heq, bi dorê hemû letîfeyên xwe ji bo zikr kirin ê fêr bike. Dema ğusl ji însanekî re lazim bibe, çawa lazim e ku ew her deverên wicûda xwe heta her nuqteyeke bedena xwe bişoyê, eynî wisan ew kesê ku dixwaze alema dilî ya xwe tesfîye bike jî, divê ew jî bi hemû letîfeyên xwe, heta bi her zerreyeke wicûda [bedena] xwe, zikr bike.."

❁

"Cenabê Heq çavê dilê we bi nûr bike! Çawa di her nuqteyeke pela gulê de gulav mewcûd e, eynî wekî wê bila her zerreyeke qîmetdara wicûda [laşê] we jî bi bêhna xweşa mûhebbet û zikrê daîmî sipehî bibe!.."

❁

"Di rêya gulistana evînê de mirov ji strî natirse! Ez, ji ser her strî bi sedan ğunçeyan berhev dikim!"

❁

“Ez li nav bostanê derwêştîyê ji îzdîrabê [êş û janê] zewq distînim. Heke ez balgehê xwe ji strîyan çêkim jî, di xewna xwe gulê dibînim!”

“Yek ji gunehên ku li cem Xuda, dibe sersebebê mehrûmîyeta evdan heta yê yekê, di xwe de dîtina heyberekî ye, yanî enanîyet e.”

❁

**Mehmûd Samî Remezanoğlû ferman dike, dibêje:**

“Ji bo îcabetbûna dûaya evdî şertê pêşî; bi luqma helal, îslahkirina alema dilî ye, şertê paşî jî, îxlas û hizûra qelb e. Yanî bi awayê layiq berê xwe dana Cenabê Heq e. Heke ew luqma ku dikeve dev ne helal be, zehf zor e ku ew kes bi îxlas û bi hizûr bibe, masîmayî terk bike û berê xwe bide Heq..”

❁

“Divê sahibê îstîqametê, wekî çîya mûsteqîm be. Lewra çîya, çar elamet hene:

**1)** Ji germê nahele,

**2)** Ji sermayê qeşa nagire,

**3)** Ji bayê naqulibe,

**4)** Lehî nikare wî li ber xwe bibe.

❁

**Xwace Mûsa Topbaş ferman dike, dibêje:**

“Mezinan îfade kiriye, gotiye; tezkîya nefsê ferzû’l-eyn e.”

“Ji gellek kesan were ku ji hêla maneyî ve tereqqî-kirin, bes bi îbadetên zêde ye. Na, tereqqîya heqîqî, bi xwe zanîna di hizûra îlahî ya Cenabê Heq de û bi tenzîmkirina heyata xwe di îstîqameta Sunneta Senîyye de dibe. Gellek kes hene ku îbadetê nafîle’yê van zehf in; lêbelê ew li helal û heramîyê diqqet nakin û hewl nadin ji bo exlaqê Îslamê ji xwe re bikin exlaq. (Lewra) Ew, zemanê vala’yê xwe bi gotegot û ğeybetê dibûrînin. Hema çi bikeve destê wan, wî li gorî arzûyên nefsanî yên xwe bikartînin. Haleveku evên ha, xwezî wan îbadetên nafîle’yê xwe kêm kiriba, di xusûsa xwedî exlaq-bûnê de ğeyret kiriba û di mijara heq-hiqûqê de şîyar bibûna!”

❁

“Rasteqîne’yên ku evdî digihînin marîfetûllahê, yanî tuxm di wicûdê [bedenê] de hazir in, çavnêrîyê dikin. Ji bo zîğ-dana van hemd, şukr, zikr û fikr-kirin lazim e.. Serê îlmê marîfetê, tefekkur-kirina li ser sir-rên hunerê îlahî ye.”

❁

“Însan di netîca mûraqebe û tefekkura ku bi qelbê salim û ji masîwa paqijkirî hatibe kirin de dibe xwedî

gellek agahîyên rûhanî yên ku nikare wan ji kitêban hîn bibe."

❁

"Xilasîya me, selamet û seadeta me, di her hal û karî de, yanî di her nefesê de, di her qevz û gavê de, di her texlît hal û hereketên me de di çûna tam a li pey mezinê me Hezretê Resûlê Ekrem de, bi xwe boyaxkirina bi boyaxa wî, bi exlaqê xwe kirina wekî exlaqê wî û bi xebat-kirina ji bo bi ti awayan veneqetîna ji Sunneta Mûhemmedî ya wî mûmkin e.."

❁

**Mewlana Celaleddînê Rûmî ferman dike, dibêje:**

"**Şems** -quddîse sirrûh- tiştek li min hîn kir:

"Heke li dinyayê serma bide mûmînekî tenê jî heqê me nîn e em xwe germ bikin."

Ez jî dizanim ku li dinyayê gellek mûmîn hene, serma dide wan; êdî ez jî nikarim xwe germ bikim!.."

❁

"Dema gulê strî tehemmul kir, wê bêhna wê xweş kir."

❁

“Tu çi qeder zengîn bî, tu bes bi qasî karibî bixwî, dixwî. Heke tu cêr di behrê de noq bikî, ew bi qasî karibe wergire, avê werdigre, ya din jî dimîne.”

❁

“Hîç te genim çandîye û te dîtiye ku [di şûna wî de] ceh şîn bûbe?”

❁

“Di vê seherê de îlham ji ser min qut bû. Min fehm kir ku çend luqmên bi şubhe çûne bedena min. Zanîn jî, hikmet jî ji luqma helal dizên. Evîn jî, merhemet jî berê [mehsûlê] luqma helal in. Heke ji luqmekekî ğeflet were meydanê, zanibe ku ew luqme bi şubhe ye, yan jî heram e.”

❁

“Însan dişibihe daristanê. Çawa li nav daristanê bi hezaran beraz, gur û heywanên xuy temîz û xuy pîs hene, di însên de jî her cure sipehîtî û mekrohî hene.”

❁

“Heke tu dixwazî wekî naverojê rohnî bidî, divê tu nefsa xwe ya wekî şevê bişewitînî.”

❁

“Ram-bûna ji bo dostekî Heq, ji tac-bûna serê padîşahan baştir e.”

❁

“Bi sedan kerem û îhtîşamên avê hene ku; gemarê qebûl dike û qirêjên wê temîz dike. [Tu jî wekî avê ezîz bibe.]”

❁

“Heta rêzanê te hereket, tu hereket neke. Ewê ku bêser hereket dike, dibe dûv.”

❁

Ew kesê ku qelbê wî û halê wî yek nebin çendan sed zimanê wî hebin jî dîsa ew lal e.”

❁

Ewê ku dostê baş ê wî hebin, îhtiyaca wî bi eynê nîn e.”

❁

“Kî gotiye gul, di hîmaya strî de dijî? Îtîbara strî bi saya gulê ye!”

❁

“Heywan çawa bi qabilîyeta xwe biha qezenc dike, însan jî wilo bi şiğulandina eqlê xwe û qelbê xwe biha qezenc dike.”

❁

“Hey kesê ku di ber nan de cewhera xwe ya îmanê diavêje, ey rebenê ku bi lipeke ceh xezîneyekê

difiroşe! Nemrûd, dilê xwe bi dest Îbrahîm ve berneda; lêbelê canê xwe ji pêşûyekê re teslîm kir."

❁

"Divê dilê mirov bi wî derdî bişewite ku ji hindikbûna îmanê hatiye meydanê; lewra dermanê wî derdî nîn e."

❁

"Gellek masî hene ku dema di nav avê de ji her tiştî ewle bûne ji ber hirsa qirika xwe bi şewkî hatine girtin."

❁

"Gemara di dil de bi avê paqij nabe; lê bi hêstirên çavan paqij dibe."

❁

"Hîç ti eyneyek dubare nebûye hesin. Hîç ti nanek negihaye û di girîşê de nebûye genim. Hîç ti tirî êdî nebûye harsim. Hîç ti fêkîyê çêbûyî dîsa nehatiye ser halê xwe yê kerrikbûnê. Naxwe bigihe, kamil bibe û ji xirabbûnê xilas bibe! (Nekeve xefka nefsê!)"

❁

**Şêx Sadî Şîrazî ferman dike, dibêje:**

"Heke ğerîbek were ber derîyê te, wî destevala neşîne. Xuda şanî nede, belkû rojekê tu jî bibî ğerîb, li ber derîyan bigerî.

Pirsa hal û xatirê mirovên dilbirîn bike, li wan meyzîne. Belkû rojekê tu jî bikevî wê wezîyetê.

Tu yê ku ji bo xwestina tiştekî naçî ber derîyê ti kesî; wek şukrane ji bo vê, wî hejarê ku were berîyê te neqewitîne, madê xwe ji wî ne xweş neke, bi tebessum wî pêşwazî bike..."

❁

"Dostên Heq ji dikanên ku ti kes naçe wan, danûstana xwe dikin."

❁

**Ehlê Hikmetê Wiha Ferman kirine, gotine:**

Sê tişt sirrên seadetê ne:

**1.** Bûna xwediyê tewazûyê,

**2.** Bi qenaetê zengînbûn û hizûr dîtin,

**3.** Karîna zehf zêde tefekkur-kirina mirinê û îdrak-kirina ku heyata esasî, heyata axretê ye.

❁

Dinya, bi sê tiştan dibe Cennet:

**1.** Bi zimanekî zerîf ê ku dilan fetih dike,

**2.** Bi destê comerd,

**3.** Bi dilekî ku bûye dergehê rehmê.

❁

Sê kes ji hêla maneyî ve di tarîtîyê de mane:

**1.** Ew ğafilê ku ya dibêje, nake,

**2.** Ew ehmeqê ku digel êsîrê kibra xwe ye jî dibêje ez ehlê fezîletê me,

**3.** Ew nezanê ku ji feyza dil bêpar e.

❁

Mûmîn, di sê cihan de bi Xuda re di halê xelwetê de ye:

**1.** Di tenêtîya ku ji qerebaliğê naêşe de (wehdeta di nav kesretê de),

**2.** Dema rûyê bê-umîdekî, yanî ğerîbekî, bêkesekî bi umîdê dikenîne,

**3.** Dema ew xêra mûsîbetan dihizire, wan bi hemd, sebr û şukrê pêşwazî dike.

❁

Ji nav însanan, sê kes xwe dizanin:

**1.** Ewê ku ji bo teqdîrê rizayê nîşan didin,

**2.** Ewê ku ji gotina navê xwe fihêt dikin (ehlê tewazû û mehwîyetê),

**3.** Ewê ku bi nêrîna Xaliq li mexlûqatan dinêrin.

❁

Sê texlît însan ji Xuda dûr in:

**1.** Ewê ku rehetîya xwe difikirin û ji xizmetê direvin,

**2.** Ewê ku hessasbûna xwe dixin behane û ji kenarên jan û sefaletîyan nêzîk nabin,

**3.** Ewê ku bi koma ğafilan re dibin.

❁

Sê texlît însan, mizgînîya dîtina Xuda ji wan re hatiye dayîn:

1. Ew qelbên safî û semîmî (xwedî qelbê selîm) yên ku bi Cenabê Heq re dost in,

2. Ewê ku di reş-tarîya şevê de taverojê dibînin [ewê ku di nav wecdê de seheran îhya dikin],

3. Ewê ku daîmî di nav fikara axretê de karin sermayê xwe yê heyatê di rêya Heq de binirxînin.

# Ferheng

**-A-**

**Aferandin**: Xuliqandin. Çêkirin. Anîna wicûdê. Peydakirin.

**Ağa**: Mezinê gund, efendî, berxwe-ketî.

**Ahengsaz**: Mûtabiq, hevrey û dîtin.

**Aîdîyet**: Aîdbûn, rewşa aîdbûnê, xwedî-bûn, malik-bûn.

**Ajar**: Nîmet, kerem, qencî, bexş.

**Amadekarî**: Hazirî. Karbûnî. Îstîdad. Cahizîyet.

**Amîn**: Qebûl bike. Daxwaza me bîne cih.

**Aqîbet**: Dawî, netîce, encam, ekam.

**Arif**: 1. Zana, aşîna. 2. Ewê ku bi awayê layiq Heq Teala û berhemên wî fehm dike, wan dizane, bi îlmê xwe emel dike, bûye xwediyê îrfanê û gihaye zanîna kemal, merîfet û heqîqetê.

**Arîkarî**: Harîkarî, piştevanî, destegirî.

**Arzû**: Daxwaz, hewes, reğbeta dil, teleba ku ji kûrahîya dil tê.

**Awa**: Şekl û sûret.

**Axaftin**: Peyv, xeberdan.

**Axirzeman**: Serdema dawîya vê dinyayê ye. Dema nêzîkbûna qiyametê ye.

**Azad**: Serbest. Riha. Rizgar.

-B-

**Bağ**: Dehl, bexçe, bostan.

**Bajar**: Şehr, beled.

**Baqî**: 1. Sifetek ji sifetên Xuda ye. 2. Daîmî, Mayî û nemir. 3. Ewê ku dimîne û ji bilî van.

**Baqîye**: Jiber mayî, bi şûn de mayî.

**Bariz**: Eşkere, xuya, bilind, bala, dîyarde, bel.

**Batil**: 1. Pûç, beyhûde, derew, rizîyayî, yê nerast û neheq. 2. Bêhukm, ne derbasdar. Nerewa.

**Batin**: Navî, naverû, veşartî, nedîyar, nedîtber.

**Bêgane**: 1. Bê elaqe. 2. Ne naskirî, biyanî, ecnebî.

**Bende**: Kole, evd, girêdayî, girtî.

**Berbat**: Xirab, berba-ketî, bêkêr.

**Bereket**: Feyz, rêhtina xêran û ferehvanî ye. Xêr û xweşîya ku naqede, tam-jê dîtin e.

**Berteref**: Avêtina alîyekî, bêtesîrkirin, ji holê rakirin.

**Berze**: Winda, jidestdayî, neliber-çavan.

**Besîret**: 1. Dîtina bi dilî, dîtina rast û biendaz, jîrîtî, şûmbûn. 2. His, dîtina dûr, dûrebînî. 3. Firsend, fehmkirin, kûrbînî. Pêşebînî, dîtina bi qelb e. Dîtina bi qelbî, dîtina rast û bi endaz, dûrbîn, feraset, fehmkirin.

**Beşerî**: Însanî, mirovî, bi însanî re elaqedar.

**Beşerîyet**: Însanîyet, mirovahî, ne hovane.

**Bevken**: Tebessum, kenê bê dev vekirin e.

**Bey‘et**: 1. Hevpeymanîya ku bi zehfî bi girtina bi destan tê kirin û ew soza sedaqet û pêbendîyê ye ku ji bo serokê dewletê tê dayîn. 2. Ketina bin hukmranîya kesekî, îtaet ragihandin.

**Beyhûde**: Bê feyde, bê mûfa, li ber çav nayê girtin,

**Bêzar**: Reht, gazindker, nerehet, nememnûn.

**Bid‘et**: 1. Tişta ku eslê wê di dîn de nîn e, paşê derketiye holê. 2. Ew tişta ku di zemanê mezinê me Pêğemberê Xuda de nebû, piştre bi navê dîn derketiye holê û ketiye nav dîn.

**Bid‘etçî**: Bid‘etperest, ewê ku tiştên bid‘et diparêze û dike.

## -C, Ç-

**Candar**: Zindî, rûhber, xwedî rûh, giyanewer.

**Ceban**: Mezar, gor, gorin.

**Cehalet**: Nezanî, nefehm, tênegiha.

**Cehd**: Hewldan, ğeyret-kirin, kar-kirin, xebat-kirin, şiğûl-kirin.

**Cehennem**: Cihê ne xweş, dojeh, dozex, cihê şkencê, bîra kûr.

**Celbkirin**: Bi terefê xwe ve kişandin, kişkişandin, anîn, vexwendin, gazî kirin.

**Cemal**: Sipehîtî, xweşikahî, bedewî, delalî.

**Cemalî**: 1. Tişta ku li sifetên Xuda Teala yên cemalî vedigere. 2. Ewê ku bi mîzaca xwe xwediyê cemalê be, sipehî be, bedew be, lihevhatî be, lutfkar û dilovan be.

**Cemalûllah**: Sipehîtîya bêdawîya Heq Teala.

**Cenabê Heq**: Ji bo mezi-natî îfade-kirinê, bi meqsûda hurmetê tê gotin. Wek Cenabê Heq Xuda, cenabê Resûlê Ekrem.

**Cennet**: Bihişt, cihê xweş.

**Cerahet**: 1. Îltîhab-bûn, ew şij û edaba ku paşê di bin çerm de tê mey-danê. 2. Birîn.

**Cerbeze**: Xweşî zimanî, xweşaxêvî.

**Cezbe**: 1. Coş û heyecana gîyanî. 2. Di tesew-wufê de ev e ku Xuda Teala evdê xwe bi alîyê xwe ve bikişîne

û ew hal û wecda ku ji vê tê holê.

**Cîhet**: 1. Alî, teref, dîtin, rexê dîtinê ye. 2. Wesîle.

**Çak**: Baş, qenc, rind.

**Çand**: Kultur, rewşenbîrî, ronakbîrî, rewşenfikrî.

**Çandinî**: Zîraet, zad û dexl çandin.

**Çarçove**: Dora resman, sînorê tiştekî, çar alîyên tiştekî, hawîrdor.

**Çarîne**: Malika çar qafîye ye.

**Çek**: 1. Sîlah. 2. Seneda bankayan ji bo ticaretê. 3. Cil, lîbas.

**Çendî**: Gellek, zehf zêde.

**Çeşmê însafê**: Çavê însafê, nêrîna însafê, awira bi îtîdal, terefnegîrane û endazparêzî.

**Çewt**: Şaş, ğelet, nerast, nedurust.

**Çol**: Cihê ku însan lê najîn, cihê terikandî.

## -D-

**Darû'l-beqa**: Mala ebedîyetê, warê nemirinê, axret.

**Derûnî**: Ji kûrahîya hinavê, ji dil.

**Destavxane**: Tiwalet, avrêjxane, qedengeh.

**Dîgerkam**: Îsar, dîgerbîn; ewê ku dîgeran dihizire.

**Dînê mûbîn**: Ayîna eşkere, dînê rast, îslamîyet.

**Dirav**: Pere, bankanot, zêr û zîv.

**Dîrayet**: 1. Zekawet, agahî, têgihiştin, tijefehmî,. 2. Baladest-bûn, destbilindbûn, mûqtedirbûn.

**Dirûd**: Selat, şabaş û tebrîk.

**Dîsa**: Careke din, neqleke din, ji nû ve.

**Divê**: Gerek e, lazim e. Pêdivê ye.

**Doz**: Dawe, boçûn, hedef.

**Dûa**: Xwestin, daxwazkirin, lavlavkirin, bergerîn.

**Dûçar bûn**: Mûbtela bûn, bela-lêketî, pêvedayî, hatî-girtî, pêgirtî.

**-E-**

**Ebedî**: Bêdawî, daîmî, herûher, heta hetayê.

**Ebes**: Pûç, bêhavil, bêfeyde.

**Eczîyet**: Nekarîn, bêçaretî, bê qewetî.

**Eğniyaê şakirîn**: Eğniya, geljimareya **ğenî** ye. Bi maneya ğeniyan, zengînan, dewlemendan, maldaran, têrmalan, serwetmendan e. **Şakirîn** geljimareya **şakir** e. Bi maneya spasdaran, şukrdaran e. Yanî ew zengînên ku bi înfaqkirina malê xwe li ser wechên xêrê, şukrê nîmetbexşê xwe Ellah Teala dikin.

**Eğyar**: Geljimareya ğeyr e. Dîgeran, biyanîyan, ecnebîyan. Di tesewwufê de; mirovên ne ji terîqetê, dîgerên me.

**Ehkam**: Geljimareya hukman e. Yanî hukm û ferman.

**Ehlê sunnet wel-cemaet**: Ew pirranîya pêbendên mezhebên dîtirên îslamê yên li derveyî şîîyan, ewên ku di îtîqad û bawerîyê de li pey rêç û şopa Pêğemberê Xuda û sehabîyên wî diçin.

**Ehlê terîqê**: Ewê ku peyrewê terîqeteke sofîyan e, terîqetgir.

**Ehsenê teqwîm**: 1. Awayê sipehîtirîn û tekûztirîn. 2. Însan, beşer, mirov.

**Ehwal**: Geljimareya **hal** e, rewş, wezîyet, dana Xuda, halên manewî.

**Eleyhillane**: Lanet li wî be! Dema navê şeytan, Îblîs tê gotin, ev hevok tê bikaranîn.

**Eleyhisselam**: Silav lê bin. Dema navê pêğemberekî tê gotin, bi meqsûda rêz û hurmet girtinê ev hevok tê bikaranîn.

**Emelê salih**: Ew karên xêrê, îbadet û xuyahîyên exlaqê xweş in. Hem jî kirina mûsteheb, wacib, ferz û sunnetan e, ji bo

razîkirina cenabê Heq Teala.

**Emelî**: 1. Bi emel, kar û kirinan re elaqedar. 2. Ewê ku xwe li ber kar digre, tetbîqî, ne teorî, ne nezerî.

**Enanîyet**: Ezîtî, ezperestî, egoîstî.

**Enbîya**: Geljimareya **nebî** ye. Bi maneya nebîy-an, resûlan, şandeyan, qasidan, pêğemberan e.

**Encam:** Netîce, ekam, eqî-bet, dawînek, paşîya kar.

**Endam**: Aza, organ û her beşên tiştekî ne.

**Eqîde**: Îtîqad, îman, baw-erîya dînî.

**Eqlê selîm**: Ew eqlê ku gihaye selametîyê, ew hesta rastgîr, ew eqlê ku dikare qerar û biryarên rast û durust bide.

**Eqlî**: Ew tiştên eqlber, meqûl, bi eql re elaqe-dar.

**Erkan**: 1. Ruknan, sitûnan. 2. Esas, bingeh, hîm.

**Erozyon**: Hatin xwarina axê, sifetê xwe yê şînkirin û berhemdanê windakirin, bi-çol-bûn.

**Erzê endam**: Qama xwe şanîdan, derketina holê, hate dîtin, xuya bû.

**Esalet**: Zadeganî, kurebavî, kokdarî.

**Eser**: Berhem, karpêk.

**Esfele safilîn**: Jêra jêrîn, nizma ji hemû nizman nizmtir.

**Esfîya**: Safîyan, dilpaqijan.

**Esğerî**: Biçûktirîn, hindik-tirîn, kêmtirîn, nehê-jatirîn.

**Esebîyet**: 1. Qehrînok, raperestî, mîzac esebî. 2. Xizmtî, nêzîkatîya xwedîtîyê.

**Eshabê kîram**: **Eshab**, geljimareya **sehabî** ye, bi maneya hevaltî û pêrebûn e. **Kîram**, geljimareya **kerîm** e, bi maneya camêran, merdan e. Yanî hevalên camêr. Ji van herdu peyvên hevedu-danî meqsed hevalên

camêr ên pêğemberê Xuda ne. ewên ku bi çavên xwe pêğember dîtine, yan jî wî ew dîtine, îman pê anîne û li ser îmanê jî mirine.

**Eslî**: Ne ferîî, ne wekîl, esasî.

**Esma**: Geljimareya îsm e, bi maneya navan e.

**Esmau'l-husna**: Navên sipehîtirîn. Ev peyv, ji bo navên sipehîtirîn û şîrîn ên Xuda Teala tê gotin.

**Esteğfîrûllah**: 1. Ez lêborîna xwe ji Xuda dixwazim. 2. Ev hevok di cihê tewazû û nefsbiçûkîtîyê de tê bikaranîn. Yanî ez, ne layiqê vê îltîfatê me.

**Etqîya**: Mûtteqî, Xuda-nas, dînperwer.

**Ewam**: Xelk, amî, ne xewas.

**Ewlîya**: Welîyan, nêzîkên Xuda, qencên Xuda.

**Ewrad**: Geljimareya wird e. 1. Zikrê ku bi awayekî xusûsî tê kirin. 2. Ew beşên Qur'anê ku zehf tên xwendin, peyvên li zimanan.

**Exlaq**: Rewîşt, sinçî, exlaq.

**Ezamet**: 1. Mezinatî. 2. Kubarî, xwe mezinkirin.

**Ezamî**: Mezintirîn, zehftirîn, pirrtirîn.

**Ezkar**: Geljimareya **zikr** e. Zikran, dibîranînan. 2. Dubare dubare bîranîna Xuda bi navên wî yên dîyar û bi dûayên diyar.

## -F-

**Facir**: 1. Xuy-xirab, gunehkar. 2. Eyyaş, sefîh.

**Failê mûtleq**: Ellah Teala yê ku ji bo hemû tiştan kirdeyê heqîqî û failê rasteqîne ye.

**Fasiq**: Ewê ku fermanên Xuda nas û qebûl nake. Ewê jirêderketî, ewê ku gunehan dike. Ewê ku fesadîyê dike. Ewê ku xirabîyê dike. Jirêketî, gunehkar, xirabkar û berbatkar, ewê ku bi bêşermî û heya gunehan dike û

dema gunehan dike jî rûyê wî naêşe..

**Fecr**: Sipêde, elinde, berbang.

**Fecra kazib**: Ew ronahîya ku berî bengê dertê lê piştre dîsa ronahî winda dibe û tarîtî tê meydanê. Ji lewma jê re fecra kazib, yanî sipêda derewîn hatiye gotin. Di fecra kazib de nimêja sibehê ne sahîh e.

**Fecra sadiq**: Ew ronahîya sipî ya ku li hemberî sibehê di ufûqa şerqê de dest bi belavbûnê dike. Fecra sadiq, destpêka wextê nimêja sibehê ye.

**Fena'ya nefsê**: Berterefkirina arzû û îhtîrasên nefsê û ji Heq Teala re ram û teslîmbûn e.

**Feraset**: Jîrîtîya zêhnî, qabilîyeta zû fehmkirina tiştekî, ji rûyê wî fehmkirina amadekarî û exlaqê kesekî, hesta çêbûna tiştekî berî hatina wî ye.

**Ferheng**: Loğetname, komkara peyvan, embara gotinan, depoya çand û kulturê

**Ferman**: Emr, destûr, talîmat.

**Fermanber**: Memûr, emrber, binemr, fermanwergir.

**Fermandar**: Amir, emrdar, biemr, desthilatdar, qumandar.

**Fermanrewa**: Ewê ku hukmê wî rewa ye, meşrû ye, qanûnî ye. Padîşah, hukmdar, ewê ku ferman û emrê wî tên qebûlkirin.

**Feryad**: Qêr-kirin, gazî kirin, bi dengê bilind hewar û mededxwestin.

**Ferz**: Tişta ku her divê were kirin. Heke nebe, nabe.

**Ferza eyn**: Ew ferza ku her kes ji bo bicihanîna wê mûkellef e. Her divê ew wê eda bike. Kirina wê bivê-nevê ye. Divê her kes wê bi xwe wê eda bike,

çênabe ku yekî din ji ber wî ve wê eda bike.

**Fesahet**: Gotinî, hunerî, fehmberî, sade, xweş, zelal.

**Fesîh**: 1. Ewê ku li gorî qaîde û hûrnuqteyên zimanekî diaxive. 2. Ewê ku bi eşkerehî û zelalî û sadeyî dipeyive.

**Fewqelade**: Der-adet, zêdetirî adetê, mûcîze.

**Fexrê kaînatê**: Şehnazîya cîhanê, îftîxara kaînatê, bînahîya çavan Hezretê Resûlê Ekrem, serkehnîya şehnazîya hebûnê, Hezretê Pêğember.

**Feyz sitandin**: Îstîfadekirina ji hêla manewî ve.

**Feyz**: 1. Şîrînîya manewî, aramîya dil. 2. Destferehî û bereket. 3. Gihan û pêşveçûne. 4. Verêhtina xêr û bereketê, zêdebûn. 5. Bereket, zehf nîmet. Ajar û îhsan. Zewqên manewî.

**Fezîlet**: Bêhnpakî, qencîya exlaq-xweşî ye.

**Ficûr**: Gunehkarî, şemitîna exlaqî.

**Fikrîyat**: 1. Karûbarên bi fikr re elaqedar, karên ramanî. 2. Bîrdozî, îdeolojî, sîstema fikr û ramanî.

**Fisq**: Ji heddê xwe bûrîn. Guneh. Ji heqîyê veqetîn.

**Fitret**: Aferandin, xulqîyet, tebîet, cibîlîyet.

**Fitrî**: Aferandinî, xulqîyetî, tebîî, ji zikmakî.

**Fitûr**: Bêzarbûn, kerixîn, perixîn, bêhalbûn.

**Fizûlî**: Zêde, ne lazim, ne gerek, ne pêwîst.

**Fotoğraf**: Wêne, sûret, şekl.

**Fuqeha**: Geljimareya feqîh e. Ewê ku dikare ji ayet û hedîsan hukman derxîne û mislimantîyê rind fehm dike.

## -G, Ğ-

**Gewher**: Cewher, zînet.

**Giringî**: Ehemmîyet, tişta ku li pêşîyê tê.

**Girse**: Kitle, koma hevcinsan.
**Giyan**: Rûh û can.
**Global**: Gerdûnî, bi dinyayê re elaqedar, malê temamê dinyayê.
**Guhan**: Çiçikên pez û çêlekan e.
**Guhar**: Zêrê ku keç û jin dixin guhên xwe.
**Guhastin**: Neql-kirin.
**Guhdar**: Yê ku guhdarî dike.
**Guhêrber**: Ewê ku diguhere.
**Guhertin**: Teğyîrkirin.
**Guhêzerî**: Neqlîye.
**Gulav**: Ava gulê.
**Guneh**: Sûc, webal, karê nerewa, sezaber.
**Gurûh**:1. Qerebaliğ, civak, cemaet. 2. Beşek. 3. Qerebaliğa pûç, civaka nehezkirî, kerî.
**Gûzîde**: Bijarde, bijardî, mûmtaz.
**Ğafil:** Bêxeber, bêhay.
**Ğaye**: Emanc, hedef, boçûn, mebest, meqsad, nîyeta veşartîya di dil de.
**Ğazî**: Ğeziwkar, cengewar, şervanê şerrê pîroz, ewê ku ji bo dîn, welat û namûsê diçe şerrê neyaran.
**Ğebînet**: Heyf lê anîn, berketin, mixabinîya xwe derbirîn.
**Ğeflet**: Bêxeberî, hay ji xwe neman.
**Ğefûr**: Gunehbexş, efûkar, sûcbexş.
**Ğela**: Giranbûna bihayê pertalan, peyda nebûna tiştên lazim, tinetî, tengasîya maddî, belengazî, hejarî.
**Ğelet**: Şaş, çewt, nerast.
**Ğem**: Kul, keder, huzn, şîn.
**Ğemgîn**: Ğemxwar, kuldar, kedermend, şînkêş, hezîn.
**Ğemnak**: Dilbikul, dilbiêş, ğemgîn, hezîn.
**Ğenî**: Zengîn, maldar, têrmal, sermayedar, serwetmend.
**Ğenîme**: Destkeftîyên şerr.
**Ğeraîb**: Geljimareya ğerîb e. Bîyanî, nenas, nejime, nejimalê, nedost, ne yar.

**Ğerîb**: Bîyanî, nenas, nejime, nejimalê, nedost, ne yar.

**Ğerîbî**: Bîyanîtî, nenasî, ji welatê xwe dûrî.

**Ğews**: Bi maneya hewar û arîkarî ye. Ewê ku ji bo belavbûna dîn arîkarî û emekê wî çêbûne. Ewê ku bi hewarê ve tê.

**Ğeyb**: Nehazir, ne li ber çavan, ne elenî, nependî, berze.

**Ğeybet**: Li pey miroveki xeberdan, di nehazirîya wî de li dijî wî xeberdan, di nehazirîya yekî de axaftina ku li xweşîya wî naçe.

**Ğeyd**: Nehaşt, enir, jihevçûn, bihevre xebernedan.

**Ğeyr**: Jibilî, yê din, dîger.

**Ğeyrê îradî**: Bê vîyana xwe, bê hemdî xwe, bê haya wî jê hebe, ne di dest xwe de.

**Ğeyrê Muslim**: Ne misliman.

**Ğeyret**: Hewldan, cehd û xebata jidil.

**Ğezeb**: Hêrs, ğeyd, enirîn, ne razî bûn.

**Ğeziw**: Ceng, herb, qal, şerr.

**Ğibte**: Nîmeta ku li bal yekî din heyî, xwestina wê ji xwe re. Ew berevajîyê hesedê ye.

**Ğiyab**: Nehan, nependî, ne hazir, ne peyda, dûr bûn.

**Ğufran**: Efûbûn, biberefûyê ketin.

**Ğulam**: Xizmetkar, fermanberê ağayê gund.

**Ğuluw**: Ji heddê xwe bûrîn, zêdegavî, xurifîn.

**Ğunçe**: Kûmikê çîçekan ê hîn bel nebûyî, gûpik.

**Ğurbet**: Ğerîbî, dûrî welatê xwe, ne li nav ehlê xwe.

**Ğureba**: Geljimareya **ğerîb** e. Bi maneya ğerîban, biyanîyan, nenasan, rebenan, neji-rêzêyan, ewên ku jîyana dînî bijardine, derwêşan.

**Ğusl**: Şûştin, şûştina ji cenabetê. Paqijbûn, tehareta mezin.

**Ğuzat**: Geljimareya **ğazî** ye, ğazîyan, şervanan, cengaweran.

-H-

**Hadîsat**: Rûdan, bûyer, weqaet, hadîse.

**Halê xwe**: Rewşa xwe, wezîyeta xwe.

**Haletê rûhî**: Rewşa rewanî, wezîyeta psîkolojîk, haletê nefsî.

**Hamî**: hîmayetkar, ewê ku zêrevanîyê lê dike û diparêze.

**Hasil-bûn**: Çêbûn, waqî-bûn, hatin meydanê.

**Heddê layiq**: Bi qasî pêwîst,  di tixûbê xwe de, di sînorê xwe de, nekêm-nezêde, pîvana di biryarê de.

**Hejar**: Reben, feqîrok, belengaz, miskîn, jar.

**Hîmmet**: Arîkarîya manewî, îtîmada rûhanî.

**Hemmaltî**: Bar-hilgirî, barkêşî.

**Heqê mûkteseb**: Heqê qezenckirî, mafê bidestxistî.

**Herc û merc**: Tevlîhevî, teşqele, serûbin-bûn.

**Heseb**: 1. Biha, qîmet. 2. Esl, bavik, neseb.

**Hesenat**: Geljimareya **hesenet** e, yanî qencîyan, rewşên çak, karên xêrê.

**Heşrbûn**: Hatin komkirin, hatin cem hev, hatin berhevkirin.

**Hevhal**: Ewên ku halê wan dişibihin hev, di yek halî de ne, di halekî de hevalên hev in.

**Heyy**: Navekî sipehî ji navên Rebbê me ye, bi maneya xwedî heyat, sağ, zindî ye, ewê ku her tiştî dizane û qewet û hêza wî têra her tiştî dike.

**Hezret**: Hazir, îhtîram, sîyanet, rêzdarî ye. Ev peyv di axaftinê de di pêşîya navan de ji bo hurmetê tê bikaranîn. Ji bo mêran Hezretê, ji bo jinan jî Hezreta.

Kurtenivîsa wê jî Hz. e.

**Hicrî**: Mişextî, koçî, derbiderî, sersala Îslamê.

**Hîdayet**: 1. Rêya rast, rêya heq. 2. Îslamîyet. 3. Rê-şanîdan.

**Hikmet**: 1. Zanîna bilind. 2. Hakimtî. 3. Sedem, sebebê veşartî. 4. Xeberên exlaqî, gotina şîretkarî, nesîhet.

**Hîmmet**: Arîkarîya manewî, îtîmada rûhanî.

**Hissîyat**: Geljimareya **hissîyet** e, yanî hisan, hestan.

**Hurmet**: Rêz, xatirnasî, îhtîram.

**Husna zenê**: Geşbînîya di bara tiştekî yan jî kesekî de ye. Zena sipehî, gumana başîyê.

**-Î-**

**Îcabet**: Bi erênî bersivdana bang û gazîyê, daxwaz qebûlkirin.

**Îctîmaî**: Civakî, komelayîtî, sosyal, bi civakê re elaqedar.

**Îdealîze**: Ji bo halekî îdeal anîn, pêbendbûna bi ğaye û hedefeke ulwî.

**Îfa**: Edakirin, bicihanîn, ji stûyê xwe kirin.

**Îfrat**: Zêdegavî, serxweveçûn, sînorê xwe derbaskirin, ji tixûbê xwe bûrîn.

**Îhram**: Cilên ku di wextê edakirina ferza hecê de berendamê hecê li xwe dike û bi lixwekirina îhraman jî hinek tiştên ku berê lê helal bûn, jê re heram dibin.

**Îhtîmam**: 1. Bi diqqet û bêrî-kirin karkirin, bizav û livîn. 2. Diqqet nîşandan û baş meyzandin.

**Îhya**: 1. Ji nû ve heyat dan qezenckirin, hişyarkirin, vejandin, sağkirin. 2. Bi îbadetê derbaskirina wextekî ye.

**Îkmal kirin**: Bi kemalê gihandin, temamkirin, xilas kirin, tekûzkirin.

**Îkmal**: Bi kemalê gihandin, temamkirin, tekûz-kirin.

**Îktîfa**: Kafî-dîtin, têrêkirin, qenaet pê kirin.

**Îltîca**: 1. Xwe avêtin ber sitara yekî. 2. Baw-erbûna bi yekî, xwe sipartin. 3. Dûa û bergerîn.

**Îltîfat**: Rû-şanîdan, berê xwe dan, qencî-kirin, lutf-kirin, elaqe-şanîdan, bi semîmîyet pêre-elaqedarbûn, hal û xatir-pirsîn.

**Îmana tehqîqî**: Zanîna hemû mesele û mijarên bi îmanê re elaqedar bi delîl û sifet û tefsîlatên wan ve ye. Tesdîqkirin û bêşubhe bawerkirin e.

**Îmtîyaz**: 1. Bêhtir xwedî-heqbûna ji bo heq û îmkanên ku ji dîgeran re hatine naskirin, cihêwaz. 2. Xwedî ferq bûn, cihêwazbûn, çêtirbûn.

**Îmtîzac**: 1. Karîna tev-lîbûnê. 2. Hev girtin, ji hev re guncaw. 3. Xweş derbaskirin.

**În'îkas**: Eks-kirin, xuy-abûn.

**Înayet**: Arîkarî, lutf, meded-kirin, îhsan, giringî-pêdan.

**Înfaq**: Xerckirin, mesre-fkirin, mal li yekî-xerckirin.

**Înkar**: Nas nekirin, qebûl nekirin, danpênedan.

**Înkîşaf**: 1. Vebûn. 2. Mez-inbûn, pêşveçûn. 3. Derketina meydanê.

**Însîbağ**: Boyağbûn.

**Întîba**: Ew tesîr û şopa ku tiştek, şexsek, yan jî bûyerek li ser mirov dihêle.

**Întîbah**: 1. Şîyarbûn, hişyarî. 2. Ders-standi-na ji rewş û bûyerekê ye.

**Întîsab**: 1. Mensûb-bûn, hatin girêdan. 2. Ketina rêyekê, ketina karekî.

**Îqaz**: Şîyarkirin.

**Îrfan**: Pêzanîn, naskirin, têgihiştin, berketin. Kemala zêhnî ya ku

ji zekawet û tecrûbê tê. Iqrar û mûcazat. Waqifbûna ji sirrên îlahî, îman û heqîqetên Qur'anê.

**Îro**: Ev roj.

**Îrşad**: 1. Rêya Heq, rêya rast nîşandan, îqazkirin. 2. Di tesewwufê de ew e ku mûrşid rêya Xuda şanî mirîdên xwe bide.

**Îrtîhal**: Ji dinyayê koçkirina ji bo axretê, wefat, mirin.

**Îrtîkab**: Kirina tiştekî xirab, kirina tiştekî ku guneh pêktîne.

**Îsal**: Ev sal.

**Îstîdad**: 1. Meyla tebîî ye ji bo qebûl û qezenckirina tiştekî û qabilîyet e. 2. Eqilmendî ye. 3. Fehmkirin e. Amadehî, hazirî, qabilîyet.

**Îstidrac**: 1. Dijbera kerametê. 2. Derece xwestina bilindbûnê. 3. Ew xarîqûladeyên ku ji mirovên xirab xuya dibin. 4. Ewê ku digel bêqabilîyet û nehêjabûna xwe jî Xuda îhsan û kerem dane wî, vêca ew jî di şûna ku şukrê wan nîmetên wî bike de li ser kufr û îsyanê berdewam dike û hêrsa Xuda tîne ser xwe.

**Îstiğfar**: Efû-xwestina gunehên xwe ji Xuda Teala ye û bi komika "esteğfîrûllah"ê tobekirin e.

**Îstiğna**: Xwe hewce-nedîtin, xwe zengîn jimartin, bi pey rehma Xuda neketin.

**Îstihqaq**: 1. Heq-kirin, heq qezenckirin e. 2. Heqdesta ku ji bo xizmetekê tê xwestin.

**Îstîla**: Nixumîn, belavbûn, bidestxistin, dagirkirin, gihiştina dawîya meydanê, pêlê-kirin, perçiqandin, ğalib hatin.

**Îstismarkar**: Bi alet-kirina ji bo menfîeta xwe. Emilandin, bikaranîn. Nirxandin. Kedxwerî, mêhtingerî.

**Îşarî**: Îşaretkî, şanîderî, maneyên ji bilî maneya eslî.
**Îşev**: Ev şev.
**Îştîğala bi ebesê**: Mijûlbûna bi tiştên ne hewce, kelevajî û pûç re.
**Îtîbar**: 1. Qîmet jê re hatin danîn, hurmet jê re hatin girtin. 2. Ehemmîyet. 3. Şeref, heysîyet.
**Îtîdal**: 1. Zêdegavî-nebûn, navîngirî. 2. Wekhevbûn, hevkêş-bûn.
**Îtîmad**: Paldan, pêbawerbûn, lê-ewlebûn, piştpêsipartin.
**Îtîqad**: 1. Pêbendbûna bi fikrekê, bi bawerîyekê, îman pê anîn. 2. Bihayên bawerîya esasî. 3. Pêbendbûna qelbî ya bi Xuda, bawerîyeke qet'î.
**Îttîba**: Peyrewbûn, lipeyçûn, bidûvketin.
**Îz'an**: 1. Têgihiştin, fehmkirin, eql. 2. Îtaet, guhdarî-kirina li xeberdanê, stûxwehrkirin. 3. Terbîye, edeb.
**Îzafe**: 1. Layiq-dîtin, pêvegirêdan. 2. Tewandin, pêvekirin, lêzêdekirin.
**Îzhar**: Derxistina derve, kufşkirin, daxuyandin.

**-J, K-**

**Jan:** Êş, cefa, ezîyet, îzdîrab.
**Kambax**: Berbat, wêran, perkende, bêserûber.
**Kamera**: Cîhazê wêne û bûyer û tişt girtinê.
**Kamil**: 1. Tekûz, gihayî, ne nuqsan, mûkemmel. 2. Ewê bi kemalê gihayî, zana, rewşenbîr, rewşenfikr, ramanrohn.
**Kamranî**: Bi mirada xwe gihiştî, bextiyar, dilşad, bextewar, mesûd.
**Kelax**: Bedena mirî, kelaş.
**Kemal**: Temam, tekûz, bi bandor, nekêm, ne nuqsan.
**Kemalat**: Kamilbûna însanî ji hêla zanîn, sewîye û exlaqî ve.
**Kerahet**: 1. Bêdilî, pênexweşî. 2. Bê

keyfa xwe kirina îşekî, ji mecbûrî kirina karekî. 3. Ew kirin, fiêl û tiştê ji hêla dînî ve digel ku nehatiye heramkirin jî lêbelê ji heramîyê nêzîk e.

**Kerem**: Esalet, şeref, camêrî, lutf, merdîtî, semahet, îhsan, arîkarxwazî, dîgerperwerî.

**Kerixîn**: Westin, betilîn, bêhalbûn, perixîn.

**Kesret**: Zehfbûnî, pirrbûnî, zêdebûnî.

**Keşîş**: Papaz, rahib, rahibê manastirê yê ku nezewiciye.

**Keşîşxane**: Mala papazan, manastir, dêr.

**Kewser**: Qencî, xêr. Ğayet baş. Hikmet, îlm, Qur'an, Îslam, tewhîd, îlmê ledun, marîfetûllah. Serkehnîya çemên Cennetê. Hewzê bihiştê.

**Keyaset**: Şexsiyet.

**Kîfayet**: Kafî-bûn, têrêkirin, ne nuqsan, nezêde.

**Kufr**: Xuda nenasî, dijbera îmanê ye.

**Kulox**: Serê kêmeql, vela, pûç.

**-L-**

**Laqeyd**: Bêelaqe, giringîpênedan.

**Lawaz**: Qels, zeîf, weza, ne zexm, ne ji esas.

**Lêbelê**: Feqet, belam, lakin, emma.

**Lefz**: Peyv, bêje, xeber.

**Lêgerîn**: Gera li tiştekî.

**Lêkolîn**: Kolan û kudandina li ser tiştekî ye.

**Lerz**: Lerzîn, reerîn, hejîn.

**Letafet**: Xweş, bedew, nezaket, nermî.

**Letaîf**: Letîfeyan, ew bizavên rûh ên ku her diçe di însên de letîfmend û nûrdar dibin; qelb, rûh, sirr, xefî.

**Lewhûl-mehfûz**: Ew lewha ku zanîna ezelîya Xuda Teala di bara tiştên ku di kaînatê de bûne û yên ku wê hê bibin jî nivîsandî ne.

**Lewitî**: pîsbûyî, qirêjbûyî, nepaqij.

**Lewra**: Çuku, ji ber ku.
**Lêxer**: Ewê ku lê dixin.
**Lîyaqet**: Layiqbûn, babetbûn, mûnasib-bûn, ehl-bûn, şîyan.

-M-

**Mahwîyet**: 1. Xilasbûna ji nuqsanîyên beşerî ye. 2. Tewazû û nefsbiçûkî ye.
**Makro**: Mezintirîn, ya mezintir, ya gewretir.
**Mîkro**: Biçûktirîn, ya biçûktir. Ew tişta biçûka ku bes bi mîkroskopê tê dîtin.
**Malayanî**: Bêmane, bêfeyde, gotina pûç, tişta ku mirov elaqedar nake.
**Malikîyet**: Malik-bûn, xwedî-bûn, heqê teserrufatîyê.
**Malûl**: Bi îllet, êşdar, jandar, nexweş, xeste.
**Malûl**: Bi îllet, êşdar, jandar, nexweş, xeste.
**Mamûr**: 1. Sağlem, ava, abad, guhliserê. 2. Hatiye avakirin, hatiye bikaranîn.
**Manewîyat**: Rewşa exlaqî, wezîyet û hizûra dilî ye.
**Marîfetûllah**: Ji kûrahîya dilê xwe û bi yeqînî zanîn û naskirina Xuda.
**Masiwa**: 1. Hemû heyberên ji bilî Xuda, ji ğeyrî Xuda. 2. Tiştên bi dinyayê re têkildar.
**Med-cezîr**: 1. Bi tesîra kişandina heyvê rabûn û nizmbûna ava behrê. 2. Nizmbûn-derketin.
**Meded**: Hewar, arîkarîxwestin.
**Meğazî**: Ğezweyan, şeran, cengan, pevçûnan, levdanan.
**Meğfîret**: Efû, lêbûrîn, têbûrîn.
**Mehcûbîyet**: Şermezarbûn, zimankurtbûn.
**Mehwîyet**: Tinebûn, neman.
**Mekarimê Exlaq**: Exlaqê camêrane, exlaqê xweş.
**Mekteb**: Kitêbxane, bîro, ofîs, dersxane, dibistan.

**Melce**: Îltîcageh, penahgeh, cihê ku mirov xwe diavêje berê.

**Melik**: Xwedî, sahib.

**Menfî**: Neyênî, ne erênî, nelê, negatîf.

**Mensûbîyet**: Mensûb-bûn, aîdîyet, jêbûn.

**Menzûme**: 1. Dor, dêzî, taqim. 2. Peyva bi qafîye, biwezn, hûnandî.

**Mercî**: Cihê serlêdanê, lêveger, meqamê ku mirov lê vedigere û pê dişêwire.

**Merdûd**: 1. Hatiye redkirin, hatiye qewitandin. 2. Hatiye birînkirin, hatiye pûçkirin, fikra nemeqbûl. 3. Ewê ku ji rehma Xuda hatiye qewirandin, melûn.

**Merhemet**: Rehm, dilovanî, tiltenikî.

**Merîfetullah**: Naskirina Xuda Teala ya bi qelb û yeqînî ye.

**Mesabe**: Nirx, qedr û qîmet, hukm, derece, mertebe.

**Mesned**: Tişta ku mirov pala xwe didiyê, pişta xwe pê dispêre, palpişt, palgeh.

**Meşreb**: 1. Xuy, tebîet û mîzaca ku ji xulqîy-eta kesekî tê. 2. Adet, kevneşopî. 3. Reftar, bizav, sekn, helwest.

**Meşrû**: 1. Ji bo şerîetê guncaw. 2. Ji bo qanûn û hiqûqê mûnasib. 3. Heqdar, mafdar.

**Meşrûîyet**: Rewşa meşrûbûnê; bi hiqûqê re guncawbûn, rew-abûn.

**Metanet**: Metînbûn, asêbûn, mûhkembûn, xwegirî, sağlemî.

**Mewcûd**: Heyî.

**Mezher**: 1. Cihê ku tiştek lê zahir û xuya dibe. 2. Gihayî, naîlbûyî.

**Mêzîn**: 1. Terazû. 2. Alevê pîvan û kişandinê. 3. Ew terazûya ku li axretê xêr û guneh û sewab û îqab pê têne kişandin.

**Mezîyet**: Xusûsîyeta ku tiştekî ji tiştên din

vediqetîne, wî ji wan çêtir dike û xusûsîyetê jê re bexş dike.

**Mezrûf**: Tiştê ku dikeve nava zerfê.

**Mîkro**: Biçûktirîn, ya biçûktir. Ew tişta biçûka ku bes bi mîkroskopê tê dîtin.

**Mînwal**: Usûl, rê, terzê bizavê.

**Mûafîyet**: Jê efûbûn, ji ber ceza derketin.

**Mûamelat**: 1. Mûamelatan, kirinan. 2. Di fiqhê de hiqûqê kesayetî û malbatî, eynî heq û mafên ku bi mîras, ticaret, deyn û kar re elaqedar in.

**Mûcahede**: 1. Mûcadele, hewldan, ğeyret. 2. Kirina tişta ku nefsa mirov naxwaze bi vî awayî ji bo gihana hestên manewî terbîyekirina nefsê ye.

**Mûcerred**: 1. Xwerû, tişta ku ne cism e. 2. Saf û xalis e. 3. Hatiye tecrîdkirin, hatiye tazîkirin.

**Mûcib**: Lazimî.

**Mûellim**: Talîmkar, hînkar, dersdar, seyda, mamosta.

**Mûeyyen**: 1. Hatiye dîyarkirin, hatiye tayînkirin, dîyarkirî. 2. Qerar pê hatiye dayîn. Biryar pê hatiye dayîn.

**Mûğayir**: Ne guncaw, ne mûnasib, zid, dijber, mûxalif.

**Mûhasera**: Dorpêçana ji bo bidestxistina deverekê ye.

**Mehebbet**: Hezkirin, evîn, keyf jê re hatin.

**Mûhîm**: Giring.

**Mûhteris**: Îhtîrasmend, arzûmendê zehf zêde xwestek, bihirs û ezm.

**Mûkellef**: Mesûl, binbar, berpirs.

**Mûmtaz**: Cuda, veqetandî, biîmtiyaz.

**Mûncer**: 1. Bi alîyekî ve hatiye kişandin. 2. Hatiye encamdan.

**Mûnewwer**: 1. Bi ronahî, rewşenbîr. 2. Hatiye rohnîkirin. 3. Zana, kulturmend.

**Mûqabele**: Li hemberî hev, cewab.

**Mûqedder**: Nivîsa enîyê, ew teqdîra ku ji terefê Xuda ve ji ezelî de hatiye dîyarkirin.

**Mûqeddes**: Pîroz û paqij. Mûbarek. Qudsî, ezîz.

**Mûqellid**: Teqlîdkar, ewê ku bi dîtin-nêrîna dîgerê xwe emel dike.

**Mûqteza**: Lazimî, mûcibî, pêdivêyî.

**Mûraqebe**: 1. Li ber çav de, bûna di bin çavan de, di bin pişkinîn û kontrolê de. 2. Nêrîna li alema navxweyî ya xwe û noqbûna di tefekkurê de.

**Mûrebbî**: Terbîyekar, perwerdegar.

**Mûrşid**: Rêber, rêzan, pîrê terîqetê.

**Mûsbet**: Erê, lê, pozîtîf.

**Mûseffa**: Hatiye safîkirin, hatiye paqijkirin, hatiye li parzûnk-xistin, safîyet bidestxistiye.

**Mûsteğnî**: Xwe zengînbînî, xwe hewce-nebînî.

**Mûsteheb**: 1. Tişta ku tê hezkirin, li xweşîya însên diçe. 2. Ew tişta ku dîn bi awayekî mecbûrî ferman pê nekirîye jî lê dîsa meqbûl tê hesabkirin; ewê ku wê dike sewabê qezenc dike û ewê ku wê nake jî nakeve gunehan.

**Mûsteqîm**: 1. Rêya rast û durust. 2. Rast, ne berwar. 3. Bi exlaq, bi îffet.

**Mûstesna**: Awerte, veqetandî, îstisna-kirî.

**Mûşahede**: 1. Dîtina tiştekî bi çavan e. 2. Seyra manewî.

**Mûşexxes**: Tişta ku hatiye bişexskirin, bicismkirin, bişeklkirin. 2. Tişta ku bi çavan tê dîtin û bi destan tê destlêxistin.

**Muşkil**: 1. Zor, zehmet, çetîn, tund, dijwar. 2. Zehmetî, çetînî, dijwarî, asteng, kelem, manîa.

**Mûteessibane**: Bi raperestane, bi kor-korane.

**Mûtekebbir**: Ewê ku xwe mezin dike, ewê ku ser xwe ve diçe.

**Mûteşeyyix**: Ewê ku wek şêx tê dîtin, ewê ku xwe wek şêx nîşan dide, şêxê sexte.

**Mûtleq**: Ew tişta ku ne pêbendê şert û mercekî be. 2. Hebûna ku ji bo hebe îhtiyaca wê bi tişteke din nîn e, sebebê hebûna wî di wî bi xwe de ye. 3. Serbest, mûsteqil. 4. Binbirr. 5. Hebûna Mûkemmel û tekûz.

**Mûtmein**: Dilaram, hizûrmend, sakin.

**Mûtteqî**: Xweparêz, Ji Xuda-tirs.

**Mûwazene**: 1. Wekhevbûna halê du tiştan, hevkêş bûn. 2. Mûqayese. 3. Raman, tedbîr.

**Mûwazene**: 1. Wekhevbûna halê du tiştan, hevkêş bûn. 2. Mûqayese. 3. Raman, tedbîr.

**Mûyesser**: 1. Ew tişta hêsan, ewê ku bi sehnayî çêdibe. 2. Nesîb. 3. Tişta ku hatiye hêsankirin.

**Mûzeyyen**: Hatiye tezyînkirin, hatiye xemilandin, hatiye xweşik-kirin, zînetdar, bi xeml û rewş.

### -N-

**Naîlîyet**: Gihiştina miradê.

**Nebewî**: Pêğemberî, tişta ku bi pêğember re elaqedar e.

**Nefs**: Xwe, can, rûh.

**Nefsa emmare**: Nefsa ku însên diajoyê xirabîyê, ewa ku jê re dibêje neqencîyê bike.

**Nefsanî**: Tişta ku ji nefsê tê, bi nefsê re elaqedar e.

**Nefsanîyet**: Kîn, ğerez, xusûmet, dijminahî, neyartîya veşartî.

**Ness**: 1. Hukmê eşkere, delîla qet‘î. 2. Ew ayet û hedîsa ku hukmê qet‘î anîye.

**Neşwe**: Keyfxweşî, şadmanî, rûkenî, coş û xuroşî.
**Nezaket**: Bi nazikî, bi edeb, bi efendîtî.
**Nezan**: 1. Nezan, cahil. 2. Hov, bêterbîye, serhişk.
**Nezargeh**: Cihê nêrînê, meyzandinxane, fekrgeh.
**Nezargeha îlahî**: Cihê ku cenabê Heq nêrîna xwe xistiyê.
**Nîfaq**: 1. Mûnafiqtî, durûtî. 2. Ewê ku xwe misliman şanî dide lê di dilê xwe de kafir e.
**Nimûneya îmtîsalê**: Nimûneya ku mirov ji xwe re dike mîsal û mirov li pey wê diçe.
**Nuqsan**: Kêm, netemam nezêde.
**Nûra li ser nûrê**: Qencîya li ser qencîyê.

**-P-**

**Pêbend**: Peyrew, pêbest, pêgir, girêdayî.
**Pehnî**: Ferehîya dijberê bere û dirêjahîyê.
**Pençeşêr**: Şêrpençe, nexweşîya kêvcalî, qansêr.
**Pend**: Şîret, nesîhet.
**Perkende bûn**: Belawelabûn, bêserûber bûn.
**Perwerde**: Terbîye, talîm, hîndekarî, xwedî-kirin.
**Pîroz**: Pîroz, paqij, temîzîya mûqeddes.
**Pratîk**: Kiryarî, emelî.
**Propaganda**: Bangeşeya ji bo fikr, partî û bîrdozîyekê.
**Protez**: Çêkirî, endamê sexte.
**Pûç**: Vala, rizîyayî, bêkêr.

**-Q-**

**Qabilîyet**: Karina kirina tiştekê, jêhatin, desthosta.
**Qaîm:** 1. Ewê şipya, li ser pêyan. 2. Ewê ku dikeve cihê yekî, cihgir. 3. Ew sebebê ku tiştekî mûmkin dike.
**Qal:** Peyv, gotin.
**Qedeğe**: Mehzûr, menkirî, ne helal, ne mûbah.
**Qerz**: Deyn, wam.

**Qerzê hesen**: Deynê sipehî, wamê ciwan. Ew deynê ku sirf ji bo rizaya Xuda hatiye dayîn. Ew deynê ku bê riba hatiye dayîn.

**Qet'î**: 1. Binbirr, tişta ku têde cihê şubhe û gumanê nîn e. 2. Bi ti awayan, hîç.

**Qewl:** Gotin, peyv, soz, peyman, teahud.

**Qewm**: Cemaet, kom, millet, netewe.

**Qewmî**: Gelêrî, neteweyî, ewê bi qewm re elaqedar.

**Qistas**: 1. Pîvan, mîyar. 2. Şehîna mezin, mêzîn, endaz.

**Qiwam**: Riste, nîzam, hîm, sitûn.

**Quddîse sirrûh**: Sirrên wî paqij bin! Ev hevok ji bo hurmetgirtinê tê gotin.

**Qudret**: Şîyan, karîn, jêhatin û hebûna hêz û qewetê ji bo kirina tiştekî ye.

**Qudret**: Şîyan, karîn, jêhatin û hebûna hêz û qewetê ji bo kirina tiştekî ye.

**Qunağ**: Pêvajo, merhele. Di hedefekê de gihiştina her pêpelingekê ye.

**Qure**: Serxweveçû, pesnêxwego.

**Qutb**: Cemser.

## -R-

**Radîyellahû enha**: Xuda ji wê razî be.

**Radîyellahû enhû**: Xuda jê razî be.

**Rahib**: Reben, pepûk, belengazê li ber dêran.

**Ram bûn**: Mûtî bûn, teslîm bûn, desteber bûn, ketina bin fermana yekî din, têkçûn, têkşikestin, bezîn, binketina xwe qebûlkirin.

**Rasteqîne**: Heqîqet, realîte.

**Rawî**: 1. Ewê ku rîwayet dike, diguhêze. 2. Ewê ku hedîsa ji Hezretê Pêğember bihîstî ji xelkê re diguhêze, neql dike.

**Rehîm**: 1. Sifetek ji sifetên Xuda Teala ye. 2.

Birehm, dilovîn, parêzger, berket. 3. Ew sifetê Xuda Teala ye ku li axretê bi kerema xwe bi evdên xwe mûamele dike û gunehên wan dibexşîne.

**Rehle'ya tedrîsê**: Li ber destê seydayekî yan jî mûrebbîyekî ders xwendin û di terbîya wî re bûrîn.

**Rehmetûllahî eleyh**: Rehma Xuda lê be!

**Reklam**: Ji bo firotinê pesnê tiştekî dan, terwîckirin.

**Reqîq**: 1. Zehf zirav, nazik, narîn, dilovan, nazenîn, nazdar. 2. Diltenik, hestgerm, hestyar, dilşewat, dilsoj.

**Rewza Mûtehhera**: Bexçê pak, mezarê pêğemberê Xuda [dirûd û silavên Xuda lê bin].

**Rexawet**: Rehetî, sistahî, ewlehî.

**Riqqet**: 1. Nazikîtî, ziravî. 2. Nezaket. 3. Di xwebêjîyê de tenikîtî û sernermî. 4. Rehmkirin û dilovanî.

**Riqqeta qelbî**: Tenikîya dilî, hessasîyeta qelbî, nazikîya wijdanî û ziravîya qelbî.

**Riyazat**: Geljimareya **rîyazet**ê. Ew jî ev e; mirov hindik bixwe, hindik raze, tim îbadetê bike. Bi vî awayî, nefsa xwe terbîye û perwerde bike, bi xwe karibe, xwe li hemberî heramîyê bigre, destê xwe ji zewq û sefaya dinyayê bikişîne û nefsa xwe bişikîne.

**Rubaî**: Şiêra çar qafîyedar e ku bi wezna urûzê tê nivîsîn, çarîne.

**Rubûbîyet**: 1. Rebbîtî, ulûhîyet. 2. Xwedîtî, sahibîtî.

**Rûhanî**: 1 Bi rûh re têkildar. 2. Rûhî, canî, giyanî, rewanî, manewî, ya ne cismanî. 3. Bi axretê re têkildar. 4. Bi dîn re peywendîdar. 5. Di

dînên dîgerên Îslamê de zilamê dîn, rahib.

**Rûhanî**: Rûhî, canî, giyanî, rewanî, manewî.

**Rûhanîyet**: 1. Atmosfera manewîya bi rûh re têkildar, halên manewîyên ku rûh xurt dikin. 2. Berdewamîya hêza manewîya kesayetîyeke ku wefat kiriye. Tişta ku bi rûh û can re elaqedar e. 3. Tişta ku bi paqijkirina rûh û rewan re elaqedar e.

**Ruhban**: Geljimareya **rahib** e. Yanî rahiban, papazan, zimanê dînê filehî.

**-S, Ş-**

**Sadat**: Mezin, pîrên tesewwufê.

**Sadiq**: 1. Rast, heqîqî, nesexte. 2. Bi sedaqet, semîmî, pêbend.

**Sadir bûn**: Derketin, hatina meydanê, xuya bûn, zahir bûn.

**Sadir**: Derketî,

**Safî**: Xalis, tiştek têkilnebûyî.

**Safîyet**: Xalistî, zelalî, temîzî, pakî.

**Sahib**: Xwedî, malik.

**Sahîh**: Rast, durust, çêdibe.

**Salim**: 1. Ne nexweş, ne seqet û şilûşeht. 2. Bêeyb, bêqusûr. 3. Bêtirs, bêendîşe, emîn.

**Seda**: Deng, alan, ew dengê ku di şekeftekê de yan jî di cihekî kûr de li mirov vedigere.

**Sedaqet**: Sağlemî, durustî, xiyanet nekirin, wefadarî, pêbendîya ji dilî.

**Seddîq**: Rastgo, ewê ku hîç derewan nake, dilsoj, sifetê Ebûbekrê siddîq e.

**Sedeqa cariye**: Ew xêr û hesenat e ku her tim dibe wesîleya ecr û sewabê. Her wekî mizgeft, mekteb, medrese, çeşme, kehnî, bîr, çal, pir, nexweşxane û yên wekî van e.

**Sefa**: 1. Bêmetirsî, bê fikar, aramîya dilî, dilcoşî. 2. Keyf û şahî. 3. Safîtî, berraqî.

**Sefahat**: 1. Zêde zêde heyrantîya ji bo keyf û zewqa dinyayî. 2. Îsrafkirina mal. 3. Zewqperestî, keyfperestî.

**Sefalet**: Nizmîbûn, hejarî, belengazî.

**Sêhrbaz**: Cazû, efsûnkar.

**Sekînet**: 1. Sakin-bûn, tenahî. 2. Hizûr, dilaramî.

**Selahîyet**: Karbidestî, peywirdarî.

**Selametî**: 1. Dûrbûna ji derd, tengasî, kêmasî, keser û êşan e. 2. Dawîya bixêr. 3. Xilasî û rizgarî. 4. Rastî û durustî.

**Selefê salih**: Di serî de eshabê kîram, tabîîn, tabîê tabîînan tên. Dîsa ew hemû mûmînên ku berî me jîyane, bi îlmê xwe emel kirine û bi exlaqê xwe gihane kemalê.

**Selîm**: 1. Semîmî, temîz. 2. Mûkemmel, tekûz, sağlem, rast. 2. Bê xeter, bê tehlûke, bê zirar.

**Sellellahû eleyhî we sellem**: Dirûd û silavên Xuda lê bin.

**Seltenet**: Hukmranî, padîşahî, şahînşahî.

**Sema**: 1. Asîman, rûyê asîmanî. 2. Felek. 3. Di Mewlewîtîyê de ew hereketa li dora xwe fetilînê ye ku bi meqseda zikr tê îcrakirin.

**Semawî**: Jêder asîmanî, îlahî, ne beşerî.

**Semîmîyet**: Jidilî, bi îxlas.

**Sena**: Pesn, wesfê bi qencîyê.

**Senîyye**: Bilind, zehf mûhîm, nirxdar, bala.

**Sewabê xwe**: Rastîyên xwe.

**Sexawet**: Merdî, camêrî, destvekirî, çavtêrî.

**Seyr û silûk**: Ew usûl e ku di terîqetê de tê şopandin û taqîbkirin. Ew rêwîtîya manewîya ji bo wusleta Heq

Teala ye ku kesê dikeve terîqetê wê dike.

**Silsîle**: 1. Ew îsnad, palpişt û zincîra pîrên terîqetê ye ku di terîqetê de digihîje heta Hezretê pêğemberê Xuda. 2. Ew helqe û tişt in ku li pey hev rêz dibin û hev û din taqîb dikin.

**Silûk**: 1. Ketina ser rêyekê. 2. Bûna endam di terîqetekê de.

**Sîma**: Rû, çehre, dêm.

**Sîrat**: Rê, sîrata mûsteqîm, rêya rast û durust.

**Sîrayet**: Ji yekî diçe yekî din.

**Sîret**: 1. Rewşa manewîya şexsekî, hal, hereket, tebîet,, exlaq û karaktêrê wî ye. 2. Tercuma halê Hezretê pêğemberê Xuda ye. 3. Jînenîgarî, bîyografî.

**Sirişt**: Tebîet, xweza, natûrel.

**Sirrî**: Bi sirran re têkildar, aîda sirra ye.

**Sitayîş**: Pesn, medh, bi qencî jê xeberdan.

**Sofî**: Mirîdê terîqetê, jîyangij, heyat-nenerm.

**Suflî**: 1. Nizm, yê li jêrê, 2. Ewê ku qiyafetê wî pîs be, xirpanî, xirto-pirto.

**Suleha**: Geljimareya **salih** e, yanî salihan, qencan, bikêrhatîyan.

**Sulte**: Otorîte, desthilat, selahîyet.

**Sûnd**: Yemîn, qesem.

**Sunnet**: Kevneşop, rêc, rêbaz.

**Sunnetûllah**: Ew qanûn, qaîde û rêz û rêçên ku Xuda Teala ew li kaînatê danîne.

**Sinûhat**: Tişta ku tê bîra mirov, diniqute dil, tişta ku di dil de çêdibe.

**Sûret**: 1. Dîtina derveyî. 2. Qîyafet û şekl.

**Sûretê heq**: Bi zahirê xwe dîtina semîmî û rast.

**Sûrî**: Dîtina şeklî, ne heqîqî.

**Sûû-zen**: Zena xirab, fikirîna xirab, guman, şubhe, şiwar, şek.

**Şablon**: Qalib.

**Şamil**: Tevgir, hemûgirtî.

**Şebnem**: Xwîsîtî, avrêhtî, jale, şevnemî.

**Şecaet**: Mêrxasî, agîdî, lehengî, nebezî, qehremanî, wêrekî, dilêrî, dilawerî.

**Şefaet**: 1. Li axretê ricakarîya Hz. Pêğember û mezinên mûmînan e, ji bo efûbûna gunehê hinek mislimana ye. 2. Ketina navberê, bûna navçêtî; ricakarî, mêhdervanî û navgînî ye.

**Şefqet**: Merhemet, dilovanî, diltenikî.

**Şehadet**: 1. Şehdeanîn, 2. şehîdketin.

**Şer'î**: Bi şerîetê re têkildar. Ji dîn re guncaw.

**Şerîf**: Pak, qenc, serbilind, pîroz.

**Şihûd**: Temaşeber, li ber çavan.

**Şimûl**: 1.Ewa ku dide ber xwe, dixe navbera xwe. 2. Aîdbûn, şanîdan.

**Şingeşing**: Dengê şûr û mertalan.

**Şîrîn**: Xweş, netehl, netal,

**Şirk**: Şirîk ji Xuda re çêkirin, bawerkirina hebûna îlahekî ji bilî Xuda.

**Şiwar**: Şubhe, guman, şek.

**Şov**: Rîyakarî, şanîdan.

**Şukr**: Spasî, malavayî, memnûnîyet îfade kirin.

**Şukrane**: Elametê şukrdarîyê, nîşana qencînasîyê.

**-T-**

**Tazîm**: Mezinkirin, hurmetkirin, xatir-girtin.

**Tabîîn**: Ewên ku di serdema sehabîyan de jîyane, ew dîtine û ji wan hedîs û eser rîwayet û neql kirine.

**Takekes**: Ferd.

**Talîm**: Dan-hînkirin, dan fêrkirin, dan-elimandin.

**Talîmat**: Dîrektîf, ferman, emr.

**Taybetmendî**: Xusûsîyet, mezîyet.

**Te'lîf**: 1. Berhem nivîsandin, komkirin, rêzkirin. 2. Pev-xweşkirin,

pev-dan-hezkirin, lihevanîn.

**Te'yîd**: 1. Xurtkirin, destekkirin, sağlemkirin. 2. Rast-dêrîn, xurt-kirin.

**Teala:** Mezin, bilind.

**Teassub**: Rehgirtin, terefdarîya bi zêdegavî, pêbendbûna bi kor koraneyî, israrkirina di batil de.

**Tebaruz**: Belîbûn, xuyabûn, barizbûn.

**Teberruk**: Bereket hêvîkirin, mûbarek dîtin, bi qudûş jimartin.

**Tebîetê eslî**: Exlaqê eslî, karaktêrê eslî, adet, fitret.

**Teblîğ:** 1. Gihandin. 2. Vegotina dîn ji dîgeran re bi vî awayî xebatkirin ji bo belavkirin û zêdekirina wî.

**Teblîğat**: Geljimareya **teblîğ** e, yanî tiştên ku hatine ragihandin.

**Tecellî**: Xuyabûn, eyanbûn, beyanbûn, raçavbûn.

**Tecellîyat**: Xuyabûnan, kufşbûnan.

**Tecessus**: Li xeberên dizî gerîn.

**Techîz**: Temamkirina tiştên pêwîst, xemilandin, tekûzkirin.

**Tecrîd**: Xwerû-kirin, goşegirî.

**Tedbîr**: 1. Îdarekirin, birêvebirin, kişandin û wergerandin.2. Hesabkirina dawîya karekî. 3. Berî dest bi kar-kirinê fikirîna zehmetiyên ku derkevin pêşîya însên e.

**Tedwîr**: 1. Fetilandin, wergerandin. 2. Kişandin û wergerandin, îdarekirin.

**Teelluq**: 1. Elaqe, nisbet. 2. Mûnasebet, îrtîbat.

**Teennî**: Lez nekirin, bi îhtiyatbûn, bi hizrbûn, hêdî hêdî hereket kirin, bi temkîn bizavkirin.

**Teeqqul**: 1. Eqil-kirin, fehmkirin. 2. Bibîranîn.

**Teessub**: Terefdarîya zêde, pêbendîya kor korane, israra di batil de.

**Tefekkur**: Hizrkirin, ramankirin, bîrbirin.

**Tefekkura mewtê**: Fikirîna di mirinê de.

**Tefeyyuz**: Feyz dîtin, pêşveçûn, bilindbûn.

**Tefrît**: Zêde zêde îhmalkirin û sistî şanîdan.

**Tehessus**: Hiskirin, hestpêkirin.

**Tehqîq**: 1. Lêgerîna li heqîqetê. 2. Fehmkirina sirrên kaînatê. 3. Îsbatkirina rastîya tiştekî.

**Tehrîf**: 1. Di peyvan de guherandina cihê herfan bi hev, bi vî awayî maneya wan xirabkirin. 2. Xirab kirin, guherandin.

**Tekamul**: Pêşhata ku gav bi gav tê meydanê. Guhertina ku gav bi gav pêktê, bi kemalê gihan.

**Tekfîr**: Kafir jimartin, kufr xistin stûyê yekî.

**Tekrîm**: Îhtîram şanîdan, bilind-kirin, qedrgirtin, mezin kirin.

**Teksîf**: Himbizkirin, tîrkirin û zehfkirin.

**Tekûz**: Temam, mûkemmel, ne nuqsan.

**Tekzîb**: Derewandin, şaş qebûl-kirin, nerastzanîn, derew-derxistin, redkirin.

**Telaqqî**: Fehmkirin, têgihan, wergirtin.

**Telîmat**: Dîrektîf, ferman, emr.

**Telqîn**: 1. Fikrê xwe dan qebûlkirin, dan hînkirin. 2. Li ber serê yekî ku li ber mirinê be dubarekirina kelîma şehadetê, bi vî awayî pê da gotin e.

**Temaşe**: Bi zewq seyrkirin, meyzandin, nêrîna bi keyf û şahî.

**Temayul**: 1. Bi terefekî ve rast xwehrbûn, meylkirin. 2. Terefdarbûna ji bo tiştekî yan kesekî ye, 3. Elaqeşanîdan e.

**Temen**: Emr, jîn.

**Temrîn**: Dubare, dan hînkirin.

**Tenaqud**: Nakokî. Ewê ku du peyvên wî ji hev re dij bin.

**Tenik**: Zirav, ne sitûr û ne pehn.

**Tenqîs**: Kêm-kirin, nuqsan-kirin, ne temam-kirin.

**Tenûr**: 1. Firina ser girtî. 2. Firina ku di erdê de tê kolan.

**Tenwîr**: 1. Rohnî kirin. 2. Agahdar kirin.

**Tenzîh**: Pakdêrîn, temîz-dêrîn, ji kêmasîyan dûr zanîn.

**Tenzîm**: 1. Bi rêxistin kirin, xistin nîzamê. 2. Ser-erastkirin, çaksazkirin.

**Teorî**: Dîtin-nêrîn, nezerî, raman û hizr.

**Teorîsyen**: Ewê ku teorîyê li holê datîne, bavê fikrekî, bîrbir.

**Teqwa**: Tirsa ji Xuda, ji tirsa Xuda hay ji heramîyan man, xwe parastina ji guneh û sûcên ku dibin sers-edemê hêrs û ğezeba Xuda Teala.

**Teqwîm**: Salname, roj-jimêr.

**Terbîye**: Edebkirin, perw-erdekirin, bi torekirin, bi exlaqkirin.

**Tercuman**: Wergêr, vegêr, ziman-guhêzî.

**Tereqqî**: 1. Zêdekirin, pêşveçûn, bilindbûn. 2. Hatina ji bo halekî baştir.

**Terîqet**: Rêyên sofîyan, rêyên îrşadê.

**Terkîb**: Sazî, rêzkirin, çêki-rin, pêkanîn.

**Tertîl**: Bi ciwanî û tecwîdî Qur’an-xwendin.

**Terwîc**: Bi rewac-kirin, propaganda-kirin.

**Tesanud**: Palpiştî.

**Tesbîh**: 1. Tenzîhkirina Xuda ji kêmasîyan. 2. Subhanellah gotin.

**Tescîl**: Qeydkirin, tomarki-rin, bi awayekî resmî erêkirin.

**Tesdîq**: Rastdêran, rast zanîn, pejirandin.

**Tesellut**: 1. Siwarbûna li ser stûyê hinek mirovan. 2. Hukmkirina li wan. 3. Kolekirina wan. 4. Standina îradeya wan. 5. Bindestkirina wan.

**Teserruf**: 1. Selahîyeta bikaranînê. 2. Xwedî-bûn. 3. Tesîra manewîya welîyan li ser heyberan.

**Tesewwuf**: 1. Rêbendîya terîqetên sofîyan e. 2. Tezkîyeya nefsê ye. 3. Îrşada ewaman e.

**Tesewwir**: 1. Di zêhnê xwe de zindîkirin, xeyalkirin, anîn ber çavan, fikirîna tişta ku mirov bike. 2. Fikirîna kirina tiştekî.

**Tesfîye**: Safîkirin, temîzkirin.

**Teshîh**: Serrastkirina xetayê, şaşî ji holê rakirin.

**Teskîn**: Sakin-kirin, hedananîn, rawestandin.

**Teslîmîyet**: Teslîm bûn, stû xwehr-kirin, riza şanîdan, îtaetkirin.

**Tesnîf**: Sinifandin, ji bo sinifan veqetandin.

**Teswîr**: 1. Resmê yekî çêkirin. 2. Resm, fîgur, portre. 3. Bi nivîsê tarîfkirin. 4. Sûret-zindîkirin, anîn ber çavan, şeklê tiştekî anîn bîra xwe.

**Teşbîh**: Bi hev şibihandin, li hev qiyaskirin.

**Tevger**: Hereket, bizav, liv, lebat.

**Tewd'î**: 1. Bi emanetkirin. 2. Teslîmkirin, sipartin.

**Tewekkul**: 1. Bi wekîl kirin, ji dîgeran re hewalekirin. 2. Bi Xuda ewlebûn, di cihê ku hêza mirov têrê nake de mirov hêzê ji Xuda hêvî bike.

**Tewessul**: 1. Wesîle jimartin. 2. Serî lê dan, mûraceetkirin. 3. Bawerkirin.

**Tewhîd**: 1. Bi yek-kirin. 2. Bawerkirina bi yekbûna wî, yek-kirin. 3. Yekbûna Xuda Teala. 4. Gotina kelîma «laîlahe illellah» ya ku yekbûna Xuda îfade dike.

**Tewsîye**: Wesiyet-kirin, şîret-kirin, pend-kirin.

**Tewzî**: 1. Belavkirin. 2. Dana para her kesî ye.

**Texeyyul**: Di xeyalê de sûret pê bexşîn, anîn bîra xwe, di zêhn û mejîyê xwe de candarkirin.

**Texlît**: Cure, celeb.

**Tezahur**: Xuyabûn, xwe şanîdan, pêşandan.

**Tezkîye**: Paqij-kirin, temîzkirin.

**Tezkîye**: Paqij-kirina nefsê ji sifet û meylên xirab, temîzkirin, sipîkirin.

**Tezyîn**: Xweşik-kirin, sipehî-kirin, bedew-kirin, ciwan-kirin, keşxekirin, bi rewş-kirin, xemilandin.

**Tije**: Mişt, ne vala.

**Tîpîk**: Nimûneyî, mîsalî.

**Tixûb**: Sînor, nîşana di navbera du welatan de, veqetandeka di navbera du tiştan de.

**Transfer**: Guhastin, derbaskirin, rabûrandin.

**-U-**

**Ubûdîyet**: Evdînî, koletî, îbadetkirin.

**Ucb**: Xwe ecibandin, serxweveçûn, kubartî, quretî.

**Ulema**: Geljimareya aliman e. Zana, zanayên dînê îslamê.

**Ulfet**: 1. Ji hev re hînbûn. 2. Dostanî, hevaltî, aşînabûn, rind derbaskirin. 3. Hezkirin, mehebbet.

**Ulûhîyet**: Îlahtî, ribûbîyet, Xudatî.

**Ulwî**: Bilind, jorîn, manewîyat.

**Ummet**: Hevalbend û pêbendê bi pêğemberekî.

**Ummî**: Nexwenda, ewê ku nikare binivîse û bixwîne.

**Umûmî**: Umûmîyet, giştî, tevahî, hemûyî, gelemperî.

**Unsîyet**: Hogirî, demsazî, dostanî, sebrpêhatin.

**Uqba**: Axret, di piştî dinyayê.

**Urûc**: Bilindbûn, derketina jorê.

**Uswe'yê hesene**: Nimûneya sipehîtirîn.

**Uxrewî**: Bi axretê re elaqedar, aîda axretê.

**Uzlet**: Dûrbûna ji mirovan. Xwe dan goşeyekê, înzîwa-bûn.

### -V, W-

**Vejîn**: Sağbûna ji nû ve.

**Vexwarin**: Vexwarina tiştê rohn, wekî av û meşrûbatan.

**Wacib**: Xudayê [heyberê] ku hebûna wî zerûrî ye, hebûna wî bi wî ye, nebûna wî nayê fikirîn.

**Wacîbat**: Geljimareya wacîbet e. Ew kar û deynê ku her divê were edakirin, bivênevê.

**Waqîa**: Bûyer, rûdan, çêbûn.

**Waqif**: Agahdar, pêzana, xeberdar, haydar.

**War**: Cih, welat, mekan.

**Waris**: Malpêma, mîratxwer.

**Wasil**: Gihayî, bi mirada xwe gihiştî.

**Wasîte**: Wesîle, navgîn, sebeb, navberkar.

**Webal**: Guneh, sûc, sûnc, tawan.

**Wecd**: Evîn, mehebbet, heyecana bilind. Hezkirina mirov pê ji xwe diçe û pê dikeve heyecanê.

**Wecîze**: Kurt, peyvê kurt û mane dirêj.

**Wehdet**: 1. Yekbûn, tekbûn. 2. Yekbûna Xuda.

**Wehm**: Zen, guman, şiwar, şubhe, pûçezen, psîkolojî.

**Wera**: Xwe dûrkirina ji tiştên bi şubhe da ku xwe ji gunehan û heramîyan biparêze. Teqwadarî, Xudahezî, dînperwerî, dîndarî.

**Wexîm**: Gellek berbat, zehf xirab.

### -X-

**Xelwet**: 1. Bi tenê mana li cihekî girtî. 2. Îbadet, rîyazîyat, xwe kişandina înzîwayê ji bo zikr û mûraqebê.

**Xeşîyet**: 1. Tirs û xewf. 2. Hurmeta li hemberî heybeta manewî.

**Xetayê xwe**: Şaşîyê xwe, çewtîyê xwe ne rastîyê xwe.
**Xewas**: Mirovên taybet, mirovên dîyar.
**Xwezî**: Peyva ji bo dilxwazîya çêbûna tiştekî ye.

-Y-

**Yeqîn**: Pêzanîna qet'î, sağlem, rast û ji gumanê rizgarbûyî; qenaeta mûtleq û îtm'înana temam.

-Z-

**Zahidîtî**: Biha bi dinyayê nedan, reğbet têde nebûn, qenaetkarî, terk-kirina arzûyên nefsanî, ji tirsa Xuda xwe dûrkirina ji heramî û gunehan û xwe bi îbadetê ve berdan e.
**Zahir**: 1. Tişta ku tê dîtin, xuya, elenî, eşkere. 2. Dîmena derveyî. 3. Tabîî, bêguman.
**Zahirî**: Xuyahî, dîtberî, elenî, li ber çavan.
**Zatê 'alî**: Şexsê bilind, kesê qedrbilind.
**Zêdetir**: Pirrtir, zehftir, gellektir.
**Zehî**: Çi xweşik e!
**Zekawet**: Zeka, jîrîtî, şûmîtî, têgihiştin, fehm.
**Zelîl**: Reben, perîşan, belengaz, miskîn, nehêja.
**Zengînî**: Dewlemendî, têrmalî, serwetmendî.
**Zerafet**: Delalî, nazikî, kubarî, dilovanî, destevîlî.
**Zerîf**: Kubar, nazik, dilovan, destevîl.
**Zewat**: Geljimareya zat e. Bi maneya kesan, şexsan.
**Zewcet**: Jina mehrkirî, jina bi nîkah.
**Zewqa selîm**: Zewqa ku baş û nebaşî ji hev derdixe.
**Zid**: Hevdij.
**Zihûrat**: Geljimareya **zihûretê** ye, ew tişta rûdaye, xuya bûye, hatiye dîtin. 1. Yên zahir, yên hatine holê.

2. Ew halên ne di hesabê de, ewên ku ji nişka ve hatine holê.

**Zikr**: Bîranîn, navê Xuda gotin.

**Zillet**: 1. Rebenbûn, nehêjabûn. 2. Nizmî, miskîntî, rebenî, perîşanî.

**Zînet**: Sipehîtî, bedew-bûn, xweşik-bûn, bixeml-bûn, birewş-bûn, keşxe-bûn.

**Zinhar**: Eman ha,

**Zirwe**: Lûtke, jora jorîn, banîya banî.

**Zuhd**: Qîmet nedana bi menfîetê, qenaetkar.

**Zulcelal**: Xwediyê mezinatîyê.

**Zulmet**: 1. Tarîtî. 2. Mehrûmîyeta ji nûra manewîyatê.

**Zurrîyet**: Kinês, nesl, nifş.

# Naverok

Pêşgotin........................................................................5
Tesewwuf; Bı Qur'an Û Sunnetê Gıhıştına Kemalê Ye... 17
Naxwe Tesewwuf Çı Ye? ........................................................24
Naxwe Tesewwuf Ne Çı Ye? ..................................................26
Mezıntırîn Keramet; Îstîqamet ................................................34
Tesewwuf; Bı Zıkr Xwe Parastına Jı Ğefletê Ye.................37
Tesewwuf; Berterefkırına Nefsanîyetê, Înkîşafa
Rûhanîyetê Ye.. ...................................................................45
Dı Tesewwufê De Her Tışt, Dı Pıştî Îdrak-Kırına
"Hîç"Bûna Xwe De Destpê Dıke .........................................48
Tesewwuf; Pevrebûna Bı Salıhan Re Ye .............................58
Pevrebûna Qelbî: Rabîta... ....................................................60
Yê Lı Yemenê Lı Dev Mın E... ..............................................68
Tesewwuf; Ne Sûret e, Rêya Sîretê Ye!.. ..............................70
Rêya Qelbê Selîm.. ...............................................................73
Rêya Qelbê Selîm... ..............................................................75

Sê Wezîfeyên Pêğemberan.......................................................79
Îlmê Bêfeyde..........................................................................83
Bexçê Hınaran .......................................................................86
Mûhasebeya Wıjdanî Ya Sultan Alparslan... ......................88
Texellî, Tehellî, Tecellî ..........................................................91
Ellah Bes e!.. .........................................................................92
Mûrşıdên Kamıl.....................................................................96
Hessasîyeta Rîayeta Sunnetê ................................................99
Dıqqet Bıke Ka Tu, Dînê Xwe Jı Kê Hîn Dıbî!................108
Dı Mehebbetê De Çarçeveya Meşrûîyetê.......................111
Dı Mehebbetê De Çarçeveya Meşrûîyetê.......................113
Îfrat Û Teessub ...................................................................118
Tewessul...............................................................................121
Zîyareta Qebran...................................................................125
Heta Ellah Teala Nede Zanîn... .........................................135
Bende Bê Xeta Nabe............................................................136
Hey Însan, Xwe Qure Neke!................................................137
Tesewwuf; Gırtına Dıl Dı Hevkêşîya Tırs Û Hêvîyê De Ye.. 142
Jı Bağê Hıkmetê Ğunçe .....................................................153
Jı Bağê Hıkmetê Ğunçe .....................................................155
Ferheng ...............................................................................178